



**K.T.**

**Zanîngeha Mardin Artukluyê**

**Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê**

**Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî**

**Lîsansa Bilind a Bitez**

**MERYEM XAN Ê TEMAYA HIZINÊ DI  
KILAMÊN WÊ DE**

**Melahat ULUÇ**

**17711013**

**Şewirmend**

**Doç. Dr. Mustafa Aslan**

**Mardin 2021**

**K.T.**

**Zanîngeha Mardin Artukluyê  
Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê  
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî**

**Lîsansa Bilind a Bitez**

**MERYEM XAN Û TEMAYA HIZINÊ DI  
KILAMÊN WÊ DE**

**Melahat ULUÇ**

**17711013**

**Şêwirmend**

**Doç. Dr. Mustafa Aslan**

**Mardin 2021**

# TAAHHÜTNAME

## TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “**MERYEM XAN Ê TEMAYA HIZINÊ DI KILAMÊN WÊ DE**” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

25/12/2021

Melahat ULUÇ

## PÊŞGOTIN

Weke ku tê zanîn kevneşopa dengbêjiyê di nava milletê kurd de çandeke pir qedîm û girîng e. Her çiqas ev kevneşopa li gorî salên borî popularîteya xwe winda kiribe jî îro di warê akademîk de meraqdarên vê kevneşopayê bala xwe dane ser û dest bi lêkolînan kirine. Lêbelê ev xebatên ku heta niha hatine kirin helbet ne bes in. Lewre hejmarek zêde dengbêj hene ku hêj di nav rûpelên dîrokê de veşartîne û hêjayî xebatên bi vî rengî ne.

Me jî di vê xebatê de biryar da ku em li ser dengbêjeke jin bixebitin. Dengbêj Meryem Xan ku dengbêjeke bi nav û deng e derbarê wê de heta îro xebateke akademîk û serbixwe nehatiye kirin. Ji bilî xebatên akademîk xebatek bi rêkûpêk ku derbarê analîza kilamên Meryem Xanê ango derbarê hunera wê de hatibe kirin me peyda nekir. Bi vê xebatê dê Meryem Xan bi gelek hêlên xwe yê hunerî û taybet ve bê nasîn. Heta ku ji dest me hat bi lêkolîneke berfireh ev xebat hatiye amadekirin.

Di xebatên ku yekem car tên kirin mirov rastî gelek kêşeyan tên. Bi taybetî di warê çavkaniyan de pirsgirêkên mezin derdikevin pêşiya mirov. Xebatên ku heta niha derbarê Meryem Xanê de hatine kirin û ew zanyariyên ku di van çavkaniyan de cî digirin piraniya wan dubareya hev in û binyada gelek zanyariyên derbarê wê de tune ne. Bi vê xebatê gelek xalên bi vî rengî hatine zelalkirin.

Di warê deşîfrasyona kilamên Meryem Xanê de me hin zehmetî kişand. Qeyda dengê hin kilaman me peyda nekir. Hin risteyên kilaman jî ji ber pirsgirêkên teknîkî ku tevî bi dehan caran guhdarîkirina wan hat kirin jî baş nehatin famkirin. Bo vê sedemê deşîfrasyona van risteyan an nehat kirin an jî ji hin deşîfrasyonên ku berê hatibûn kirin sûd hat wergirtin.

Ji bo vê xebatê pêşî li ser çanda devki û çanda nivîskî û dengbêjiyê lêkolînek berfireh hat kirin ku baş bê zanîn ku kilamên dengbêjiyê di mewekeye çawa de pêk hatiye. Wekî din derbarê jiyana Meryem Xanê û berhemên wê de çi çavkanî hebin hatine xwendin û berawirdkirin da ku em xwe bigihînin zanyariyên zelal. Hêvî ew e ku ev xebat ji bo kesên xebatên bi vî rengî bikin bibe alîkar.

Di amadekirina vê tezê de spasdarê gelek kesan im ku alîkarî dan ji bo vê xebatê. Di serî de spasdarê şewirmendê xwe Mustafa Aslan im ku bi rênîşandariya wî ev xebat hatiye amadekirin. Spasdarê Kenan Subaşı me ku fikra mijara vê xebatê pêşniyazî min kir û di her merhaleya vê xebatê de alîkariya xwe ji min kêr nekirîye. Spasî ji bo Abdulsalam Akıncı ku di deşîfrasyona kilaman û peydakirina çîrokên kilaman de alîkariya min kir. Wekî din spasdarê Berekat Ozmen, Mehmet Bayrak, Baran Mendeş, Kakşar Oremar û Salihê Qubînî me ku alîkariya min kirin.

## KURTE

Dengbêj ku veguhêzerên hafîzeyaya civakê ne hest û hîsên civakê, qewimîn, şahî û xembariyên civakê bi strankî ji nîfşekê gihandine nîfşeke din ku bi vê sedemê nîfşên nû ji gencineya çanda xwe haydar bûne. Ji ber vê sedemê dengbêj di nav civakê de her tim xwedî qedr û qîmet bûn ku gelek caran pêşengiya civakê kirine.

Meryem Xan jî yek ji wan dengbêjan e ku bi berhemên xwe pêşengiya civaka xwe kiriye. Bo vê sedemê di vê xebatê de bi taybetî derbarê berhemên Meryem Xanê de hatiye rawestîn da ku baş bê zanîn ku Meryem Xan di kilamên xwe de li ser kîjan mijar û kîjan temayê sekiniye. Bi vê xebatê Meryem Xan bi gelek hêlên xwe ve tê nasandin.

Di vê xebatê de dê kilamên Meryem Xanê li dor temaya hizinê bên analîzkirin ku ev xebat ji destpêkek, sê beş û encamekê pêk tê. Di destpêkê de behsa mijar, armanc û girîngî, pîrsgirêk, rêbaz û sînorê xebatê tê kirin.

Pêşî bi giştî li ser taybetmendiyên çanda devkî û çanda nivîskî, hafîzeyaya kolektîf û têkildarî vê mijarê li ser fonksiyona dengbêjiyê hatiye rawestîn. Çanda dengbêjiyê bi gelek hêlên xwe yê cur bi cur ve hatiye lêkolan, bi taybetî li ser statûya dengbêjan, fonksiyon û taybetiyên kilamên dengbêjiyê hatiye rawestîn.

Beşa duyem ya xebatê li ser jînenîgariya Meryem Xanê ye. Dengbêj Meryem Xan, jiyanekê çawa derbas kiriye û di seranserê jiyana xwe de rastî çî qewimînan hatiye di vê beşê de cî digirin. Di serî de cihê ji dayikbûna wê paşê malbata wê, zewacên wê, çûna wê ya Bexdayê, hunermendiya wê û mirina wê bi hûrgulî hatine vegotin.

Di beşa sêyem de jî berhemên Meryem Xanê li dor temaya hizinê hatine dahûrîn. Ji çil û sê kilamên wê yê li ber destan bîst û pênc kilam ku hêmanên hizinê di hundirîn hatine hilbijartin û li dor temaya hizinê ev kilam hatine analîzkirin. Di destpêka beşê de pêşî pênaseya hizinê hatiye kirin û hest û hîsên ku dibin sedema xembariya mirovan hatine ravekirin. Ji bilî kilamên hizinê kilamên din yê Meryem Xanê ku ew jî 18 kilam in weke pêvek di dawiya xebatê de cî digirin.

## **Bêjeyên Sereke**

Çanda Devkî, Hafizeya Kolektîf, Dengbêjî, Meryem Xan, Serpêhatî, Hizin.

## ÖZET

Toplumsal hafızanın aktarıcıları olan dengbêjler, toplumun duygu ve düşüncelerini, yaşanmışlıklarını, sevinç ve üzüntülerini muzikal olarak bir kuşaktan diğer kuşağa aktarmışlar ve bu sebeple yeni kuşak kendi kültür hazinelerinden haberdar olmuşlar. Bunun için dengbêjler toplum içinde her zaman değer sahibi olmuşlar ve çoğu zaman topluma öncülük etmişler.

Meryem Xan da eserleriyle kendi toplumuna öncülük eden dengbêjlerden biridir. Bunun için bu çalışmada özellikle Meryem Xan'ın eserleri üzerinde durulmuştur. Bu vesileyle Meryem Xan eserlerinde hangî konu ve tema üzerinde durulmuş, iyi bir şekilde anlaşılacaktır. Bu çalışmayla Meryem Xan bir çok yönüyle tanıtılmış olacak.

Bu çalışmada Meryem Xan'ın şarkıları hüznün teması çerçevesinde analiz edilecek. Çalışma giriş, üç bölüm ve sonuç kısmından oluşmaktadır. Girişte çalışmanın konusu, amacı, önemi, sorunları, metod ve sınırları açıklanmıştır.

Öncelikle genel olarak sözlü ve yazılı kültür, kolektif hafıza ve buna bağlı olarak dengbêjlik fonksiyonu üzerinde durulmuştur. Dengbêjlik kültürü, birçok yönüyle araştırılmış, özellikle dengbêjlerin statüsü ve dengbêj kılamların fonksiyon ve özellikleri ele alınmıştır.

Çalışmanın ikinci bölümü Dengbêj Meryem Xan'ın hayat hikâyesi üzerinedir. Meryem Xan nasıl bir hayat yaşamış, hayatı boyunca ne gibi olaylarla karşılaştığı, ele alınmıştır. Başta sanatçının doğum yeri, ailesi, evlilikleri, Bağdat'a gidişi, sanat hayatı ve ölümü ayrıntılı bir şekilde anlatılmıştır.

Üçüncü bölümde, Meryem Xan'ın eserleri hüznün teması çerçevesinde analiz edilmiştir. Mevcut 43 eserinden hüznün temalı 25 eser seçilmiş ve analiz edilmiştir. Bölümün başında Meryem Xan'ın eserlerinden geniş bir şekilde bahsedilmiştir. Daha sonra hüznün tanımı yapılarak insanların hüznünlenmesine sebep olan duygular açıklanmıştır. Meryem Xan'ın diğer şarkıları çalışmanın ekinde verilmiştir.

## **Anahtar Kelimeler**

Sözlü kültür, Kollektif Hafıza, Dengbêjlik, Meryem Xan, Hayat Hikâyesi,  
Hüzün

## ABSTRACT

Dengbêjs, transmitters of social memory, have transmitted musically social feelings, thoughts, experiences, joys and sadnesses from one generation to the next and because of this new generation got informed about their own cultural treasures. Therefore dengbêjs (folk poets) were always social leaders and valuable in society.

Meryem Xan is also one of the dengbêjs leading society with her own works. For this especially Meryem Xan's works were emphasized on this practice. The topic and theme of Meryem Xan's works will be understood detailly. Meryem Xan's will be introduced in various ways thanks to this work.

Meryem Xan's works will be analyzed in the framework of sadness on this work. The work consists of introduction, three parts and conclusion. The topic, aim, importance, matters, method and limits of adjustment will be explained in the part of introduction.

Firstly, verbal and written culture in general, collective memory and by the extension of this, the function of being dengbêj were emphasized. The culture of dengbêjing was searched variously. The status of dengbêjs, the functions and properties of dengbêjs were discussed.

The second part of the work is based on Meryem Xan's autobiography. The life and events she encountered were handled. The place of birth, family, marriages, departing to Baghdad, the art life and death of the artist were narrated detailly.

On the third part Meryem Xan's works were analyzed on the framework of sadness. 25 works of 43 available were chosen and analyzed. Meryem Xan's works were mentioned widely at the beginning of the part. Then the definition of sadness was made and the feelings causing people sad were explained. The other songs of the artist were given in the attachment of the work.

### **Key Words**

Verbal Culture, Collective Memory, Dengbêjing, Meryem Xan, Autobiography, Sadness.

## NAVEROK

PÊŞGOTIN .....	I
KURTE .....	III
ÖZET.....	V
NAVEROK .....	IX
KURTEBÊJE .....	XII
DESTPÊK.....	1
ARMANC .....	1
RÊBAZ.....	3
MEBEST Û GIRÎNGÎ.....	4
SÎNOR Û ASTENGÎ.....	5

### BEŞA YEKEM

#### ÇANDA DEVKÎ Û DENGBÊJÎ

1.1. ÇANDA DEVKÎ Û ÇANDA NIVÎSKÎ .....	6
1.2. ZARGOTINA KURDÎ.....	10
1.3. HAFIZEYA KOLEKTÎF .....	12
1.4. DENGBÊJÎ.....	14
1.4.1. Taybetiyên Kilamên Dengbêjiyê.....	15
1.4.2. Statûya Dengbêjan .....	17
1.4.3. Dibistanên Dengbêjiyê .....	18

### BEŞA DUYEM

#### JÎNENÎGARIYA MERYEM XANÊ

2.1. CIHÊ JIDAYÎKBÛNA MERYEM XANÊ.....	22
2.2. MALBATA WÊ.....	23
2.3. ZEWACA WÊ .....	24
2.4. SERBORÎYA WÊ YA LI BEXDAYÊ .....	26

2.4.1 Radyoya Bexdayê.....	28
2.5. HUNERMENDÎYA MERYEM XANÊ .....	28
2.6. BERHEMÊN MERYEM XANÊ .....	30
2.7. KESAYETÎYA MERYEM XANÊ.....	31
2.8. MIRINA MERYEM XANÊ .....	31

### **BEŞA SÊYEM**

### **BERHEMÊN MERYEM XANÊ Û TEMAYA HIZINÊ DI KILAMÊN WÊ DE**

3.1. PÊNASEYA HIZINÊ.....	34
3.1.1. Mirin.....	35
3.1.2. Tenêti.....	38
3.1.3. Xerîbî .....	40
3.1.4. Bêrîkirin/Hesret.....	41
3.1.5. Koç .....	42
3.1.6. Evîn û Veqetîn.....	43
3.2. NIRXANDIN Û ANALÎZA KILAMÊN MERYEM XANÊ .....	45
3.2.1. Kilamên Şînê.....	46
3.2.1.1. Kilama Bavê Wemîn.....	46
3.2.1.2. Kilama Bavê Koroxlî .....	49
3.2.1.3. Kilama Mihemed Selîm/Hêlî Delal.....	52
3.2.1.4. Kilama Qesra Baxemsê.....	55
3.2.1.5. Kilama Mala Faro .....	58
3.2.1.6. Kilama Lo Siwaro .....	60
3.2.1.7. Kilama Cembelî .....	62
3.2.2. Kilamên Evîniyê.....	64
3.2.2.1. Kilama Çemê Bişêrîkê .....	64

3.2.2.2. Kilama Ay Delal .....	68
3.2.2.3. Kilama Mihemedo Ronî.....	70
3.2.2.4. Kilama Helîmê .....	73
3.2.2.5. Kilama Wele Domam.....	76
3.2.2.6. Kilama Qumrîkê.....	80
3.2.2.7. Kilama Yar Gewrê .....	82
3.2.2.8. Kilama Yadê.....	86
3.2.2.9. Kilama Derdo .....	87
3.2.2.10. Kilama Bejna Zirav .....	90
3.2.2.11. Kilama Zembîlfiroş .....	92
3.2.2.12. Kilama Weyla Li Min Xerîbê .....	96
3.2.2.13. Kilama Sêva Hecî.....	98
3.2.2.14. Kilama Bêmal.....	100
3.2.2.15. Kilama Eman Sêva Minê .....	102
3.2.2.16. Kilama Tirsim Bimrim Dilo Heyran .....	105
3.2.2.17. Kilama Ereb Şênî .....	106
3.2.2.18. Kilama Te Dibînim Te Nabînim .....	107
ENCAM .....	110
ÇAVKANÎ .....	113
PÊVEK: KILAMÊN MERYEM XANÊ YÊN LI DERVEYÎ TEMAYA HIZINÊ .....	119

## KURTEBÊJE

<i>bnr.</i>	binêre
<i>b.n.</i>	berhema navborî
<i>b.z.</i>	berî zayînê
<i>c.</i>	cild
<i>Edt.</i>	Edîtor
<i>Hej.</i>	hejmar
<i>h.b.</i>	heman berhem
<i>K.T.</i>	Komara Tirkiyeyê
<i>r.</i>	rûpel
<i>T.C.</i>	Türkiye Cumhuriyeti
<i>t.ç.</i>	teza çapnebûyî
<i>vghz.</i>	veguhêzer
<i>wer.</i>	wergêr
<i>weş.</i>	weşanxane

## **DESTPÊK**

Her çiqas bi destpêka çanda nivîskî çanda devkî bandora xwe ya berê winda kiribe jî hêj di vî warî de gelek xebat tên kirin ku ev jî nîşaneyê girîngiya çanda devkî ye. Lewre çawa ku berê tenê gotin hebû îro jî hemû nivîs li ser gotinan tên avakirin. Çanda devkî ji bo berhemên çanda nivîskî çavkaniyek girîng e. Çavkaniya mijara vê xebatê jî ji hêmanên çanda devkî dengbêjî ye. Çanda devkî ya kurdî di bingeha xwe de xwedî dewlemendiyeke mezin e.

Di çanda devkî ya kurdî de gelek kereste hene ku bi saya van keresteyan mirov xwe digihîne gelek zanyariyên paşerojê. Dengbêjî jî yek ji van keresteyan e ku bi saya kilamên dengbêjiyê mirov ji gelek hêlan ve dikare xwe bigihîne çîroka milletê kurd. Dengbêjan wezîfeyek girîng dane ser milê xwe. Bi kilamên xwe bûne berdevkên civaka xwe û şahî û xembariya civaka xwe gihandine heta roja îro. Dengbêj Meryem Xan jî bi kilamên xwe xizmetek mezin daye bo civaka xwe. Bi vê sedemê mijara vê xebatê kilamên Meryem Xanê ne.

Baweriya me ev e ku xebatên bi vî rengî yê li ser keresteyên çanda devkî bi taybetî li ser dengbêjiyê bêguman ji bo vê qadê dê gelek bifêde bin. Her ku ev xebat bîr kirin dê gelek materyal jî bîr bidestxistin.

## **ARMANC**

Kilamên ku Meryem Xanê bideng xistine perçeyekî kevneşopa çanda devkî ne. Me jî biryar da ku em li ser kilamên Meryem Xanê bixebitin. Yek ji mebesta vê xebatê ew e ku ev kilamên ku hatine bijartin ku bi naveroka xwe ve kilamên “hizin”ê ne bi awayekî berfireh bîr analîzkirin û di nav xebatan de cî bigirin. Li gorî

lêkolînên ku me kir heta niha xebateke akademîk û wekî din ku bi berfirehî û sistematîk bi giştî li ser serpêhatî, berhevkirin, senifandin û analîza kilamên Meryem Xanê hatibe kirin me peyda nekir. Bêguman van salên dawî xebatên derbarê dengbêjan de zêde bûne. Lêbelê ev xebat li gorî ku bi sedan dengbêj çî jin çî mêr hene pir kêman in. Li gorî çavdêriya me piraniya van xebatên ku derbarê dengbêjan de hatine kirin dengbêjên mêr in.

Her çiqas hejmara dengbêjên jin ji ya mêran kêmtir bin an jî mêr di vî warî de li pêş bin jî têra xwe dengbêjên jin hene ku her yek ji wan hêjayî xebatê ne. Ji ber ku di vî warî de valahiyek heye me jî niyet kir ku ji dengbêjên jin derbarê Meryem Xanê de dest bi xebateke wiha bikin. Yekem car dê xebateke serbixwe, akademîk û berfireh derbarê serpêhatiya Meryem Xanê û analîza kilamên wê de bê kirin. Meryem Xan bi deng û awaza xwe navê xwe di nava dengbêjên mezin de nivîsiye, lê mixabin ji aliyê nîfşên nû ve baş nayê nasîn. Yek ji armancên vê xebatê ew e ku berhemên Meryem Xanê bînin arşivkirin û dengbêjeke wiha berhemdar di nav rûpelên dîrokê de neyê jibîrkirin.

Meryem Xan, yekemîn jin e ku di dîroka mûzîka kurmancî de dengê xwe li ser sêlikan tomar kiriye. Kilamên ku çî nivîsîne çî strane bi naveroka xwe ve kilamên mêrxasî, evînî, bêrîkirin, hesreta welêt, koçkirin û kilamên li ser erdnîgariyê ne. Lê armanca vê xebatê ya sereke ew e ku di kilamên Meryem Xanê de li ser têgeha “hizin”ê bê rawestîn. Bi giştî dema em li kilamên dengbêjiyê dinêrin tê dîtî ku vebêjerên kilamên xembariyê bi gelemperî jin in. Lewre jin li gorî mêran zêdetir hestiyar in. Di kilamên jinan de êş û kesera wan û evîna wan zêdetir derdikeve pêş. Di kilamên Meryem Xanê yê bihizin de ku piraniya wan li ser evîna nîvcomayî ne me tespît kir ku vebêjer zêdetir jin in. Ji bo vê yekê li gorî baweriya me hestên jinekê herwiha jinek dikare li gorî mêr van hestan baştir îfade bike.

Lewre jin di warê xembariyê de li gorî mêr hest û hîsên xwe zêdetir derdixê der. Jin li dij bûyerên xembar demildest reaksiyonê nîşan didin. Ev reaksiyon jî weke hêsir, qêrîn, porkişandin û wekî din xwe dide der. Lêbelê mêr berovajî jinê li dij bûyerên trajîk bêdengiyê tercih dikin û zêdetir êşa xwe di nava dilê xwe de dijîn. Ji ber vê sedemê bestekarê kilamên hizinê bi gelemperî jin in. Bo vê yekê divê bê

destnîşankirin ku armanca sereke ya vê xebatê li dor tamaya hizinê analîza kilamên Meryem Xanê ne.

## **RÊBAZ**

Li gorî dengbêjên weke Evdalê Zeynikê, Şakiro, Reso ku ev dengbêj bi gelemperî hizina kesên din tînin ziman, Meryem Xan herweha hizina xwe jî tîne ziman. Di her kilameke wê de em êşa ku wê bi xwe kişandiye yan jî bûye şahid dibînin. Ji bo vê yekê kilamên ku xembariyê dihundirînin hatine hilbijartin û di çarçoveya temaya hizinê de hatine analîzkirin. Meryem Xan di jiyana xwe de tûşî gelek tengasî û bûyerên dilsoj bûye. Di vê xebatê de, her wiha dê bê dîtîna ku serpêhatiya Meryem Xanê çiqas tesîr li ser hunermendiya wê û berhemên wê kiriye. Ji ber ku Meryem Xan di zarokatiya xwe de ji welatê xwe koç kiriye û derbarê wê de kêr xebat hatine kirin gelek agahiyên nakokî li ser wê hene. Ji bo vê yekê pêşî çî xebat li ser jiyana wê hatine kirin ev çavkanî hatin berhevkerin, lêkolan û berawirdkirin.

Ji bo vê xebatê bi taybetî ji xebatên kesên ku bi salan e derbarê jiyana Meryem Xanê de dixebitin û bi taybetî ji xebatên kesên ku bi malbata wê re têkilî danîne, sûd hatiye wergirtin. Ji xwe ji kurdên Tirkiyeyê ji bilî çend nivîskarên weke Zeyneb Yaş ku di pirtûka xwe ya “Şakarên Muzîka Kurdî” de beşek ji bo serpêhatiya Meryem Xanê veqetandiye û H. Baran Mendêş ku pirtûka “Meryem Xan Hayatî, Sanatî ve Şarkîlari” amade kiriye û çend nivîsên di înternetê de tu xebatên girîng nehatine peyda kirin. Wekî din li Ewropayê Kakşar Oremar ku bi salan e derbarê Meryem Xanê de dixebite ne weke pirtûk lê weke gotar hin xebatên hêja amade kirine.

Ji ber vê sedemê ev xebat ji van xebatên heyî cudatir tevî serpêhatiya Meryem Xanê li ser analîza kilamên wê hatiye rawestîn. Xebat bi 25 kilamên ku hatine hilbijartin sînordar e. Bi vê sedemê pêşî hemû kilamên heyî hatin berhevkerin û paşê hatin deşîfrekirin. Piştî deşîfrasyonê kilamên ku temaya wan “hizin” e li gor hêmanên hizinê yek bi yek hatin tespîtkirin. Hin kilamên weke “Narûnê, Yadê û Çûme Derya Dadayê” ku arasteyî Meryem Xanê tînin kirin, lêbelê dengê van kilaman nehatine peyda kirin ji pirtûka “Miryem Xan” ya Celal Mela Hesên Xoşnaw û Cengî Celal Mela Hesên hatine latînîzekirin.

Di deşîfrasyona kilaman de bi dehan caran kilam hatine guhdarîkirin ku gotinên kilaman rast bèn deşîfrekirin. Lêbelê mixabin her çiqas ku bi dehan caran li kilaman hatibin guhdarîkirin jî ji ber pirsgirêkên teknîkî hin gotinên kilaman baş nehatin famkirin. Ji bo vê yekê ew cihên ku baş nehatin famkirin bi pirsnîşanê hatin nîşandan û cihên ku qet nehatin famkirin jî vala hatin hiştin an ji pirtûka “Miryem Xan” ve sûd hat wergirtin. Weke rêbazeke din ku min da pêş xwe hin kilamên ku varyantên wan hene li dor temaya hizinê hatin berawirdkirin û cudatiya di navbera varyasyonan de hatin tespîtkirin. Kilamên ku temaya wan hizin e bi du sernavên weke “kilamên evînî û kilamên şînê” hatin dabeşkirin.

Ji ber ku her kilameke dengbêjiyê li dor çîrokekê dirûv girtiye, di vî warî de jî lêkolînek berfireh hatiye kirin. Analîza kilaman yên ku çîrokên wan hatin peydakirin li dor van çîrokan hatin dahûrîn. Kilamên ku çîrokên wan nehatin peyda kirin jî li gorî hûnandin û atmosfera bûyerên kilaman hatin analîzkirin.

## **MEBEST Û GIRÎNGÎ**

Mebest ji vê xebatê ew e ku derbarê kilamên (bihizin) Meryem Xanê de xebateke wiha berfireh ku her kilamek di çarçoveya temaya “hizin”ê de hatiye dahûrîn di nav xebatan de cî bigire. Bi vê xebatê dê bê dîtîna ku Meryem Xan bi derûnî û giyanekî çawa ev kilam strane. Herweha hest û hîsên wê û hizina ku kişandiye bi vê xebatê dê derkeve holê. Yekem car e ku kilamên Meryem Xanê di çarçoveya temaya “hizin”ê de tên dahûrîn.

Bi vê xebatê herweha em dixwazin ew zanyariyên derbarê Meryem Xanê de ku di encama xebata me de em rastî tu delîlan nehatin, bèn zelalkirin. Lewre wisa xuya ye ku jiyana Meryem Xanê û hin dengbêjên jin weke dengbêj Elmas Xan li nav hev ketiye. Ev mijar bi çavkaniyan hatiye zelalkirin. Her wiha xwîner kêr zêde derbarê Meryem Xanê de dê bibin xwedî agahî.

Hem sînordarbûna xebatên derbarê serpehatî û berhemên Meryem Xanê de û hem kêmbûna metnên di vî warî de bèn berbiçavkirin, dê girîngiya vê xebatê derkeve holê. Gelek jinên dengbêj hene ku hêj navên wan nehatine bihîstin, lê berhemên gelek hêja afirandine li hêviya xebatên wisa ne.

## SÎNOR Û ASTENGÎ

Ji ber ku derfeta çûyina me ya Iraqê û Herêma Kurdistanê ku Meryem Xan heta dawiya temenê xwe li van deran jiyaye tunebû dibe ku me xwe negihandibe hin çavkaniyan. Lêbelê ji başûr (Herêma Kurdistana Iraqê) me derbarê serpêhatî û berhemên Meryem Xanê de pirtûkek bi soranî ya bi nav “Miryem Xan” peyda kir û jê sûd wergirt. Weke ku li jor jî hat îfadekirin xebatên derbarê Meryem Xanê de kêm in. Ji çend xebatên weke “Şakarên Muzîka Kurdî” ku Zeyneb Yaş beşek ji bo Meryem Xanê veqetandiye û pirtûka “Meryem Xan, Hayatî, Sanatî ve Şarkîlari” ya H. Baran Mendeş, gotarên Kakşar Oremar û hin gotarên din me tu xebatên berfireh peyda nekirin.

Di hin xebatên heyî de derbarê Meryem Xanê de hin zanyarî hene ku me tu delîl peyda nekir. Zanyariyên mîna; Meryem Xan bi kurekî malbata Bedirxaniyan re zewiciye û kilamên ku berhev kirine di kovara “Hawar”ê de hatine weşandin cî girtine. Wekî din di van xebatan de tê destnîşankirin ku Meryem Xan ji 200î zêdetir kilam strane. Lêbelê di lêkolîna ku me kir em rastî tu çavkaniyên bi vî rengî nehatin. Li ser jiyana Meryem Xanê gelek agahiyên tevlîhev hene. Heta ji dest me hat bi şanîkirina çavkaniyan ev rewş hat zelalkirin.

Xebata me bi taybetî ji ber ku derbarê analîza kilamên Meryem Xanê de ne di warê deşîfrasyona kilaman de û peydakirina qeyda dengê sê kilamên ku arasteyî Meryem Xanê tên kirin weke “Yadê, Narûnê, Çûme Derya Dadayê” de me zehmetî kişand. Gotinên hin kilamên Meryem Xanê ji ber pisrgirêkên teknîkî bi zehmetî hatine deşîfrekirin û hin rêzik ji ber ku nehatine famkirin vala hatine hiştin.

Xebata me ji sê beşan pêk tê. Beşa yekem derbarê çanda devkî û dengbêjîyê de ye. Beşa duyem derbarê serpêhatiya Meryem Xanê de ye û beşa sêyem li ser berhemên Meryem Xanê û li dor temaya “hizin”ê analîza wan.

## **BEŞA YEKEM**

### **ÇANDA DEVKÎ Û DENGBÊJÎ**

Beriya ku em kilamên Meryem Xanê analîz bikin bila pêşî bê zanîn ku dengbêjî saziyeke gelek qedîm e û di civaka kurdan de xwedî statûyeke gelek girîng e. Dengbêj jî beriya ku nivîs di nav civaka kurdan de pêş bikeve ev çanda qedîm bi devkî veguhastine heta roja îro.

Herweha em ê di vê beşê de hîn bibin ku dengbêj di perwerdeya dengbêjiyê de di merhaleyeke çawa re derbas bûne. Di perwerdeya dengbêjiyê de tiştê herî girîng helbet hafize ye. Lewre bi hafizeyeke gelek xurt ev çand heta îro hatiye parastin. Bi giştî li ser hafizeya kolektîf û rola dengbêjan di vê beşê de hatiye rawestîn.

#### **1.1. ÇANDA DEVKÎ Û ÇANDA NIVÎSKÎ**

Tê dîtin ku her lêkolerekî têgeha çandê bi pênaseyên ji hev cuda rave kirine. Antropolog Kroeber û Kluckhohn di antolojiya xwe ya derbarê çandê de 164 têgeh û pênaseyên çandê berhev kirine û nîqaş kirine. Li gorî her du antropologan ev gotin ji “Cultura” tê. Bi latînî tê wateya ajotin, çandin û çinînê (Güvenç, 2018: 122). Ji vir jî xuya dibe ku derbarê çandê de gelek pênaseyên ji hev cuda hatine kirin.

Güvenç ji bo çandê dibêje ku çand tiştê ne irsî ye, hemû hînbûyinên mirovan e ku bi hişmendiyeke pêk tên. Çand çawa ku tê wateya şaristanî, perwerde û hunerên rind di heman demê de tê wateya hilberîn û gihandinê. Mirov afirînerê çandê ne û çand mirovan bi hev ve girêdide (Aydın & Emiroğlu, 2003: 521).

Her çiqas pênaseyên ji hev cuda hatibin kirin jî di bingeha xwe de ev pênase digihêjin hev. Çand ji bûyina mirovan heta mirina wan ew tiştên ku hîn bûne, hîn kirine, jiyane û hilberandine pêk tê. Ji xwarin-vexwarinê bigirin heta kinc, erf û edet, fikir û hest ev hemû çanda miletekî pêk tîne. Ev nirxên çandî bi navgîna kesan digihêje heta nişên nû. Ev ragihandin bi du awayan pêk tê. Bi çanda devkî û çanda nivîskî.

Dîroka çanda devkî ji ya çanda nivîskî pir kevintir e. Lewre berê gotin hebû. Civakan hemû têkilî û ragihandinên xwe bi rêya vegotina devkî pêk dianîn. Çanda nivîskî piştî ku li Mezopotamyayê ji aliyê sumeran di salên 3500 berî zayendê nivîs hat dîtin, dest pê kiriye. Her çiqas Homo Sapiens ev 50 000 sal in dijîn jî (Parilti, 2006: 16) pir dereng derbasî heyama nivîskî bûne.

Li seranserê cîhanê gelek civakan ji bo ragihandinê cureyên nivîsê pêş xistine. Di salên ji hev cuda de nivîsa Hind û Çînê, hiyeroglîfa Misrê, nivîsa Aztek û nivîsa Mînosê derketine holê. Her civakekê bi nivîsên ku îcad kirine ragihandin pêk anîne. Weke ku me di serî de jî got berî ku civak derbasî çanda nivîskî bibin hemû danûstandin bi rêbaza devkî dihatin kirin. Di çanda devkî de ji ber ku belge û tekst tunebûn guhdarîkirin-bihîstin û bibîranîn du hemanên girîng bûn. Lewre, ji bo agahdarkirina mirovan pêşî divê ew agahî bînin bihîstî û ji bo ew agahî neyên jibîrkirin jî divê her tim bînin dubarekirin.

Mirovên xwedî çanda devkî taybetmendiyeke wan ya girîng heye ku xwedî hişekî bihêz in. Dikarin gelek pêzanînan di hişê xwe de bigirin û heta demeke dirêj ji bîr nekin. Hişê wan kesan weke amûrên ku daneyan berhev dikin ewqas berfireh e. Helbet ji bo ku hişê xwe her tim zînde bigirin jî hin rê û rêbazên teknîkî hatine pêşxistin. Ji bo ku pêzanînan neyên jibîrkirin û ji nişên nû re bînin ragihandin divê hafizeya mirovan her tim agahiyan dubare bike. Heke ew tiştên ku hatine hînbûn neyên dubarekirin wê bînin jibîrkirin. Lewre di çanda devkî de gelek pêzanînan ji sedema jibîrkirinê wenda bûne û nehatine qeydkirin.

Walter J. Ong, çanda devkî weke çanda devkî ya sereta û çanda devkî ya duyemîn ji hev cuda dike. Diyar dike ku di çanda devkî ya sereta de hêj nivîs îcad nebûye ku me li jor behsa hin taybetmendiyan vê çandê kirin. Têgehên nivîs û

çapxaneyê hêj nayên zanîn, mirov tenê bi rêya axaftinê têkiliyên xwe datîne. Ong, ji ber fonksiyona wan ya devkî ya telefon, radyo, televîzyon û computerê ku nivîs-tekst bi rêya axaftinê tên ragihandin weke çanda devkî ya duyemîn rave dike. “Îro hema hema ji ber ku di hemû çandan de têgeha nivîsê û tecrûbeya nivîsê heye di rastiyê de çanda devkî ya sereta fonksiyona xwe wenda kiriye. Lêbelê, di gelek çandên ku hêj ji teknolojiya pêşketî sûd werdigirin em rastî fikrên çanda devkî ya duyemîn tên” (Ong, 2014: 23-24).

Li gorî fikr û ramana Ong, îro çanda devkî ya sereta fonksiyona xwe wenda kiriye lêbelê çanda devkî ya duyemîn hêj hebûna xwe diparêze. Di çanda devkî ya duyemîn de piştî îcadbûna nivîsê jî axaftinê tu carî girîngiya xwe wenda nekiriye. Lê nivîs tu carî nikare xwe ji vegotina devkî dûr bixe. Vegotina devkî, bêyî nivîsê jî heye ji ber ku her zimanê devkî ne nivîski ye; lêbelê nivîs bêyî vegotina devkî tu carî nikare pêk bê (Ong, 2014: 20). Weke ku me li jor diyar kir civakên çanda devkî ya sereta ku ji nivîsê ne haydar in bi saya hişekî xurt dikarin gelek tiştan hîn bibin. Lêbelê di çanda devkî de gotin piştî ku ji dev derdikevin wenda dibin diçin. Ne pêkane ku ev gotin yeko yeko bên bîra mirov. Di çanda devkî de tu tişt ne heman in û ne teqez in. Analîza pêzanînan ne mimkûn e (Sanders, 2017: 30).

Ji bo ku analîz bê kirin divê agahî bên tomarkirin û li ser belgeyan bên parastin. Lêbelê di çanda devkî de kesên temendirêj û şareza bi awayekî weke belgeyên dîrokî bûn. Ji ber ku qewimînên berê di hişê xwe de diparastin di civakê de her tim bi qedr û qîmet bûn. Girîngiya kesên şareza bi hejmara zanyariyên wan ve dihat pîvan. Dema hozanek 7, 20 an jî 300 çîrokan bizanibe girîngiya wî li gorî van zanyariyên wî tê pîvan. Ango çiqas xwedî agahî be cihê wî jî ewqas bilind dibe di civakê de (Assman, 2018: 107). Lêbelê piştî jiyana modern ku êdî ragihandin bi rêya nivîsê pêş ket, fonksiyona van kesên emirdirêj û şareza di civakê de nema. Êdî ciwan ketin şûna van kesan, lewre bi saya çanda nivîskî û pêşketina teknolojiyê ciwan dikarin xwe bigihînin her zanistê.

Di vê çarçoveyê de dema em çanda devkî û ya nivîskî berawird bikin di çanda devkî de agahî bi zor û zehmet û di pêvajoyeke dûvdirêj de tê bidestxistin. Ji bo zanistên ku hatine bidestxistin neyên jibîrkirin hin teknîk ku li jor behsa van teknîkan tê kirin hatine sepandin ku agahî bên parastin. Ji bo vê yekê di çanda devkî de hem

zanyarî pir hêja ye û hem jî ew kesên ku van zanyariyan di hişê xwe de diparêzin bi qedr û qîmet in. Sanders li ser fonksiyona hiş û hafîzeyê çanda devkî diyar dike ku di çanda devkî de hiş li gorî çanda nivîskî cudatir e. Zarokek an jî kesekî çanda devkî hin rastiyan ji çîrok û helbestan bi bihîstîna û dubarekirinê hîn dibe û ji bo ku gotin zû wenda nebin baş guhdarî dikin (Sanders, 2017: 23). Di çanda devkî de guhdarîkirin û dubarekirin hêmanên sereke ne. Lewre ev herdu hêman nebin dê gelek agahî wenda bibin, biçin.

Lêbelê di çanda nivîskî de dema mirov pirtûkekê yan çîrokekê bixwîne heke tiştek ji ber çavên mirov wenda bibe mirov dikare dîsa vegere cihê berê. Di çanda nivîskî de her tim sêdeke wiha heye. Di her du çandan de prosesa hînbûnê jî ji hev cuda ye. Di çanda devkî de dema yek tiştekî hîn dibe kesên din jî mudaxîl dibin. Hînbûn girêdayî vebêjeran e. Ango yek kes bixwaze tiştekî hîn bibe mecbûr e ku li vebêjer guhdarî bike. Lê di çanda nivîskî de kesek dikare bi tena serê xwe tiştan hîn bibe. Ji ber vê sedemê ragihandin di çanda devkî de li gorî çanda nivîskî xurtir e. Bi saya ragihandineke xurt têkiliya di navbera civakê de zêdetir e (Katar, 2011: 10). Ev navgîna herî xurt ya ragihandinê jî ziman e. Her çiqas di çanda devkî de hiş her tim zînde be û vebêjer gelek zanyarî ji wendabûnê xelas kiribin jî ev heta radeyekê ye.

Lewre piştî îcadbûna nivîsê gelek keresteyên çanda devkî derbasî nivîsê nebûne û wenda bûne. Li gorî hejmara dawîn ya Neteweyên Yekbûyî li seranserê cîhanê tevî ku îro 3 hezar zimanê axaftinê hene tenê wêjeya heftê û heşt zimanan heye. Ji van heftê û heşt zimanan tenê xwînerên pênc-şeş zimanên navneteweyî hene (Sanders, 2017: 14). Her çiqas prosesa hînbûnê di çanda devkî de bileztir be jî weke çanda nivîskî ne mayînde ye. Lewre bi saya nivîsê her gotin di hişê de weke dîmenekî tê ber çavan. Lê ji bo herdu çandan dikare bê gotin ku tevî ku nivîs û çapxane ketibe jiyana mirovan jî li aliyekî çanda devkî hebûna xwe dewam dike. Hêj têkiliya di navbera herdu çandan xwe dide der.

Em dikarin ji barê li ser hafîzeyê û rêjeya jiberkirinê fam bikin ku îro çanda nivîskî çiqas girêdayî çanda devkî ye (Ong, 2014: 58). Lewre gelek çandên nûjen hene ku weke ereb û yewnan bi sedsalan e tevî ku nivîsê dizanin jî hêj girêdayî şeweyên vegotin û hizrê ne (Ong, 2014: 40). Ji bo vê yekê nikare bê gotin ku çanda

devkî bi her awayî hebûna xwe wenda kiriye. Her çiqas îro çanda nivîskî serdest be jî têkiliya di navbera her du çandan de dewam dike.

Civaka kurd çawa ku îro derbasî nivîsê bûye jî li hêla din çanda devkî tesîra xwe li ser jiyana wan diparêze. Bi ve sedemê kurd di warê zargotinê de xwedî dewlemendiyeke mezin in. Bi vê wesîleyê zargotina kurdî her tim bala lêkolerên biyanî kişandiye.

## **1.2. ZARGOTINA KURDÎ**

Zargotin ji bo neteweyên ku zimanên wan çanda wan qedexe ye û tu derfet tune ye ku xwe îfade bikin rêyek e. Bo vê sedemê Propp zargotinê weke hunera milletên bindest ango ya gundî û karkeran rave dike û dibêje ne pêkan e ku em behsa zargotina arîstokrasiyê bikin (Propp, 1998: 12). Lewre neteweyên bindest ku derfeta xwe îfadekirinê ji wan re nemaye zargotin ji bo wan roleke mezin dilîze. Bi saya zargotinê danûstandineke pir xurt ya zanistî çêbûye. Neteweyan hemû nirxên xwe bi rêbaza devkî parastine û veguhastine nîşên nû. Ji van neteweyan yek jî kurd in ku dîroka xwe, zimanê xwe û wêjeya xwe bi rêya vebêja devkî gihandine heta roja îro. Ev gencîne bi saya kesên taybet weke dengbêj, çîrokbêj û destanbêjan ve hatiye parastin.

Ji bo vê yekê dewlemendî û rengîniya zargotina kurdan her tim bala lêkoler, kurdolog, mîsyoner û rojhilatnasên biyanî kişandiye. Ji ber hindê gelek lêkolerên ku li ser çanda milletên Mezopotamyayê lêkolîn kirine li hember dewlemendiya zargotina kurdî ecêpmayî mane û pesnê wê dane. N.F Høijer ku kurdî jî fêr bûye li ser zargotina kurdî dibêje; her çiya, gol, çem, gelî, bajar, gund an jî her kevirê mezin li welatê wan çîrokeke xwe heye<sup>1</sup> (Gültekin, 2013: 10-11). Tomas Bois jî dibêje, milletê kurd gelekî zengîn û dewlemend e di torê folklorî de, ew zengîni di hejmara mezin ya destan, çîrok, çîvanok û stranan de diyar e (Amêdî, 2013: 12).

Vilçevsky ku wî jî li ser wêjeya kurdî lêkolîn kirine dewlemendiya zargotina kurdî gelekî bi wî ecêp tê. Dibêje taybetmendiya edebiyata kurdî dewlemendiya zargotina kurdî ye. Weke sedem jî destnîşan dike ku di nav kurdan de xwendina bi zimanê dayikê hema hema tunebû (Nikitin, 2013: 432). Ji bo dewlemendiya

---

<sup>1</sup> Ev pêzanîn ji pêşgotina ku Rohat Alakom ji bo pirtûka Mehmet Gültekin nivîsiye hatiye wergirtin.

zargotina kurdî û dereng derbasbûna jiyana nivîsê gelek sedemên ji hev cuda derdikevin pêş. Weke Vilçevsky, Bazil Nikitin jî sedema vê yekê bi nexwendina bi zimanê zikmakî ve girêdide. Derbarê vê de dibêje kurd ji ber ku weke cîranên xwe erep, tirk û ermenî di dibistanan de bi zimanê xwe nexwendine û nenivîsîne zimanê xwe yê zikmakî jî pêş nexistine. Ji bo vê yekê xwe bi temamî dane zargotinê (Nikitin, 2013: 435).

Gelê kurd ji ber ku ji mecbûrî di bin serdestiya dewletên deshilatdar de dijiyan, ev rewş kir ku kurd dereng derbasî nivîsê bibin û wêjeya wan a devkî jî dewlemend bibe. Qedexekirin û astengiyên li ber zimanê kurdî ku bi salan dewam kir hişt ku kurd xwe bi devkî îfade bikin. Ji bo vê yekê civaka kurd li gorî milletên din dereng derbasî wêjeya nivîskî bûn. Tevî ku zimanê kurdî ji sedsala 7emîn weke zimanê nivîskî hatiye bikaranîn jî cara ewil di sedsala 10. û 11. ji aliyê kêma helbestkaran ve weke zimanê edebiyatê hatiye bikaranîn (Nezan, 2002: 52). Milletê kurd her çiqas ji ber fişaran nikarîbûn çanda xwe ya nivîskî biparastana jî wan nikarîbûn dev ji çanda devkî berdana.

Lewre, nivîskarê ermenî Xaçatur Abovyan dibêje her kurdek çi mêr çi jin ji dayika xwe helbestvan hatiye dinê (vghz. Gültekin, 2013: 11). Ji bo vê yekê her çiqas kurd îro derbasî çanda nivîskî jî bûne hêj xwe bi temamî ji çanda devkî dûr nexistine. Bi awayekî xwezayî ev têkilî xwe nîşan dide. Milletê kurd gelek dîtî û tecrûbeyên xwe yê edebî û hunerî bi rêbazên strankî û helbestkî ango bi rêya “verbal” parastine û pêş xistine (Bender, 1995: 98). Ji bo vê yekê gelek kilamên ku çîroka wan li ser axa kurdan qewimîne gihaştine heta roja îro.

Remezhan Alan ji bo milletên ku dereng derbasî nivîsê bûne yan jî rastî astengiyan hatine dibêje ku di nav van milletan de “gotinên takekesî” dereng pêk tên, dîtî û tecrûbeyên wan bi giştî “gelêrî” ne (Alan, 1997: 11). Ji bo vê yekê zargotin ji bo neteweyên weke kurdan ku ji ber sedemên siyasî derfeta xweîfadekirinê nedîtine roleke girîng dilîze. Di civakên bi vî rengî de hin kesên taybet û xwedî qîmet weke dengbêjan henin ku bûne hafîzeyên milletê xwe. Gelek qewimînên dîrokî, mîrxasî, evîni û çîrokên edebî di hişê xwe de parastine û veguhastine nîşan nû.

### 1.3. HAFIZEYA KOLEKTÎF

Paşeroja her civakekê û her mirovekî heye. Ji bo vê yekê di civakên çanda devkî de û civakên ku derfeta wan a nivîsê tune ye ji bo ku paşeroja xwe biparêze û pê re têkiliyê dayne mecbûr e ku ji hafizeya kolektîf sûdê werbigire. Mithat Sancar, civakê dişibîne mirovan û dibêje çawa ku em bixwazin mirovekî nas bikin em çîroka wî dipirsin û hîn dibin, civak jî wisa ne. Bêguman çîrokên civakan jî hene. Ya rastî em peyva çîrokê ji bo “paşeroj”ên şexsî bi kar tînin. Lêbelê ji bo çîrokên civakan em hin gotinên weke “paşeroj” û “dîrok” ê bi kar tînin (Sancar, 2016: 11). Ji bo miletek paşeroja xwe ji bîr neke û wenda neke weke ku li jor jî hat gotin mecbûr e ku ji “hişê kolektîf” îstîfade bike.

Hafizeya kolektîf di encama civakîbûnê de pêk tê. Asmann ji Maurice Halbwachs neqil dike ku heke kesek seranserê jiyana xwe bi tenê jiyabe “hafize” ya wî tune ye. “Bîr” bi civakîbûna mirovan ve çêdibe. Ev “bîr” her tim yê şexsekî ye, lêbelê di encama têkiliya civakî de pêk tê. Ango hafizeyeke aîdê civakê tune ye lê civak hişê şexsan diyar dike (Asmann, 2018: 44).

Çawa ku Sancar ji Halbwachs neqil dike ku “hiş” zindî ye û her tim bi ragihandinê ve hebûna xwe dewam dike. Heke ev danûstandin raweste dê jîbîrkin derkeve holê. Lewre mirov bi tiştên ku pê re di têkiliyê de ye ji bîr nake (vghz. Sancar, 2016: 42). Ji bo vê yekê hewceye ku miletek her tim bi paşeroja xwe ve di nav têkiliyê de be ku paşeroja xwe wenda neke. Hema hema di her civakekê de hin kesên taybet ku xwedî hafizeyeke xurt in vê wezîfeya girîng tînin cih. Ev kesên ku bi temenên xwe navsere ne her tim hilgiriya vê hafizeyê kirine. Ev kes li gorî civakan şaman, keşe, nivîskar, filozof, dengbêj, aşiq, balad, grîot û her wekî din in ku barkêşiya zanistê dikin.

Di civakên çanda devkî de kesên wiha şareza xwedî statûyeke girîng in. Connerton ji Halbwachs neqil dike ku, ev kes bîranînên xwe bi rêya endambûna bi koman û nemaze bi rêbaza têkiliyên bi mirovatî, olî an bi hin tebeqeyên civakê re datînin bi dest dixin û di hişê xwe de bi cî dikin û bibîr tînin (Connerton, 2019: 65). Li Afrîkayê ji bo kesên zana ku bi kevneşopîyan “gencîneya çandî” ya civaka xwe parastine “grîot” tê gotin. (Asmann, 2018: 62) Di heman demê de grîot helbestvan, mûzîsyen, çîrokbêj û reqsvan in jî.

Asmann, di pirtûka xwe de ji “grîot”ekî derbarê çanda devkî ya Afrîkayê de hin agahiyên par ve dike. Grîotê bi navê Lamine Konte ku Senegali ye, wiha behsa fonksiyona grîotiyê dike: “Li Afrîkayê di dema ku nivîs tunebû wezîfeya bibîranîn û veguhastinê di civakê de didan ser milê komêk taybet. Ji bo bi serfirazî veguhastina paşerojê bê kirin bawerî li ser bandora mûzîkê hebû. Ji bo vê yekê peywira vegotina rabirdû ya devkî dan vê koma mûzîsyen. Ev kes bûn parêzkarên bîranînên hevpar yê gelê Afrîkayê (Asmann, 2018: 62).

Di çandên devkî de weke ku li jor jî hatiye rêzkirin her veguhêzerekî hafizeya civakî bi navekî taybet tên binavkirin. Li Îranê jî ji bo vebêjerên çîrokan ku li gund û bajaran digeriyan û bi strankî çîrokên xwe digotin “neqqal”tê gotin. Neqqal, ji bilî çîrokên xwe çîrokên weke Sadî Şîrazî ji pirtûka wî “Bostan”ê jiber dikirin û qiseyên pêxemberan digotin. Di nav gel de eleqeyek mezin didîtin (Parilti, 2006: 56). Di çanda devkî ya kurdî de jî vê wezîfeya girîng dengbêj, çîrokbêj, destanbêj û hin kesên din yê zana tînin cih. Dengbêj dîroka devkî û kevneşopayên civaka xwe ji nîşkekê veguhastine nîşkeke din. Di civakên çanda devkî de pêzanînên hin kesan li gorî kesên din zêdetir e. Mînak hafizeya extiyar û pîran li gorî hafizeya ciwanan bêtir tiştên paşerojê diparêze. Ji bo vê yekê ev gotina ku bi her extiyarekî re pirtûkxaneyêke dimire gotineke di cî de ye. Di beşa dengbêjiyê de bi berfirehî dê li ser fonksiyona dengbêjan û dengbêjiyê bê rawestîn.

Hafizeya civakî bi saya van kesên şareza her tim zindî maye. Michal Bodemann ku Sancar jê vediguhezîne hafizeyê dişibîne şanogehê. Li gorî wî weke ku di hafizeya kolektîf de paşeroj li pêş komêk temaşevan tê pêşkêşkirin û tê temsîlkirin (Sancar, 2016: 55). Helbet ne pêkane ku hafîze paşerojê bi her hûnguliyên ve bi bîr bîne. Ji dezavantajên çanda devkî yek ev e ku gelek zanîn ji ber ku derbasî nivîsê nebûne hatine jibîrkirin.

Lêbelê tevî van nerênîyan civakan bi hişê civakî çand û dîroka xwe ji wendabûnê xilas kirine. Her çiqas tê gotin ku mîletên çanda devkî dîroka wan û hişmendîya wan ya dîrokî tune ye, hafizeya kolektîf vê baweriyê pûç dike.

Di avakirina hafizeya kolektîf de rola dengbêjan gelek girîng e ku kilaman di vî warî de roleke sereke lîstine. Bi saya kilamên dengbêjiyê qewimînên di civaka

kurdan de ku bi sedan sal berê hatine jiyîn gihîştine heta îro. Gel ji kilaman çî evîn çî xembarî û çî mêrxasiyên civaka xwe hîn dibin.

Bo nimûne kilama “Zembîlfiroş” ku Meryem Xan distrê di encama hafizeya kolektîf de pêk hatiye û gihîştîye heta roja îro me dibe 500 sal berê ku ev destan ji aliyê helbestkarê klasîk Feqiyê Teyran ve ji çanda gel hatiye wergirtin û nivîsîn. Ji dengê Meryem Xanê em hay ji vê evîna destankî dibin. Lêbelê ji ber ku ev kilam gelêrî ye û di demeke kevin de pêk hatiye afirînerê kilamê nayê zanîn. Ji ber vê sedemê kilamên gelêrî bi gelek varyasyonan ve belav dibin. Her dengbêjek kilamê li gorî xwe ji nû ve ava dike û distrê. Ji kilamên ku Meryem Xanê strane “Bavê Koroxlî, Qumrîkê, Helîmê” çend kilamên gelêrî ne.

#### **1.4. DENG BÊJÎ**

Dîroka çanda dengbêjiyê di nav kurdan de kengî dest pê kiriye bi awayekî teqez nayê zanîn. Her çiqas li gorî hin çavkaniyan dîroka kevneşopiya dengbêjiyê bi Evdalê Zeynikê ve tê destpêkirin jî li gorî M.R. Izady ev huner û kevneşopiya dengbêjiyê di nav kurdan de piştî ku arî tên Kurdistanê dest pê dike. Lêbelê ji bo destpêka kevneşopiya dengbêjiyê diyarkirina dîrokeke teqez mimkûn xuya nake (Izady, 1996: 23). Ev huner di nav kevneşopiyên gelên hind û ewrûpî û di nav kevneşopiyên gelê tirk û îraniyan de jî cî digire. Çawa ku di çanda kurdan de ji bo van kesan “dengbêj” tê gotin di çandên biyanî de jî ji bo van kesan “balad, ozan an aşiq, neqqal, bard” tê gotin. Lêbelê ji ber ku milletê kurd dereng derbasî heyama nivîsê bûne bi gelemperî jiyinên xwe bi rêya hunera dengbêjiyê bilêv kirine.

Ji bo vê yekê kevneşopiya dengbêjiyê di nav gelê kurd de xurt e û her çiqas îro lawaz bûbe jî hêj hebûna xwe diparêze. Dema em li wateya peyva dengbêjiyê dinêrin tê dîtîn ku ji du bêjeyan “deng” û “bêj” pêk tê. Ji bo vê yekê dengbêj pêşî “hosteyê deng û gotinê” ye (Mutlu, 1996: 55). Kendal Nezan jî ji bo dengbêjan dibêje ku ew xwedî hafizeyeke awarte ne. Xwedî dengê xweş in û dibe ku ew gundiyekî hosteyê amûran bin jî. Di heman demê de ew afirîner, şair û bestekar in (Nezan, 1996: 13). Dengbêj ew kes in ku tiştên bihîstine, dîtine, jiyiyane yan jî bûne şahid bi kilamên xwe ew gihandine heta roja îro. Ji bo vê yekê ew hem weke dîroknas hem weke civaknas hem weke edebiyatnas û hem weke filozofan e.

Dengbêj ji bo çanda kurdan bûne çavkaniyên çandî, dîrokî û kevneşopiyan. Ji bo miletekî ku hemû qewiminên xwe bi rêya devkî veguhastiye, mûzîk helbet di jiyana wî miletî de xwedî cihekî bêhempa ye. Ji ber vê sedemê mûzîka kurdî xwedî fonksiyoneke civakî ye jî. Destan, bûyerên mêrxasî, helbestên lîrîk, bûyerên dîrokî, berhemên edebî her tişt bi strankî tên gotin ku neyên jibîrkirin. Ji bo vê yekê mûzîka kurdî “gelêrî” ye (Nezan, 1996: 13). Kilamên ku bi sed salan e hatine gotin her çiqas ji aliyê hunermendekî ve hatibe hilberandin ji ber ku berhemên çanda devkî ne û di maweyeke dûr û dirêj de hatine heta roja îro xwediyê wan nayê zanîn. Ji bo vê yekê ew berhemên kesan îro weke berhemên miletekî tên zanîn.

#### **1.4.1. Taybetiyên Kilamên Dengbêjiyê**

Gelê kurd bi gelemperî hîs û hestên xwe, jiyînên xwe, gazinên xwe, serhildanên xwe, bêrîkirinên xwe bi kurtasî têkiliyên xwe yên civakî bi strankî ji nîşkekê gihandine nîşkeke din. Dikare bê gotin ku ciwanên kurd dîroka gelê xwe bi rêya van stranan hîn dibin. Dîrokek bi saya mûzîkê ji mirinê xilas dibe. Di tebîetê kurdan de mûzîk heye. Bi gelemperî dema em kilamên dengbêjiyê binirxînin ev kilam li ser evîn, mêrxasî, xerîbî, tenêfî, dûrketin, koçkirin, jihevqetîn û her wekî din in. Ango her kilamek dengbêjan çîroka gelê wan e. Her çîrokek ku dengbêj kiriye mijara kilama xwe peyamek wê ya girîng û dîrokek wê heye.

Her lêkolînerêkî li gorî lêkolîna ku kiriye kilamên dengbêjiyê ji aliyê mijara wan ve dabeş kirine. Vahap Uluç, kilamên dengbêjiyê li gorî mijara wan bi gelemperî kiriye weke sê beşan; kilamên xwîndariyê, kilamên siyasî û evîniyê. (Uluç, 2007: 181).

Li gorî Nezan jî ji ber ku şer di jiyana kurdan de cihekî muhîm digire, kilamên destankî (epîk) gelekî zêde ne. Cudatiya di navbera mûzîka herêmên çiyayî û mûzîka deştê de li ser navên van kilaman jî tê xuyakirin. Xelkê deştê ji van kilaman re dibêjin “delal” yên çiyayî jî dibêjin “lawikê siwaran” (Nezan, 1996: 15) Ji ber vî awayî dengbêjan ev şer û mêrxasiyên girîng ku bihîstine, bûne şahid yan bi xwe tevlî wan bûne, kirine mijara kilamên xwe.

Bo nimûne di serhildana Şêx Mehmûd Berzencî de dengbêj Kawîs Axa diçe beşdarî serhildanê dibe û kilamekê derbarê vê serhildanê çêdike. Dengbêjê mîrê

Osmaniyan Surmeli Mehmed Paşa, Evdalê Zeynikê jî di sala 1865an de bi mîrê xwe re diçe serhildana “Xozandaxê” û kilamekê davêje ser vê serhildanê. Em dikarin van mînakên zêde bikin. Kilamên ku dengbêj Reso dibêjin lehengê wan Şêx Seîd, Îhsan Nûrî Paşa, Eliyê Ênis û Ferzende ne piranî (Ulugana, 2016: 39). Di van kilaman de lehengî û mêrxasiya şervanên serhildanê anîne ziman.

Kilamên ku Meryem Xanê bideng dixwe “Bavê Koroxlî, Qesra Baxemsê û Mala Faro” mînakên kilamên mêrxasiyê ne. Ahmet Aras jî bo kilamên dengbêjiyê dibêje ku kilamên kurdan weke stranên gelên din ne tenê stran in. Taybetiyên wan hene. Ew hem stran in hem jî belgeyên dîrokî ne. Sosyolojiya kurdan û mantalîteya kurdan e û hem jî xezîneya zimanê kurdî ne (Aras, 2007: 229). Ji xeynî kilamên şer û şûr û mêrxasiyê di piraniya kilamên dengbêjiyê de evîn weke temayeke sereke cî digire. Piraniya kilamên bengîtiyê bi encameke trajîk ve bi dawî dibin.

Kendal Nezan, bo evînen têkçûyî weke sedem astengiyên ku civakên pederşahî derdixin pêşiya gel nîşan dide (Nezan, 1996: 16). Mînak; Kilama Lawikê Metînî, Derwêşê Evdî, Metran Îsa, Wele Domam û ji destanên gelêrî Siyabend û Xecê, Tahar û Zeharê û Mem û Zîn hemû bi dûmahîkek trajîk ve bi encam bûne. Di kilamên Meryem Xanê yê bengîtiyê de ku piraniya wan li ser evîneke têkçûyî hatine hûnandin ev rastî derdikeve pêş.

Di vê gencîneya ku dengbêjan ji me re hiştine pêkane ku hemû rengê erdnîgariyekê bê dîtin (Ronî, 2012: 280). Li gorî herêman hin dengbêjan van kilamên xwe bi amûran hin ji wan jî bê amûr tenê bi dengê tazî strane. “Dengbêjên Serhedê ne li sazê xistine ne jî saz nas kirine. Wan navê tembûrê jî nebihîstine. Di sala 1960î de bi wasîteya radyoya Êrîwanê ji tembûra Mihemed Arif Cizrawî haydar bûne. Kurdên Rewanê enstrumentên modern di kilamên kurdî de bikar anîne.” (Aras, 2007: 244).

Evdalê Zeynikê, Reso, Şakiro, Ferzê di kilamên xwe de enstruman bi kar ne anîne. Li gorî nêrîna hin kesan dengbêjên baş enstruman bi kar neanîne. Lewre tê gotin ku bikaranîna amûrên mûzîkê tê vê wateyê ku dengbêj kêmasiyên xwe pê vedişêre. Lêbelê ji dengbêjên mezin yê herêma Botan Meryem Xan, Îsa Berwarî,

Hesen Cizrawî, Mihemed Arîf Cizrawî û gelek dengbêjên din yê Botî ku di kilamên xwe de amûrên mûzîkê bi kar anîne vê nêrînê pûç dikin.

### 1.4.2. Statûya Dengbêjan

Mûzîk di jiyana kurdan ya civakî de cihekî taybet digire. Ji bo vê yekê piraniya beg û axayan an malbateke mezin dengbêjekî wan hebû. Dengbêjan bi mûzîka ku îcra dikirin çîroka civaka xwe dianîn ziman. Ji bo vê yekê di civakê de her kes li dengbêjan xwedî derdiketin û qedr û qîmeteke mezin didan wan.

Mehmet Gultekin li ser statûya dengbêjan ya civakê vediguhezîne ku heta serê sedsala 20. li Kurdistanê sê kes hebûn ku bangî civakê dikirin. Ji wan yekemin beg û axa, duyemîn mela û sêyemîn jî dengbêj bûn (vghz. Şen, 2016: 43). Ango dengbêj di nav sê kesên ku karigeriyê li ser civakê dikin yek e. Ji vê gotinê tê famkirin ku dengbêj xwedî statûyeke girîng in.

Heta ji van sê kesên ku behsa wan tê kirin ku yek jê dengbêj e bandor li ser mîr, beg û axayan jî kirine. Heke ji bo cureyên dengbêjiyê senifandineke hewce bike di civakê de sê cure dengbêj hene. Ji van yê yekemîn dengbêjên gel in, yê duyemîn dengbêjên mîr û began in û yê sêyemîn jî mitirb in. Dengbêjên gel, her tim di nav gel de bûn û ji bo gel kilamên xwe digotin. Dengbêjan efsane, bûyerên mîtolojîk û dîrokî, erf û edetên civakê di nav gel de bi strankî digotin (Çelebi, Yıldırım & Ataş, 2006).

Dengbêjên mîr û began hunera xwe di dîwanan de îcra dikirin. Di nav dengbêjên dîwanê de yê herî navdar Evdalê Zeynikê ye. Evdalê Zeynikê dengbêjiya mîrê Elaşgirê Surmeli Mehmet Paşa dikir. Dengbêj Karapetê Xaço bi salan ji malbata Filîtê Quto re dengbêjî kiriye (Kevirbirî, 2009: 22). Li gorî Mehmet Gultekin dengbêjên herî baş serayê hilgirtine cem xwe. Dengbêjên gel û serayê ji ber ku bangî civakên cuda dikin ji hev diqetin. Tevî cudatiya statûya wan zimanê di navbera serayê û gel de qet naguhere. Her çiqas ji mîr û mêvanên wî re kilaman dibêjin jî, ji aliyê din ve ji gundiyan re jî dibêjin (Şen, 2016: 47).

Dengbêjan ji alimên mezin re jî dengbêjî kirine. Dengbêj Reso ji dîwana Mele Yehya Gunduz re dengbêjî kiriye. Edebiyata Reso ya medreseyê bû (Beğik, 2018:

64). Ji bilî dengbêjên gel û serayê hin mûzîsyenên din hene ku xwe weke “mitirb”an bi nav dikin li aliyekî ve wezîfeya hafîzeyê civakî ya eşîreta xwe dikirin li aliyekî jî weke bangeşevanê axayê xwe mêrxasiya wan dianîn ziman (Keskin, 2016: 22). Ango ji bo mitirban dikare bê gotin ku hem dengbêjiya gel hem jî dengbêjiya axayan kirine.

Dengbêjan aqilmendiya mîr, beg û axayan dikirin. Çimkî wan bûyerên civakî û siyasî bi baldarî dişopandin. Ji bo vê yekê her straneke xwe li ser qewimînek, bûyereke û kesayetên girîng digotin. Dengbêjan di kilamên xwe de tenê ne pesnê mîran didan di heman demê de li wan rexne jî digirtin. Dema Surmeli Mehmet Paşayê Elaşgîrî di sala 1865an de bi daxwaza Osmaniyan jî Serhedê gelek şerkar berhev kirine û çûye aliyê Edeneyê ji bo şikandina serhildana Xozandaxê, dengbêjê wî Evdalê Zeynikê gazinan lê dike (Gültekin, 2015: 21). Ji bo vê serhildanê Evdal gazinên xwe wiha bilêv dike; “Hezar mêrî nebe li Xozandaxê winda neke / Perdê bûka li dar ve neke / Me li welatê Serhedê rûreş neke”.

Dengbêjan bi kilamên xwe bi salan li ser civaka kurd bandorek mezin hiştin. Di bûyerên civakî û siyasî de şewirmendiya gel kirine. Ji bo vê yekê dengbêj her tim ji aliyê gel, mîr û began ve hatine parastin.

### **1.4.3. Dibistanên Dengbêjiyê**

Ji ber ku hunera dengbêjiyê hunereke devkî ye pêvajoya perwerdehiya dengbêjan ji saziyên perwerdehiyê yên modern gelekî cudatir e. Ev kevneşopî bi rêya hoste û şagirtan gihaştiye heta roja îroj. Çawa ku Şen ji Gültekin vediguhezîne dengbêjan odeyeke mala xwe ji bo gihandina şagirdên xwe vediqetandin. Ciwanên ku meyla wan li ser vê hunerê bûn û dengxweş bûn bi xwe diçûn cem dengbêjên ku wê heyamê bi nav û deng bûn an bi daxwaza yekî ji malbata xwe û demeke dirêj li cem hosteyê xwe perwerdehiya vê hunerê didîtin. Şagird li aliyekî perwerde dibûn li aliyê din kar û barê rojane yên dengbêjên xwe dikirin. Şagirdan ji bilî saetên perwerdehiyê her roj karê nav zeviyan ên bax û baxçeyan dikirin (Şen, 2016: 50).

Dengbêjan ji bo hînkirina vê hunerê ji malbatên ciwanan tu pere nedixwestin. Lêbelê li gorî pêzanînan ku hunermend Delîl Dîlanar bi Besîme Şen re par ve dike ciwanên ku diçûn cem dengbêjê pêdiviyên xwe yên sereke weke rûn û arvan ji bo şeş

mehan bi xwe re dibirin. Mînak ji çiyayê Agiriyê heta Qereyaziyê li pişt hespê du rojan bi rê ve diçûn (Şen, 2016: 51). Ev ciwanên ku li cem dengbêjan şagirtî dikirin û têdigihîştin, keda hostadên xwe tu car ji bir nedikirin, pir caran qala serhatî û qedirbilindiya wan dikirin (Gültekin, 2013: 29).

Evdalê Zeynikê ku weke Homerosê kurdan tê binavkirin dengbêjê mîrê herêma Elaşgirê Surmeli Memed Paşa bû. Ji bo perwerdeya dengbêjan û veguhastina çand û kelepura kurdî kedeke mezin daye. Bi sedan kilamên ku wî bi xwe afirandine û strane bi rêbaza hosteyî û şagirtî gihandiye heta îro. Di dengbêjiya Serhedê de Evdalê Zeynikê fenomenekî pir muhîm e. Di dengbêjiya kurdî de tradîsyoneke nû derxistiye. Hemû dengbêjên Serhedê bûne domdarê vê tradîsyonê (Aras, 2007: 233). Dengbêjên weke Mistefa Xelo Heyran ku ji Parsînê bû, li cem Evdalê Zeynikê perwerde bûbû (Gültekin, 2013: 29). Mistefa Xelo Heyran jî bi wan zanyariyên ku ji Evdal wergirtibûn şagirtên xwe yê weke Kerem û Mihemedê Canşah perwerde kiribû (Gültekin, 2015: 26).

Li gorî agahiyên ku Mehmet Gultekin bi Besime Şen re par ve dike heta salên 1930î dibistanên dengbêjiyê hebûn. Li Qereyaziyê dibistaneke dengbêjiyê hebû. Ev dibistan bi perwerdehiya ku dengbêjê navdar Mistefa Xelo Heyran dida dewam kiriye. Vî dengbêjî nêzî heşt ciwan (şagird) aniye cem xwe û wan perwerde kiriye (Şen, 2016: 49). Bazîl Nîkîtîn ji Rojhilatnasê Elman Oscar Mann neql dike ku ji bilî medreseyan dibistanên dengbêjiyê hene. Ciwanên bi qabiliyet û dengxweş ji bo perwerdehiyê diçûn cem hosteyekî, repertûara wan a kevneşopiya devkî hîn dibûn. Hejmara dengbêjên xwenede kêr bûn (Nikitin, 2013: 459).

Weke ku me li jor jî got helbet ev dibistan divê weke dibistanên îro yê modern neyên fikirîn. Ji ber ku dengbêjan odeyek ji mala xwe ji bo perwerdehiya şagirtan vediqetandin, ev perwerdehî bi awayekî profesyonelî nedihat dayîn. Temamê perwerdehiyê bi devkî bû. Kilam an destan bi rêbaza jiberkirin û dubarekirinê dihat hîn bûn. Heta ku şagirtan kilam bi hemû taybetmendiyên wê û bêqusûr hîn dibûn ji ber dikirin. Taybetmendiya herî mezin a şagirtan xwedî hafizeyek xurt bûn. Dikaribûn bi sedan kilaman jiber bikin û wan di bîra xwe de bihêlin. Şagirt gelek caran bi hosteyê xwe derdiketin gerê û di van geran de hin cihên nû bi çanda wan

keşif dikirin. Mînak dema dengbêjên hoste beşdarî civatan an şevbihêrkan dibûn ciwan jî bi xwe re dibirin.

Dengbêj ew derfet dida şagirtan ku li hember civakê hunera xwe pêşkêş bikin û jixwebaweriya wan zêde bibe. Dengbêjên ciwan jî di van civînan de hosteyê xwe bi her awayî dişopandin û perwerdehiya xwe li vira jî dewam dikirin. Ev tiştên ku di şevbihêrkan de hîn dibûn ji bo hilberandina kilaman bi kêrî wan dihat. Em dikarin bêjin ku pêvajoya perwerdehiya dengbêjiyê li her civînên ku dengbêj beşdar dibûn dewam dikir. Her çiqas ev dibistan ne weke dibistanên fermî bin jî bi awayekî sistematîk û bi şêwazeke kevneşopiyî dimeşyan. Evdalê Zeynikê, Mistefa Xelo Heyran, Ferzê, Reso û Şakiro di van dibistanan de bi rêbaza hosteyî-şagirtî perwerde bûne. Her dengbêjek bûye duajoyê dengbêjekî.

Lêbelê heman tiştî em nikarin ji bo Meryem Xanê û dengbêjên jin bêjin. Ji ber ku Meryem Xan jin bû û di civakê de hunermendiya jinan nedihat qebûlkirin, Meryem Xan di pêvajoya perwerdehiya bi rêbaza hosteyî-şagirtî de tu carî derbas nebûye û di dîwanan de derfeta strîna kilaman nedîtiye. Civak ji ber nasnameya wê ya jintiyê li dij hunermandiya wê derketibû. Dengbêj Meryem Xan jî ji xwe re rêyekê hildibijêre û di radyoyê de hunera xwe pêşkêş dike. Dengê xwe bêtir di ser radyoyê re dide bihîstîn. Ji bo vê yekê em dikarin bêjin ku Meryem Xan ji dengbêjên din ku bi rêbaza klasîk hunera xwe îcra kirine cudatir hunera xwe zêdetir bi rêbazeke modern pêşkêş kiriye.

Lêbelê Meryem Xan jî weke dengbêjên din kilamên xwe bi rêbaza klasîk hilberandiye û straye. Herweha tê dîtin ku Meryem Xanê tesîr li ser gelek jinên dengbêj û stranbêj kirine. Ji van jinan yek jê dengbêj Eyşe Şan e ku weke Meryem Xanê di jiyana xwe ya hunerî de rastî gelek astengiyan hatiye. Ji bilî Eyşe Şan tê dîtin ku ji stranbêjên nûjen Şehrîbana Kurdî, dengbêj Gazin û wekî din li dû şopa Meryemê Xanê çûne.

Kevneşopiya dengbêjiyê ku di serdema mîrekiyên kurdan de gelekî pêş ve ketibû piştî têkçûna xweserîya van mîrekiyan û rûxandina mîrekiya Bedirxaniyan, saziya dengbêjiyê lawaz dibe (Pariltî, 2006: 123). Tevî gelek astengiyên li pêş dengbêjan bi hewla xwe ev kevneşopî ji wendabûnê xelas kirine û gihandine heta îro.

Lêbelê ji ber jiyana nûjen û kapîtalîst ku gelek tiştên nû pêşkêş dike eleqeya ciwanan a li ser dengbêjiyê pir kêm bûye. Stranbêjên weke Delîl Dîlanar û Nîzametîn Arîç her çiqas dixwazin vê hunerê bi ciwanan bidin hezkirin jî dikare bê gotin ku li gelek herêmên kurdan vê kevneşopiyê populeratiya xwe wenda kiriye.

Nîzametîn Arîç derbarê vê mijarê de diyar dike ku ji bo hezkirin û famkirina dengbêjiyê agahî û sebir hewce ye. Veguhastina dengbêjiyê ji bo pêşerojê zehmet e. Ji ber ku di kilamên dengbêjiyê de ewqas behsa bûyer û qewimînên berê tê kirin yekî modern nikare bi van çîrokan têkiliyekê dayne. Lehengên wê serdemê nas nakin (vghz. Şen, 2016: 215). Nîzametîn Arîç helbet bi refleksa hunermendiyê sedemên wendabûna kevneşopiyê dengbêjiyê rave dike. Lawazbûna hunera dengbêjiyê û wendabûna saziyên perwerdehiyê helbet girêdayî gelek sedeman e.

## **BEŞA DUYEM**

### **JÎNENÎGARIYA MERYEM XANÊ**

Dengbêj Meryem Xan, her çiqas ku bi deng û awaza xwe weke otorîteya mûzîka kurdî tê qebûlîkirin jî di nav civakê de baş nehatiye naskirin. Bi xebatên ku li ser wê hatine kirin her çiqas ev xebat kêm bin jî tê dîtin ku di tradîsyona dengbêjiyê de cihekî girîng digire ku bi berhemên xwe gelek nîrxên civaka xwe parastîye. Li gorî zanyariyên ku Kakşar Oremar di xebatên xwe de par ve dike Meryem Xan ji bo radyoya Bexdayê gelek kilam berhev kirine. Bi berhevîkirin û bi bidengxistina van kilamên kurdî hişt ku îro nişên nû hay ji çand û kelepura xwe hebin. Lêbelê serboriya Meryem Xanê weke ya gelek dengbêjên kurd di nav tenêti, xizantî û belengaziyê de derbas bûye. Seranserê jiyana wê bi hizînê derbas bûye. Di vê beşê de dê li ser jiyana Meryem Xanê bê rawestîn.

#### **2.1. CIHÊ JIDAYÎKBÛNA MERYEM XANÊ**

Dengbêj Meryem Xan, di sala 1904an de li hêrêma Cizîra Botan ji dayik bûye. Her çiqas li ser bajarê ku lê hatiye dinyayê pêzanînên ji hev cuda hebin jî çavkanî nîşan didin ku Meryem Xan xelkê Cizîrê ye li gundê Dêrgulê ji dayik bûye, bi ser qezaya Bêrtiyê ve ye (Xoşnaw & Hesên, 2006: 20). Lêkolîner Zeynep Yaş di pirtûka xwe de li ser cihê ku Meryem Xan lê ji dayik bûye ji Dengbêj Elmas Mihemed van agahiyan vediguhezîne ku ew ji gundê Dêrgula (Kumçatî) Qilava (Uludere) navçeya Şîrnexê ye û wê di sala 1904an de li vî gundî çavên xwe li jiyana vekirine. Navê bavê wê Mihemed Ehmedê Botî ye (Yaş, 2015: 121).

Kakşar Oremar ku bi salan e li dû şopa dengbêj Meryem Xanê diçe li ser cihê ku Meryem Xan lê ji dayik bûye heman agahiyan par ve dike ku Meryem Xan keça Mihemedê Ehmedê Botî, di sala 1904an de li gundê Dêrgolê hatiye dine (Oremar, 2004: 8). Di van çavkaniyên ku heta vira me par ve kirin em rastî tu agahiyên ji hev cuda nayên. Bi ihtimalek mezin çavkaniya van agahiyan dê yek be ku hemû nivîskar li ser cihê ku Meryem Xan lê hatiye dinê hemfikirin. Lêbelê H. Baran Mendeş ku ew jî bi salan e li ser jiyana Meryem Xanê lêkolînan dike û ev lêkolînên xwe weke pirtûkekê çap kir xwe digihîne malbata Meryem Xanê û gelek zanînen derbarê wê de pûç dike yan jî rast nabîne. Mendeş destnîşan dike ku Meryem Xan di sala 1904an de li gundê navçeya Basa (Güçlükonak) ya ku bi Şirnexê ve girêdaye li Kêrxwer (Demirboğaz) ê ji dayik bûye. Keça Heciyê Hemo ye. Her çiqas dengbêjek ji Botanê be jî, ji ber ku demekê bi ciwanekî ji herêma Tûr Abdînî (ji bajarê Mêrdîn, Êlih, Şirnex, Sêrt pêk tê) ango ji Kerboranê dizewice û piştî sê salan hev berdidin êdî Meryem Xan dibe xwedî nasnameyêke Torî jî (Mendeş, 2019: 10-73).

Em dibînin ku di van çavkaniyên li ber destê me de her çiqas li ser gundê ku Meryem Xan lê ji dayik bûye agahî ji hev cuda bin jî ew dengbêjêke ji herêma Botan e. Ji xwe sewt û awaza Meryem Xanê û şêwaza kilamgotina wê jî me digihîne hin zanistan. Li jêr dema em behsa taybetmendiyên hunera wê dikin ev cudabûn derdikeve pêş. Herweha di kilamên ku tê îdîakirin wê bi xwe nivîsîne û strane em rastî devoka herêma Botan tên.

## **2.2. MALBATA WÊ**

Gelek nivîskarên ku derbarê jînenîgariya Meryem Xanê de lêkolîn kirine dest nîşan dikin ku Meryem Xan bi navê xwe yê din Helîma Heso keça Mihemed Ehmedê Botî ye (Yaş, 2015: 121). Oremar jî di hemû nivîsên xwe yê derbarê Meryem Xanê de diyar dike ku Meryem Xan keça Mihemedê kurê Ehmedê Botî ye (Oremar, 2004: 8). Celal Mela Hesên ji Mela Ubeyd Hecî Seîd vediguhêzîne ku Meryem Xan Herkî ye ji şaxa Simayîl e. Ji binemala mala Reşe navê wê Meryem Mîkaîl Mîkaîl e, navê dayika wê Mereze ye (Xoşnaw & Hesên, 2006: 22). Weke ku em dibînin derbarê jiyana Meryem Xanê de agahiyên ji hev cuda derdikevin pêş me. Her nivîskarek li gorî xebata xwe, xwe gihandine hin zanyariyan.

Lêbelê Mendêş, ji Hacî Ozdemir ku Meryem Xan dibe metika wî vediguhêzîne ku jiyana Meryem Xanê û ya Elmas Xanê gelekî li nav hev xistine. Bavê Meryem Xanê Heciyê Remo ye. Ji eşîra Jêliyan e. Rewşa wî ya aborî, baş bû. Li gundê Kêrxwerê bi ajeldariyê ve mijûl bû. Li wê herêmê yekî bi qedr û qîmet bû. Yekî oldar bû. Pir jê dihat hezkirin. (Mendêş, 2019: 55-56). Dema em li jiyana Elmas Xan bi navê xwe yê din Elmas Mihemed dinêrin em dibînin ku li di sala 1894an de li Dêrgula (Kumçatî) Şîrnexê hatiye dinyayê. Navê bavê wê Mihemed e. Ew jî di dema şerê Cîhanê yê Yekem de bi malbata xwe re koçî Zaxoyê kirine. Dibe ku ji ber van şibandinan jiyana wan li nav hev ketibe. Lewre merivên Meryem Xanê diyar dikin ku Elmas Xan ne meriva wan e.

Sê zarokên Heciyê Hemo çêbûne. Yek jê Meryem Xan yê din Huseyîn û Yehya ne. Meryem Xan ji her duyan mezintir e. Birayê wê Huseyîn dema beqçîtî dikir ji aliyê leşkeran ve tê kuştin.

Li ser zaroktiya Meryem Xanê tê gotin ku bi nexweşiya keçeliyê (gurîbûn) ketiye. Ev derd li Kurdistanê herweha li welatê ecem, rûm û welatê ereb belav bûbû. Ji ber ku di wê serdemê de doktor û derman tunebûn, herweha girîngî nedidan paqijiyê û sabûn tunebûn. Meryem Xan her dem serê xwe bi laçikê girêdida (Xoşnaw & Hesên, 2006: 17). Meryem Xan heta deh saliya xwe li gundê ku lê ji dayik bûye li Kêrxwerê jiyana xwe derbas dike. Ji zaroktiya xwe de bala wê li ser dengbêjiyê bû. Wê perwerdeya xwe ya hunerî di germiyan, zozan, şahî û şîniyên Botanê de, di nava gelê xwe yê xwedî çandê çend hizar salî de stend (Oreman, 2004: 8). Her tim beşdarî şahî û dawetan dibû. Piştî ku bi hevserê xwe yê ewil Xelîl Înan re dizewice rastî gelek tade û tengasiyan tê. Hevserê wê ji ber erf û edetên civakê naxwaze Meryem Xan kilaman bêje. Devjêberdana strandina kilaman ji bo jineke wiha hunerhez karekî pir dijwar bû.

### **2.3. ZEWACA WÊ**

Di gelek çavkaniyan de derbas dibe ku Meryem Xan bi yekî ji malbata Bedirxaniyan re zewiciye. Li gorî îdfayan dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn dest pê dike Meryem Xan hêj deh salî bû. Dewleta Osmanî hêdî hêdî belav dibû. Kurdan jî dest bi serhildanan kiribûn. Piştî van serhildanên ku têk çûn gelek kurd mecbûr man ku koçî Binxetê (Sûriye) bikin. Malbata Meryem Xanê jî ji ber ku beşdarî van

serhildanan bûn koçî Qamişloyê kirin. Li Qamişloyê bi xortekî malbata Bedirxaniyên navdar re dizewice. Jiyana Meryem Xanê û xortê Bedirxanî zêde dewam nake. (Oreмар, 2004: 8).

Lêbelê di pirtûka Yaş de ev cih weke Şam derbas dibe. Meryem Xan li Şamê xortek bi navê Mihemed ku ji binemala Bedirxaniyan bûye nas kiriye û ji hev hez kirine, lê dema wê xwestiye ku ew dengbêjiyê bike ev hezkirina wan neçûye serî û ji hev ve qetiyane. (Yaş, 2015: 121). Heta tê gotin ku kilama bi navê “Mihemedo Ronî” li ser vê hezkirinê nivîsiye û gotiye. Lêbelê keça Celadet Elî Bedirxan, Sînemxan Bedirxan vê pêzanîne red dike û dibêje ku tu carî meseleyek wisa li nav malbata me, bi kesek ji malbata me re çênebûye (Yaş, 2015: 122). Bingeha gelek îdfayên li ser jiyana Meryem Xanê tune. Lewre navê ew xortê ji malbata Bedirxaniyan nayê zanîn û di tu çavkaniyan de jî derbas nabe. Kilama “Mihemedo Ronî” ku tê gotin Meryem Xan li ser jihevqetîna xwe û hevserê xwe gotiye jî ne teqez e. Lewre Zeynep Yaş diyar dike ku vê kilamê berî Meryem Xanê ji aliyê hin dengbêjên din ve hatiye gotin (Yaş, 2019).

Mendeş, li gorî agahiyên ku ji malbata wê bi dest xistine diyar dike ku Meryem Xan du caran zewiciye. Di sala 1920î de li gundê Zivingê (Yoncalı) ku girêdayî Kerborana Merdîne ye bi xortê navê wî Xelîl re dizewice. Wê demê Meryem Xan şanzdeh-hivdeh salî ye. Piştî ku dê û bavê wê û birayê wê Huseyîn diçin ser dilovaniya xwe ew û birayê xwe yê biçûk Yehya tenê dimînin û tên gundê Çêlika Mala Eliyê Remo. Demekê li vira dimînin. Ev malbat gelekî ji Meryem Xanê hez dike û lê xwedî derdikeve. Heta tê gotin ku Meryem Xan kilama xwe ya “Mihemed Selîm Zavakî Teze” li ser mezinekî mala Eliyê Remo gotiye. Li ser daxwaza birayê wê Yehya ev zewac pêk tê (Mendeş, 2019: 76). Lêbelê zewaca wan zêde dewam nake. Lewre, Meryem Xan dixwaze xeyala xwe ya dengbêjiyê bîne cih û di vî warî de pêş bikeve. Xeyala wê ya herî mezin ew bû ku qewaneke (sêlik) bi kurdî derxîne. Ji bo vê daxwaza xwe her çiqas ji hevserê xwe re dibêje ez bêyî kilaman nikarim bijîm, di xwîna min de huner û stran heye. Heke kilaman nebêjim ez ê bimirim (Ekmek ve Gül, 2017) wî qanî nake.

Hevserê wê her tim pê re dikeve nîqaşê ku dev ji dengbêjiyê berde. Êdî ji bo vê daxwaza xwe her tişt dabû ber çavên xwe û pêşniyaza hevserê xwe ya hevberdanê

qebûl dike. Neviya neheq ya Meryem Xanê keça Fexrê, Emîna li ser bapîrê xwe Xelîl Înan re dibêje ku “yekî pir dilhişk bû. Nedihişt ku dêmariya me Meryem Xan kilaman bêje. Ji bo vê yekê Meryem Xanê ew terikand” (Mendes, 2019: 54). Ev biryar ji bo wê biryareke gelek zor û zehmet bû. Lewre Meryem Xan wê demê hêj bîst salî bû. Hêj êşa dê û bavê xwe ji ser xwe ne avêtibû. Di heman demê de wê çaxê hevberdana jin û mêran di civakê de pir eyb dihat dîtin. Bi taybetî qîmeta jinê li ber çavê xelkê pir kêr dibû. Di nav gel de bi çavekî nizim li wan dihat nêrîn. Meryem Xan nedixwest di vî temenê ciwan de bibe jineke bî û belengaz.

Piştî hevberdanê Meryem Xan diçe gundê Çêlikê cem birayê xwe Yehya. Hevserê wê Xelîl Înan, piştî ku wê berdide ji gundê xwe bi keçeke bi navê Eysa Seyîd re dizewice. Ji vê xanimê sê keçên wî Nûcûda, Fexrê û Fatma û kurekî wî yê bi nav Tûrhan çêdibin. Xelîl Înan di sala 1945an de li gundê Zivingê diçe ser dilovaniya xwe (Mendes, 2019: 98-99). Piştî ku ji hevserê xwe Xelîl diqete Meryem Xan diçe Mûsilê. Li Mûsilê di sala 1926an de bi pîlotekî ereb re dizewice. Nêzî deh salan li vira dimîne. Bi hevserê xwe yê nû re jiyaneke bextewar derbas dike. Lêbelê hevserê wê bi balafira ku wî diajot qezayekê dike û wefat dike (Mendes, 2019: 89-90). Ji vê zewaca wê tu zarokên wê tunene. Meryem Xan careke din tenê û bêkes dimîne.

#### **2.4. SERBORÎYA WÊ YA LI BEXDAYÊ**

Piştî ku hevserê wê diçe ser dilovaniya xwe Meryem Xan, xwe bi temamî dide hunerê. Êdî dê ji bo xeyala xwe ya hunermendiyê bixebite. Dema Meryem Xan li Mûsilê ye dibihîse ku kompaniyên mûzîkê yên îngilîz li Bexdayê stran û kilamên kurdî, farsî, ermenîkî û erebî berhev dikin û sêlikan saz dikin. Bi vê xebatê dê hunermend bihatana naskirin û dê qewanên ku dengê wan dê li ser bihatana tomarkirin wê li piyasayê bihatana firotin. Ev ji bo Meryem Xanê dibe firsendek. Ji xwe xewn û xeyala wê ew bû ku dengê xwe li ser sêlikan tomar bike û jiyana xwe bi hunerê dewam bike. Ji bo vê daxwaza xwe dibêje, ez ê biçim Bexdayê dengê xwe qeyd bikim, pişt re dimirim jî bila bimirim (Nado, 2011: 7). Bi van gotinan xwestek û xeyala xwe ya bi salan nîşan dide.

Li gorî pêzanînên ku Yaş par ve dike Meryem Xan di sala 1921 de (di hin çavkaniyan de jî weke 1924 derbas dibe) pêşî berê xwe dide Zaxoyê. Ji ber ku mala mamê wê Mihemed, bavê Elmas Xanê (Elmas Mihemed) li wê derê bûye û ew jî ji

ber qeyran û neçariya di sala 1915an de reviyane û li Zaxoyê bi cî bûne. Li Zaxo, li nav mala Yûsiv Şemdîn Axa maye û kar û barê wan kiriye (Yaş, 2015: 122). Di hemû xebatên li ser jiyana wê ev agahî cî digirin. Lêbelê sedema çûyin û mayina wê nayê zanîn û di çavkaniyan de cî nagire.

Mendeş ku bi merivên wê re hevpeyvînê dike diyar dike ku Meryem Xan tu carî li mala yekî bi navê Yûsiv Şemdîn Axa nemaye. Ji bilî dawetan tu carî neçûye Zaxoyê û weke ku tê destnîşankirin 12 salan li mala vî şexsî nemaye (Mendeş, 2019: 90). Her çiqas li ser çûyîna wê ya Zaxoyê agahî ji hev cudabin jî bi çî sedemê dibe bila bibe rêya Meryem Xanê bi Zaxoyê ketiye. Çi bi armanca dawetan çî bi armanca mayînê. Meryem Xan piştî ku hevserê wê yê pîlot diçe ser dilovaniya xwe, ji bo xeyala xwe ya hunermendiyê di sala 1936an de diçe Bexdayê. Li Bexdayê li mala Dengbêj Elmas Xan (Elmas Mihemed) dimîne. Elmas Xan deriyê mala xwe jê re vedike û destekeke mezin dide Meryem Xanê.

Mala Elmas Xanê malek ne ji rêzê bû, weke dibistanekê bû. Lewre wê demê gelek hunermend, siyasetmedar û rewşenbîr li mala wê dicivyan. Elmas Xan bi serbazekî îngilîz re zewicîbû. Rewşa wê ya aborî pir baş bû. Mala xwe ji bo hunerhezan vekiribû û piştgiriyeke mezin dida wan. Meryem Xan gelek dengbêjên weke Mihemed Arif Cizrawî, Nesrîn Şêrwan, Hesên Cizîrî, Elî Merdan û Seîd Axayê Cizîrî li vira nas kirin. Meryem Xan, êdî di civatên ku li vira dihatin damezrandin kilamên xwe digot. Rojekê dîsa dema ku ev civat li wira kom dibe Meryem Xan kilamekê distrê, her kes heyrana dengê wê dibe û ji wê rojê pê ve êdî di şevbihêrkan de her gav li pêş rûdinê, ji xembarî û hizinbariya xwe kilaman distrê (Nado, 2011: 8). Meryem Xan demeke dirêj li mala Elmas Xanê dimîne. Paşê ji Elmas Xanê destûrê dixwaze ku êdî ji xwe re malekê peyda bike û li wira bijî. Li navenda Bexdayê li taxa Bab El-Şerqî xaniyekî kirê dikê û jiyana xwe li vira derbas dike.

Wisa xuya ye ku Meryem Xan, yekem jina kurd e ku bi zaravayê kurmancî sêlik derxistiye. Di dema wê de bi zaravayê soranî jî Dayikî Cemal ku ji Silêmaniyê ye li kompaniyên biyaniyan plak derxistiye. Meryem Xan bi kompaniyên îngilîzî mîna Beyzafon, Ebol-Kelp û Êdyonê re xebatên xwe didomîne. Di sala 1939an de radyoya Bexdayê dest bi weşanê dike û ji bo ku hunermendên kadroyî bigire di sala 1944an de pêşbaziyeke li dar dixwe. Gelek dengbêj û stranbêj beşdarî vê pêşbaziye

dibin, lêbelê Meryem Xan bi sewt û awaza xwe dibe yekemîna vê pêşbaziye. Êdî heta dawiya emrê xwe weke hunermendeke kadroyî di radyoya Bexdayê de dixebite.

Meryem Xan, piştî ku di radyoyê de dest bi kar dike ji bo çand û kelepura kurdî bêsekin dixebite. Gund bi gund digere û kilamên ku li ber wendabûnê ne wan berhev dike û tomar dike. Bi vî awayî arşivek baş ya kilamên kurdî çêdibe. Li gorî agahiyan Meryem Xan di seranserê jiyana xwe ya hunerî de nêzî du sed kilam strane. Lêbelê ev kilam ji ber ku amûrên radyoyê yê tomarkinê tunebûn di arşivên radyoyê de nehatine parastin. Ji bo vê yekê pir kêma kilamên wê gihaştine heta îro. Ev kilamên li ber destan jî ji aliyê hin lêkolîner an jî hunerhezan ve hatine berhevkirin. Ji bilî radyoya Bexdayê di radyoya Êrîvanê de jî deng û kilamên Meryem Xanê hatine tomarkin. Xuyaye radyoya Bexdayê û ya Êrîvanê di mûzîka kurdî de roleke sereke lîstine.

#### **2.4.1 Radyoya Bexdayê**

Radyoya Bexdayê bûye deng û zimanê hevpar ji bo çanda kurdan. Bi saya weşana wê gencîneya çandî ya milletê kurd hatiye parastin. Radyoya Bexdayê li ser daxwaza dewleta Îngilistanê di sala 1939an de hatiye damezrandin. Piştî ku tê damzrandin bi çend salan bi zimanê kurdî dest bi weşanê çandî dike. Cara pêşî heftê du rojan û rojê niv saetê dest bi weşanê dike. Li gorî peymanê ku di navbera Dewleta Iraqê û Mele Mistefa Barzanî hat îmzekirin, ev radyoya fermî dê bi tu awayî weşanê li dij biratiya kurd û ereban çêneke û dê bi piranî bernameyên çand û hunerî çêke (Mir Botan, 2009). Gelek dengbêjên navdar di Radyoya Bexdayê de hem xebitîne û hem kilam gotine. Di serî de Meryem Xan ku gelek kilam berhevkirine û gelek dengbêjên weke Mihemed Arif Cizrawî, Hesên Cizrawî, Eyşe Şan, Îsa Berwarî, Elmas Xan, Kawîs Axa û Elî Merdan di radyoya Bexdayê de kilam gotine.

#### **2.5. HUNERMENDÎYA MERYEM XANÊ**

Meryem Xan bi gelemperî kilamên bihizin ku temaya wan koçerî, xerîbî, dûrketin, jihevqetîn, xwoşewîstî, tenêtî û hesreta welêt (bêrîkirin) e straye. Ji bilî kilamên bengîtiyê kilamên şer û şûr û mêrxasî strane ku ji van kilaman re lawik tê gotin. Lawik hem kilamên li ser evîne û hem jî yê mêrxasiyê ne. Cureyekî mûzîka çolterê ye (edt.Bayrak, 2002: 157-168). Meryem Xan ji bilî kilamên dengbêjiyê

stranên rîtmîk an stranên govendî jî straye. Bi giştî dikare bê gotin ku dema Meryem Xan çî kilamên dengbêjiyê çî stranên govendî distrê hizinek li ser dengê wê tê hîskirin.

Ji ber vê yekê dema stranên rîtmîk jî dibêje ev hizin xwe dide der. Dibe ku ev, taybetmendiya herî mezin ya dengê wê be. Lewre, Meryem Xan di seranserê jiyana xwe de rastî gelek bûyerên trajîk hatiye. Tu bixwazî nexwazî qewimînên jiyana wê dê tesîrê li ser hunera wê bike ku dema meriv li dengê wê guhdarî dike diyar e ku ruhê wê bi dert û keseran kelijiyê.

Taybetmendiyeke din a Meryem Xanê ew e ku yekemîn hunermenda jin ya kurd e ku bi zaravayê kurmançî deng û stranên xwe li ser qewanan tomar kiriye. Kilama wê ya ku ewil li ser plakê hatiye qeydkirin “Domamê” ye. Kilam bi amûrên weke keman, ûd û text hatiye amadekirin. Ev kilam li ser evîna qedexe ya domam û pismam hatiye gotin. Di beşa nirxandina berhemên wê de bi berfirehî li ser kilamê hatiye rawestîn.

Meryem Xan di kilamgotinê de amûrên mûzîkê yên weke kanûn, keman, ûd û text bi kar aniyê. Lêbelê di kevneşopiya dengbêjên Serhedê de amûrên mûzîkê nayên bikaranîn. Ji tradîsyona dengbêjiya Serhedê Evdalê Zeynikê, Reso û Şakiro tu car enstrumanên mûzîkê bi kar neanîne. Her tim bi dengê tazî hunera xwe îcra kirine. Ev jî cudatiya di navbera dengbêjên Serhed û Botan de ye.

Dengê Meryem Xanê dengê nerm e. Dema kilaman dibêje bi dengê nerm, hêdî û nizim dibêje. Di kilamên wê de otantîzm, esalet heye, gewriya wê resen a kurdî ye û di kilamên wê de dengê jinên bîndest heye. Qirika wê paqij e (Gündem Kadın, 2004). Dengbêj Mihemed Arîf Cizrawî ku hevalê Meryem Xanê yê nêzîk e li ser hunermendiya wê dibêje ku dema Meryem Xan kilamên xwe digotin ji dil digot û bedena wê bi kilaman tije dibû (Gazete Karınca, 2017). Meryem Xan evîndara dengbêjiyê bû û heta dawiya emrê xwe bi hunera xwe jiya.

Meryem Xan stranên du qolî ligel Elmas Xan, Mihemed Arîfê Cizîrî, Seîd Axayê Cizîrî û Hesenê Cizîrî xwendine. Stranên du qolî ew stran in ku hunermendek

dibêje û yê din jî lê vedigêre (Oremar, 1998: 13). Meryem Xan ji bo duajoyên xwe gencîneyeke mezin û arşîveke giranbiha hişt.

## **2.6. BERHEMÊN MERYEM XANÊ**

Her çiqas di çavkaniyên derbarê jiyana Meryem Xanê de behsa 200 kilamî tê kirin ku ev kilam ji aliyê Meryem Xanê ve hatine strandin, di encama lêkolîna me de 43 kilam hatine peyda kirin ku çar kilamên mîna “Narûnê, Çûme Derya Dadayê, Yadê” tevî ku arasteyî Meryem Xanê tînin kirin me qeyda dengê wê peyda nekir. Bo vê sedemê ev her çar kilam ji pirtûka “Miryem Xan” ya Celal Mele Hesên Xoşnaw û Cengî Celal Mele Hesên ve hatine wergirtin.

Ji 43 kilamên li ber destên me ku gelekê wan kilamên gelêrî ne, ne pêkan e ku em bizanibin kîjan kilam ji aliyê Meryem Xanê ve hatine nivîsîn. Her çend ku di hin çavkaniyan de tê gotin kilamên “Mihemedo Ronî û Hêlî Delal” ji aliyê Meryem Xanê ve hatine nivîsîn jî Zeynep Yaş ji bo kilama Mihemedo Ronî dibêje ku ev kilam berî Meryem Xanê ji aliyê dengbêjekî din ve hatiye gotin (Yaş, 2019). Ji ber ku ev mijareke tevlihev e di xebata xwe de em li ser vê xalê nesekinîn.

Hatiye tespîtkirin ku ji 43 kilaman temaya 25 kilaman hizin e. Kilamên ku li dor temaya “hizin”ê analîza wan hatiye kirin 18 heb di bin sernavê “kilamên evînê” de ku zêdetir hizina evînê tê kişandin û 7 heb jî di bin sernavê “kilamên şînê” de hatine dabeşkirin ku hizina mirî tê kişandin. Kilamên ku di bin sernavê şînê de hatine dabeşkirin em dikarin wiha rêz bikin: “Bavê Wemîn, Bavê Koroxlî, Hêlî Delal, Qesra Baxemsê, Mala Faro, Lo Siwaro û Cembelî” ne.

Kilamên ku di bin sernavê evînê de hatine rêz kirin jî ev in: “Çemê Bişêrîka Şewitî, Ay Delal, Mihemedo Ronî, Wele Domam, Helîmê, Qumrîkê, Yar Gewrê, Yadê, Derdo, Bejna Zirav, Zembîlfiroş, Weyla Li Min Xerîbê, Sêva Hecî, Bêmal, Eman Sêva Min ê, Ereb Şênî, Tirsim Bimrim Dilo Heyran û kilama Te Dibînim Te Nabînim”e. Herweha ji van 25 kilamên hizinê 14 kilam çîrokên wan hatine peydakirin û li gorî van çîrokan analîza kilaman hatiye kirin. Di kilamên Meryem Xanê de ku li jor jî hatiye destnîşankirin vebêjer zêdetir jin in. Vebêjerên hemû kilamên şînê ku ji 7an pêk tînin jin in.

## **2.7. KESAYETÎYA MERYEM XANÊ**

Meryem Xan, xanimeke jixwebawer bû û li gorî ku karê berhevkirinê kiriye jineke jêhatî bû. Dema di radyoya Bexdayê de dixebitî gund bi gund geriyaye û gelek kilam berhev kirine. Ev di heman demê de kurdewariya wê jî nîşan dide. Lewre gelek kilam ji mirinê xilas kirine û gihandiye heta roja îro.

Meryem Xan girêdayî erf û edetên xwe bû. Dengbêj Mihemed Arif Cizrawî di hevpeyvîna ku daye radyoya Bexdayê de li ser kincên Meryem Xanê dibêje ku kincên Meryem Xanê modern bûn. Lê rihê wê, jiyana wê, hunera wê bi kurdî bû. Girêdayî edetên kurdî bû. Dema kilam digotin ji dil digot û bedena wê bi kilaman tije dibû (Gazete Karınca, 2017).

Dema beşdarî şahiyên dibû her tim bi kincên kurdî beşdar dibû. Bi asîlbûn û giraniya xwe her tim bal kişandiye. Ji bo vê yekê di şevbihêrkên dengbêjan de her tim ji wê re rêz hatiye girtin. Meryem Xan jineke wêrek û biryardar bû. Ji bo xeyalên xwe bi tena serê xwe di emrekî biçûk de ji welatê xwe derdikeve û diçe welatên xerîb. Li xerîbîyê ji bo hunera kurdî xizmeteke mezin daye.

Meryem Xan her her çiqas di jiyana xwe ya hunerî de gelek serkeftin bi dest xistibin jî hizinê dev jê bernedaye. Xwe her tim tenê hîs kiriye. Dema bi hevalên xwe re rûniştîye her tim behsa malbata xwe, birayên xwe û tenêtiya xwe kiriye. Ango ji vê rewşa xwe gilîdar bûye. Lêbelê heta dawiya emrê xwe Meryem Xan di nav hizinê de jiyaye.

## **2.8. MIRINA MERYEM XANÊ**

Meryem Xan, di seranserê jiyana xwe de rastî gelek bûyerên dilsoj hatine. Mirina dê û bavê wê, jihevqetîna wê û hevserê wê, dîrketina ji welatê xwe ev hemû li ser jiyana wê bandorek mezin hiştine. Piştî ku ji hevserê xwe diqete û ji malbata xwe dûr dikeve xwe her tim tenê hîs dike. Jiyana wê di nav xemgîniyê de derbas dibe. Dema bi hevalên xwe re rûniştîye tim ji jiyana dûrî Kurdistanê gilî û gazinc kiriye, ji bo bextreşîya xwe hêsir barandine, daxbara dîrketina ji bav, dayik û birayên xwe bûye. Evîndara dîtina sirûştî rengîn, çiya, deşt, gund û bajarên Kurdistanê bûye (Oreмар, 1998: 13-14).

Meryem Xan di temenekî ciwan de bi nexweşiya gurçikê dikeve. Nexweşiya wê dibe sedem ku Meryem Xan xwe ji her tiştî dûr bixe. Hevala wê û hembajariya wê Elmas Xan dibêje, di wan salên ku Meryem Xan bi nexweşiya gurçikê ketibû gelekî xemgîn bû. Bi tenê bû. Ne dixwest tu kes werin cem wê. Doktorê wê jê re digot vê hizinê ji ser xwe bavêje, kêfxweş bibe. Lêbelê wê her tim dixwest tenê be (mehmetayazblog, 2010). Meryem Xan di sala 1949an de li nexweşxaneyê Mîr Îlyas bi nexweşiya gurçikê tédikoşe. Lêbelê ew têkoşîna ku ji bo seranserê jiyana xwe da ji bo nexweşiya xwe nikare bide û li dij vê nexweşiyê têk diçe. Jiyanêke tije keser kir ku Meryem Xan di temenekî ciwan de di 45 saliya xwe de ji vê dinyayê koç bike.

Meryem Xan dema li nexweşxaneyê radizê bi doktorê xwe yê cihû re dikeve nîqaşê. Her çiqas doktorê wê jê re dibêje tenê nemîne vê hizinê ji ser xwe bavêje jî Meryem Xan naxwaze tu kes werin cem wê. Ew dixwaze her tim tenê be. Hevala wê Dengbêj Elmas Xan ku heta dawîya emrê wê ew tenê nehiştiye dibêje ku doktorê wê li ser vê nîqaşê şelmaqekê li Meryem Xanê dixê. Dirûnên emeliyata wê vedibin, xwîna wê diçe û dimire (Mendeş, 2019: 103). Mirina Meryem Xanê hevalên wê yê dengbêj û hezkiriyên wê gelekî xemgîn dike. Meryem Xan di sala 1949an de li Bexdayê bi merasîmekê li goristana Şêx Marûf tê definkirin. Dengbêj Mihemed Arîf Cizrawî, Hesên Cizrawî, Nesrîn Şêrwan, Elmas Xan, Elî Merdan û xebatkarên radyoya Bexdayê û ji nav gel jî gelek kes beşdarî merasîmê dibin.

## BEŞA SÊYEM

### BERHEMÊN MERYEM XANÊ Û TEMAYA HIZINÊ DI KILAMÊN WÊ DE

Dengbêj Meryem Xan, di kilamên xwe de zêdetir li ser hestên mirovan bi taybetî hestên jinan û pirsgirêkên jinan yên civakî rawestiyaye. Bi gelemperî di kilamên wê de em rastî temayên gerdûnî tên. Temaya hizinê di lîteratûra edebiyata cîhanê de temayeke serekeye ku hunermendan derd û kul û tengasiyên xwe û yên civaka xwe di berhemên edebî de anîne ziman. Meryem Xan jî pirsgirêk û rastiyên civaka xwe piştguh nekirine û di kilamên ku straye li ser gelek çîrokên ku dawiya wan bi hizinê bidawî bûne rawestiyaye.

Meryem Xan, weke mijar kilamên mêrxasî, xerîbî, dîrokî û evînî straye ku temayên van kilaman yên sereke mirin, tenêtî, koçkirin, bêrîkirin, evîn, negihaştin û cudabûn e. Lêbelê dikare bê gotin ku Meryem Xan piranî ji xwe re kilamên bengîtiyê hîlbijartiyê. Lewre, mijara piraniya kilamên wê evînî ye. Her kilamek wê di koka xwe de çîrokek dûr û dirêj e (Dêreşî, 1998: 62).

Helbet Meryem Xan ev kilamên ku straye bi tesadûfî ne hîlbijartiyê. Lewre dema em li serpêhatiya wê dinêrin baş tê dîtîn ku ew hest û hîsên di kilamên wê de wê bi xwe di jiyana xwe de jiyaye. Bi taybetî jî di hest û hîsên eviniyê de xuyaye ku Meryem Xan di vî warê de jineke bextreş e. Di kilama bi navê “Mihemedo Ronî” de ku tê destnîşankirin wê bi xwe avêtiye ser hezkiriyê xwe tê dîtîn ku ev evîn neçûye heta serî.

Çawa ku Seîd Dêreşî jî dibêje evîna evîndarên kurdan her dem bi encamek û dumahiyek kovanî û trajedî derbas bûye (Dêreşî, 1998: 63). Ji ber ku kilamên Meryem Xanê zêdetir ji aliyê hizinê ve bala me dikişîne me jî xwest kilamên wê di çarçoveya temaya hizinê de dahûrînin. Taybetmendiyek din ya Meryem Xanê ew e ku dengêkî bihizin li ser wê ye. Kilamên xwe çî yên rîtmîk çî yên slow dema distrê bi dengêkî hizin distrê. Ev taybetmendiyên Meryem Xanê di warê kilamên hizinê de wê ji dengbêjên din vediqetîne.

Meryem Xan ji ber ku jin e û jin jî zêdetir hestiyar in van hîsan zêdetir dide hîskirin. Bo nimûne kilama “Bavê Koroxlî” ku Dengbêj Şakiro jî straye vebêjera wê jin e. Ji ber ku vebêjera kilamê jin e hestên vebêjerê di dengê Meryem Xanê de xwe zêdetir derdixe der. Helbet kilamek ku hem ji aliyê mêr ve hem jî ji aliyê jinê ve hatibe gotin ew hestên li ser dengê wan tesîreke ji hev cuda li ser guhdaran dihêle.

Berî ku analîza kilaman li dor temaya “hizin”ê ve bê kirin hewceye ku pênaseya “hizinê” bê kirin.

### **3.1. PÊNASEYA HIZINÊ**

Bûyerên siyasî, aborî û civakî li ser derûniya mirovan bandoreke mezin dihêlin. Heta dibin sedema travmayan jî. Lewre kesên ku di bin tesîra van bûyeran de dimînin dikevin nav êş û hizineke mezin. Hemû têkiliyên xwe ji der û dora xwe qut dikin û berdewamiya vê rewşa bihizin melankoliyê pêk tîne. Melankolî tê wateya reşbînî, bêhêvî, tirs, qisawet û wendabûna hezkirina jiyanê (Uslu, 2017: 351).

Bi awayekî din dikare bê gotin ku hizina zêde dibe sedema melankoliyê. Koka têgeha hizinê erebî ye. Ji aliyê naveroka xwe ve têgeheke berfireh e. Her tiştê ku ji aliyê hestî yan jî hîsî ku mirov pê biêşe ew hizin e. Li gorî ferhenga erebî-tirkî hizin tê wateya diltengî, tiştên ku ji dest diçin an jiyîna tiştên nebaş, xem, keser û xembariyê.

Ji ber ku milletê kurd her tim bûne perçeyekî aloziya siyasî dikare bê gotin ku di civaka kurd de çandêke hizinê pêk hatiye. Ji bo vê yekê dikare bê gotin ku civaka kurd civakeke bihizin e. Lewre di hemû qadên hunerî de hesta hizinê xwe dide der.

Bi taybetî di dengbêjiyê de hizin temayek herî girîng e. Ji bo vê yekê ji dengbêjan re dertbêj jî tê gotin. Çi bûyerên dilêş qewimîne demildest kirine mijara kilamên xwe.

Her wekî ku Christian Poche dibêje mûzîka kurdî mûzîkek bicoş û hestiyar e. Mûzîkek melankolîk e (Bayrak, 2002:125). Derd û kulên civakê di nava xwe dihewîne. Li gorî gelek lêkolanan ev derd û kul bêtir ji devê jinan ve hatine gotin. Ji van lêkolanan yek jî Kendal Nezan e ku dibêje, bestekarên kilamên kurdî bêtir jin in. Ji kilamên kêfxweşiyê bêtir kilamên xemgîniyê distrên (Nezan, 1996: 13).

Christine Allison, weke sedema vî tiştî hestiyarbûna jinê nîşan dide. Jin bêtir hestiyar in. Ji ber vê sedemê di îfadekirina hestan de rola wan jî ya mêran zêdetir e. Weke çawa ku jin zêdetir zêmaran dibêjin bidengxistina derd û kulan, qisawet, tiştên wenda û hestên şînê ji mêran zêdetir karê jinan e. Mînakên mîrên ku di stranan de elem û qisawetan bilêv dikin pir kêr in (vgh.Mojab, 2013: 255). Li jêr di beşa analîza kilamên Meryem Xanê de dê bê dîtin ku di kilaman de jin rolên sereke dilîzin ku piranî êş û keser jî aliyê wan ve hatiye bilêvkirin. Di kilamên Meryem Xanê de jî ji bilî çend kilaman tê dîtin ku êş û keser zêdetir ji devê jinê ve hatiye bilêvkirin.

Ji aliyê din ve kilamên ku çî Meryem Xan bi xwe hilberandine û çî yên strane nîşan dide ku Meryem Xan xwedî derûniyêke çawa ye. Bi vê hincetê ve em ê hîn bibin ku derûniya mirov li ser edebiyatê tesîreke çawa dihêle. Li gorî vekolandina me ya li ser kilamên Meryem Xanê temayên ku herî zêde hatine bikaranîn mirin, tenêti, xerîbî, bêrikirin-hesret, koç, evîn û cudabûn in ku li jêr her yek bi berfirehî hatiye ravekirin.

### **3.1.1. Mirin**

Mirov çawa ku hatine dinyayê rojekê jî wê bimirin. Mirin perçeyekî jiyana mirovan e. Tevî ku li dij mirinê tu çare tune ye jî mirovan heta ku ji dest ji wan hatiye li dermanê nemirinê geriyane. Li gorî efsane, bîr û baweriyên di nav gel de Loqmanê Hekîm gelek dermanên şîfayê dîtine. Herî dawî jî dest bi lêgerîna dermanê nemiriyê kiriye lê dermanê ku dibîne diçe û difire.

Ev bawerî nîşan dide ku giyanê mirov ewqas pê şêrîn e û mirin jî ewqas tahl e. Ji bo vê yekê mirinê her tim hişê mirovan mijûl kiriye. Herçend ku mirin çarenûsa

mirovan e jî pejirandina wê her tim ji bo wan zor û zehmet bûye. Di berdewamiya nivîsê de em ê bibînin ku mirin bandoreke çawa li ser derûniya mirovan dike û li dij vê êş û keserê rêyên çawa ji bo xwe peyda kirine. Lewre mirov li dij mirina merîvekî xwe gelekî xemgîn dibe û dike qêrîn.

Tirsa mirinê û neçarî dibe sedem ku mirov xwe tenê hîs bike û hizinê bikişîne. Mirin hem ji aliyê psîkolojîk ve hem jî ji aliyê fîzîkî ve tesîreke mezin li ser mirovan dike. Diyardeya mirinê di gelek dîsîplînên weke edebiyat, civaknasî, derûnasî û olê de bi awayên cuda hatiye vekolîn. Lê bi taybetî di berhemên edebî û hunerî de bûye temayeke sereke.

Di edebiyata devkî ya kurdî de ji kilamên bi êş û keser re “zêmar” tê gotin. Zêmar bi gelemperî li ser serpêhatiyên miriyan, koçkirin, bêrîkirin, tenêbûn, veqetîn û karesatên weke erdhej, aştî û lehiyan tên gotin. Lêbelê di van stranan de piranî mêrxasî, bedewbûn, qencî, hêvî, bendewarî û pesnê mirî tên bilêvkirin. Ji ber ku herî zêde mirin di jiyana mirovan de cî digire zêmar zêdetir li ser miriyan tên gotin. Ji bo van kesên ku davêjin ser mirî “zêmarbêj” tê gotin ku ev kes bi awayekî melodîk davêjin ser mirî.

Yaşar Kemal ji bo zêmaran dibêje li dij mirinê berxwedaneke bibandor e û zêdetir jin zêmaran dibêjin (Kemal, 2015: 22-23). Allison dibêje ku di ritûelên şînê de tê dîtin ku kesên zêmaran dibêjin ên porê xwe diqusînin bi taybetî jin in. Herweha li Kurdistanê li ser miriyan tenê jin zêmaran dibêjin (Mojab, 2013: 248). Li gorî baweriya civakê ji ber ku jin li gorî mêran zêdetir hest û hîsên xwe derdixin der bêtir ev kilam ji aliyê wan ve tên hilberîn.

Di gelek kilamên şînê de jin roleke sereke dilîzin. Marlene Schafers diyar dike ku şîngirêdan û bilêvkirina êş û xemê karê jinan e. Çawa ku afirîner û vebêjera kilama li ser kuştina Filîtê Quto diya wî Şemê ye û afirînera zêmara li ser Silêmanê Mistê jin e ku ev jin diya wî Xatê ye (Schafers, 2016: 27) nîşan dide ku ev kilamên afirînerê wan jin in ji gelek dengbêjên weke Karapetê Xaço û Şakiro re bûne çavkanî. Kilameke din ku afirînera wê jin e kilama bi navê “Mihemed Selîm Zavakî Teze” ye ku Meryem Xan hem hilberandiye û hem bi deng xistiye.

Dengbêjan di gelek kilamên xwe yên mêrxasiyê de avêtine ser kesayetên dîrokî. Behsa qehremantî, mezinbûn, qencî û kuştin û mirina van şexsiyetan kirine. Ji bo vê yekê em dikarin van kilaman weke kilamên şînê bi nav bikin. Lewre kilamên mêrxasiyê pir caran li ser stranên şînê ava dibin ku afirînerên wan jin in. Ev jin ya dilketî, destgirtî, xwişk û diya mêrxas in ku ji zarê wan tê gotin (Gültekin, 2015: 29). Mehmet Gultekîn jî bi van tespîtên xwe zanînen li jor piştrast dike.

Di kilamên şînê de hin qalibên weke “porkurê, têlxiraf, bejn û bal, gule, birîndar, derb, wey bavo, yadê rebenê, heyfhilanîn, kuştin” û mîna van di kilamên Meryem Xanê de hatine tespîtkirin ku ev hemû taybetiyên zêmaran e. Têgehên “porkurê û nifir” ku têgehên folklorîk in hema hema di hemû kilamên şînê de cî digirin. Por ji bo jinê tiştê herî bi qîmet e ku hem nîşana nasname û hem jî nîşana zayenda jinê ye. Por di heman demê de nîşana xweşikbûna jinê ye. Ji bo vê yekê dema jin porê xwe diqusînin hem xweşikbûna wê û hem jî zayenda wê ji holê radibe. Tekin Çiftçi derbarê têgeha “porkurkirin”ê de van zanyariyan parve dike:

“Di gelek stranên ku qala şer û pevçûnên mezin dikin em li vê têgehê rast tên. Herweha ji bilî gulîbirînê di gelek stranên de jina bêçare û reben ji xwe re “porkur, rûreşê” dibêje. Dema ku em li stranên ku ev têgeh tê de derbas dibin dinihêrin, em bûyerên gelekî girîng dibînin. Her yek ji wan bi serê xwe trajedîyek e. Kîngê ku êşeke mezin çêbûye, yekî gelekî hêja hatiye kuştin, an jî tevkujiyek çêbûye, jinan porê xwe jêkirine. Porkirin, destnîşankirina şewata nava dilê jinan e” (Çiftçi, 2014: 109).

Têgehek din ku di kilaman de derbas dibe “nifir” e. Dema kesek dikeve tengasiyê yan jî bêçare be demildest serî li nifiran didin. Çimkî kesên ku nifiran dikin ji ber ku tu tişt ji destê wan nayê serî li vê rêyê didin. Helbet mêr jî nifiran dikin, lêbelê dema em guhê xwe didin kilaman tê dîtin ku nifir bêtir ji aliyê jinan ve tê kirin.

Çimkî di civaka kurd de ya ku gelekî rastî zordestiyê tê jin e. Ji bo vê yekê jin nifiran weke çekekê bi kar tînin. Jin gelek caran ji ber ku nagihêje miradê xwe yan ji ber ku hezkiriyekî wê tê kuştin yan jî weke çarenûsa Meryem Xanê ku ji ber fesadiya xelkê ji hezkiriyê xwe diqete mecbûr dimîne ku nifiran bike. Bo nimûne em dikarin nifirên bi vî rengî “De heçî navbeyna min û Mihemedê min de fesadîkî bikê de heke

mêr bê rebî nezewici, de heke jin bê rebî newelidi, de heke keç bê rebî bi ciwanîka xwe şa nebî / de erê kula Xwedê bikevî mala Bişarê Çeto Cemîlê bira pê ra”. Di analîza kilaman de ev qalibên kilamên şînê ku hatine tespîtkirin yek bi yek dê bîn ravekîrin.

### 3.1.2. Tenêtî

Li gorî pênaseya Saziya Zimanê Tirkî (bi tirkî: Türk Dil Kurumu) tenêtî; tenêmayîn, bêkesbûn û xalîbûn e. Tenêbûn hîsek wisa ye ku dema tu li mirovekî binere zû bi zû ew hîsa tenêtiyê nayê famkîrin. Lewre mirov vê hîsê di nava xwe de dijî û ne hîsek wisa ye ku bê parvekirin an bi parvekirinê kêmbibe. Ji bo vê yekê ye ku Ozdemir Asaf dibêje, “Tenêtî nayê parvekirin / Heke bê parvekirin ew nabe tenêtî-ew ne tenêti ye” (vghz. Erol, 2018: 22).

Derbarê têgeha tenêtiyê de gelek pênaseyên ji hev cuda hatine kirin. Kozaklı dibêje, tenêtî êş û elemê dide mirov û ev hîs li dij derûnî, beden û civakîbûna mirov talûkeyek e. Li gorî pênaseyeke din ku hatiye kirin tenêtî tê vê wateyê ku dema mirov ji mirovan bes bawer bike û destekê ji wan nebîne xwe dide der (vghz. Akgül, 2016: 274). Derbarê tenêtiyê de çiqas pênaseyên ji hev cuda hatibin kirin jî hêla wan a hevpar ev e ku ev hîs êş û keserek mezin dide mirov. Tenêtî ji ber ku pirsgirêka her mirovekî yan her civakekê ye hestek e gerdûnî ye. Lêbelê ji ber cudabûna rewşa civakî, aborî û çandî ya civakan sedemên tenêtiyê jî helbet ji hev cuda dibin û her civakek bi awayekî cuda dijî.

Di vê xebatê de em ê berawirdkirina civakan nekin lewre mijareke gelekî berfireh e. Lêbelê ji ber ku tenêtî hesteke gerdûnî ye û êşê dide her mirovî bi giştî em ê li ser sedem û cureyên wê rawestin. Dema têkiliya kesên ji civakê yan ji kesên qut dibe, ev dibe sedema xwebitenê hîskirina mirovan. Mirov piştî van hîsan dikevin derûniyêke wisa ku li ser rûyê erdê ji wan pê ve tu kes tunene. Jixweber û hêdî hêdî xwe ji civakê dûr dixê. Her tişt jê re biyanî tê. Weke dîwarekî dikeve navbera kesê tenê û civakê û jê tê ku ew kesên li paş dîwêr qet wî/wê fam nakin (Erol, 2018: 21).

Tenêtî hîsek wisa ye ku mirov dibêje qey hew ew tenê vê hîsê dijî. Ev rewşeke psîkoljîk e. Ji xwe tenêtî hîsek wisa ye ku zû bi zû nayê famkîrin. Divê tenêtî û bi tenaserê xwe mayîn neyê li nav hev xistin. Lewre di nav bihezaran an bi

milyonan kesî de jî mirov dibe ku xwe tenê hîs bike. Yan jî yekî ku bi tena serê xwe dijî dibe ku ji vê tenêmayînê aciz nabe heta ev dibe tercîhek be jî. Ji ber vê sedemê tenêti hîseke giyanî ye. Heta ku ew tiştê bûye sedema tenêtiyê ji holê ranebe ev hîs jî zû bi zû mirovan naterikîne.

Tenêti dikare weke “tenêtiya hîsî û tenêtiya civakî” bi du şêweyan ve bê ravekirin. Tenêtiya hîsî ew tişt e ku mirovê bi tenê nikare bi mirovên din re tu têtikiliyê dayne. Ji aliyê hîsî ve nikare nêzikî kesî bibe. Tenêtiya civakî jî kêmasiya têtikiliyên bi civakê re ye. Kesê ku tenêtiyê dijî nikare tevli civakê bibe û bi civakê re têtikiliyê dayne (Akgül, 2016: 277). Tenêtiya hîsî dikare weke têtikiliya romantîk jî bê famkrin. Lewre di kilamên Meryem Xanê yên ku temaya wan tenêti ye ku li jêr analîza wan tê kirin tenêtiya hîsî zêdetir derdikeve pêş.

Berî ku em behsa cureya tenêtiyê ya di kilamên Meryem Xanê de bikin pêşî hewceye em bizanibin ka ev hîs tesîrek çawa li ser jiyana wê kiriye. Dema em li seranserê serpehatiya Meryem Xanê dinêrin heta dawiya jiyana xwe jiyaneke bi keser jiyaye. Mirina dê û bavê wê, bextreşî û nexweşiya wê û hesreta welatê wê bûn sedem ku Meryem Xan xwe ji heval û hogirên xwe û ji civakê dûr bixe. Di vê çarçoyevê de dikare bê gotin ku Meryem Xan tenêtiya hîsî an a romantîk jiyaye ku herdu zewacên wê bi dilsojî qediyane. Ev bextreşiya wê bû sedema xwe tenê hîskirin û kambaxbûna wê.

Herweha Meryem Xan tenêtiya civakî jî jiyaye. Ji ber ku Meryem Xan di civakeke pederşahî de mezin bûbû ku li gorî kevneşopiyên vê civakê û baweriya wê ya olî kilamgotin ji bo jinê qebhetek û gunehkî mezin bû, kir ku Meryem Xan ji civakê dûr bikeve yan bê dûrxistin. Heta ev baweriyên hişk yên civakê bûn sedema jihevqetîna Meryem Xan û hevserê wê. Ji bo vê yekê Meryem Xan naçar dimîne ku koçî welatekî xerîb bike.

Meryem Xan li vî welatê xerîb di nav hîsên tenêtiyê de berhemên bêhempa hildiberîne ku îro ev berhem li ber destên me ne. Tenêti her çiqas weke nexweşiyeke derûnî be jî gelek caran dibe sedema hilberîna berhemên nû û cuda ku di mînaka Meryem Xanê de tê dîtin. Tenêtiya Meryem Xanê li ser dengê wê jî bandorek mezin hiştiye ku bûye weke reng û karaktera dengê wê. Wisa tê dîtin ku Meryem Xan

tenêtiya xwe tenê bi dengê xwe re par ve kiriye ku di her kilameke wê de çî rîtmîk çî bihizin be ev êş û kesera li ser dengê wê eşkere tê hîskirin.

Di kilamên ku Meryem Xan bi deng xistine jî tenêtiya lehengên kilaman bi herdu şeweyan hem bi awayê tenêtiya hîsî û hem jî bi awayê tenêtiya civakî xwe dide der. Ev jî nîşanî me dide ku Meryem Xan dema kilamên xwe hîlbijartine bi awayekî tesadûf ev kilam ne hatine hîlbijartin. Lewre hest û hîsên di kilamên wê de Meryem Xan hemû di seranserê jiyana xwe de jiyaye.

### **3.1.3. Xerîbî**

Bêjeya xerîbiyê ji koka “xerb”a erebî pêk hatiye. Xerîbî tê wateya biyanîtî, welatekî biyanî, cihekî xerîb û xerîb jî tê wateya kesê ku ji welatê xwe dûr ketiye (On5yirmi5.com, 2019). Di bingeha hesta xerîbiyê de dûrketina erdnîgarî heye. Kesê ku ji welatê xwe dûr dikeve bi hesretek mezin dixwaze vegere welatê xwe. Lewre mirov li welatê xerîb an cihekî xerîb qet xwe rehet û bextewar hîs nake. Ew cihê ku lê ye her tim jî bo wî cihekî biyanî ye û xwe bi tu awayî aîdê vî cihê biyanî nabîne. Weke qulingên ku ji refên xwe diqetin, weke wan bi serê xwe tenê bêgav û bêçare dimînin (Alakom, 2009: 156).

Her çiqas di bingeha têgeha xerîbiyê de dûrketina ji welêt hebe jî herweha dema ku du dilketiyên li heman welatî dijîn ji hev diqetin halê xerîbiyê peyda dibe. Ji ber vê sedemê xerîbiya ku evîndar dikişîne her tim ne xerîbiya dûrketina erdnîgarî ye.

Evîndar çiqas jî aliyê erdnîgarî nêzî dilketiya xwe be û heke nikaribe xwe bigihîne wê ev rewş jî bo wî veqetîn e, xerîbî ye. Ev rewş dibe sedem ku evîndar xwe xerîb hîs bike û êşê bikişîne. Ji ber ku li ser hemû mirovan tesîrekê dihêle xerîbî hesteke gerdûnî ye. Bi taybetî di jiyana civaka kurdan de cihekî pir girîng digire. Lewre milletê kurd di her heyameke jiyana xwe de ji ber sedemên siyasî, aborî û civakî neçar maye ku welatê xwe biterikîne. Ji bo vê yekê hesta xerîbiyê di Edebiyata Devkî ya Kurdan de cihekî mezin digire.

Dikare bê gotin ku ji temayên ku herî zêde dengbêjan di kilamên xwe de bi kar anîne yek jî temaya xerîbiyê ye. Lewre dengbêjan jî dem dem xerîbî kişandine.

Di serî de Meryem Xan, Eyşe Şan, Resoyê Gopala û Şeroyê Biro ji ber sedemên cuda cuda ji neçarî ji welatên xwe dûr ketine û hin ji wan vegeyriyane û hin jî bi wê hesreta welêt û xizmên xwe li welatê xeribiyê wefat kirine. Ji bo vê yekê welatê xeribiyê ji bo gelek kurdan bûye welatê çû-nehatê<sup>2</sup>.

Meryem Xan yek ji wan dengbêjan e ku welatê xeribiyê ji bo wê bû welatê çû-nehatê. Hêj di temenekî ciwan de ji ber şert û mercên civaka xwe neçar dimîne ku biçê welatê xerîb. Li vî welatê xerîb Meryem Xan nexweş dikeve û bi hesreta welatê xwe û hezkiriyên xwe diçe ser dilovaniya xwe.

Rohat Alakom diyar dike ku stranên xerîbiyê zêdetir ji devê jinan hatine girtin û piraniya wan li ser mêran in ku çûne xeribiyê. Ew ya çûne kar, leşkeriyê, ya sirgûn bûne, ji cih-meskenê xwe bi dûr ketine. Jinan bi alîkariya van perçeyên folklorîk xwestine ku ji wan re bibin alîkar (Alakom, 2009: 145).

Xerîbî di kilamên Meryem Xanê de temayeke girîng pêk tîne. Ji ber ku piraniya kilamên Meryem Xanê li ser evînê ne di kilamên wê de jî kesê xerîb piranî evîndar e. Dikare bê gotin ku ev kilamên xeribiyê li ser hezkiriyên ku ji hev dûr ketine hatine gotin. Meryem Xan, derûniya ew kesên ku hem xerîbiya welêt û hem jî xerîbiya ku dilketiyan kişandine bi hosteyî raxistiye ber çavan. Meryem Xan, ji ber ku wê jî derd û kulê evînê kişandiye di heman demê de bûye berdevka evîndarên dilşewat.

#### **3.1.4. Bêrîkirin/Hesret**

Hesta bêrîkirinê piştî ku mirov ew tiştê ku herî zêde jê hez dike wenda dike, peyda dibe. Dema mirov ji welatên xwe ji hezkiriyên xwe dûr dikevin an diçin xerîbiyê hîsên bêrîkirinê dibin sedema êş û keserên mezin. Hem di kilamên nûjen hem jî di kilamên klasîk yên kurdî de hîsa bêrîkirinê temayeke girîng pêk tîne.

Çimkî civaka kurd ji ber gelek sedeman rastî mişextîbûn, koç û xerîbiyê hatine. Ev qewimîn bûne sedem ku hesta bêrîkirinê di zargotina kurdan de bibe weke hesteke jêneveger. Di kilamên dengbêjiyê de bêrîkirin bi gelek awayên weke

---

<sup>2</sup> Ji pirtûka Rohat Alakom ya bi nav “Di Folklorê Kurdî de Serdestiya Jinan” hatiye wergirtin.

bêrîkirina welêt, bêrîkirina dê û bav, bêrîkirina yar û her wekî din derdikeve pêş. Ev hîs bûn sedem ku di kilaman de weke temayekê bê bikaranîn.

Lewre kilambêj an stranbêjan kesera ku ji ber vê hestê dikişandin nekarîbûn di hundirê xwe de veşêrin bi kilamkî anîn ziman. Bi vî awayî ew hesret û bêrîkirina ku ji wan re bûbû weke derd û kulekî mezin çawa be li ser derûniya wan tesîreke erênî dihişt. Dengbêj Meryem Xan jî ku li jor jî hat behskrin ji neçariyê ji welatê xwe, merivên xwe û hezkiriyên xwe dûr dikeve.

Ev êş û elema ku Meryem Xan seranserê jiyana xwe kişandiye û rewşa aborî û rewşa tenduristiya wê ku nebaş bû, hest û hîsên wê yên ji bo welatê wê bûn sedem ku temaya bêrîkirinê di kilamên wê de bibe temayeke sereke. Meryem Xan jiyaneke gelekî hîsî jiyaye.

Di kilamên Meryem Xanê de bêrîkirina welêt, bêrîkirina evîndar, bêrîkirina xizman û wekî din weke mijarên sereke ne. Ev hemû hest û hîs ji ber ku Meryem Xan di jiyana xwe de jiyaye di kilamên wê de jî derdikevin pêş. Lêbelê dikare bê gotin ku di kilamên wê de bêrîkirin zêdetir weke hesreta evîndar derdikeve pêş me.

### **3.1.5. Koç**

Koç, terkirina welat e. Koçberî ew tişt e ku dema civak an mirov ji ber sedemên siyasî, aborî, civakî ji welatekî biçin welatekî din an ji cihekî biçin cihekî din, barkirin û hîcret e (Guliyeva, 2010: 405). Her civak, her kom an her mirov ji ber sedemên cur bi cur mecbûr mane ku biçin cihekî din.

Koç di jiyana mirovan de ji wan bûyerên herî trajîk yek e. Lewre mirovan bêyî riza xwe ji neçarî ji cihê ku lê ji dayik bûne, lîstine, gerîyane terikandine. Helbet ev rewş hem li ser laşên mirovan hem jî li ser derûniya wan karîgeriyeke mezin hiştiye. Kesên koçî welatekî din kirine xwe tu carî aîdê wî welatî nedîtine. Her tim hesreta welatê xwe kişandine.

Koçkirin tenê ne dûrketin an veqetîna ji welêt e, dûrketina ji zimanê xwe, ji nirxên xwe ji erf û edetên xwe, çanda xwe, ji hezkiriyên xwe û ji bêhna welatê xwe ye. Lewre kesên koçî cihekî din dikin êdî nikarin li gorî erf û edetên xwe tevbigerin. Hînbûna çandêke din ji bo wan zor û zehmet e. Di parastina nasnameya xwe ya

civakî de rastî pirsgirêkan tên. Koçkirin tişteki ne biçûk e. Koçkirin ew tişt e ku tu têkiliya xwe ji hemû nirxên xwe qut dike.

Ji bo vê yekê mirovan li welatê ku koçkirinê xwe weke reben, bêkes û belengaz dîtine. Bêriya zimanê xwe, çanda xwe, hezkiriyên xwe kirine. Koçberî ewqas tesîr li ser mirovan hiştiye ku bûye mijara gelek çîrok û kilaman. Di van kilamên ku tije hesret in hin kes hizina ji bo welatê xwe hin kes jî ji bo dê û bavê xwe yan jî dilketiyên xwe kişandine.

Di dîroka milletê kurd de em rastî gelek koçan tên. Milletê kurd di serî de ji ber sedemên siyasî, aborî û civakî mecbûr mane ku welatê xwe biterikînin. Koçerî bûye weke şewazeke jiyana milletê kurd. Ji bo vê yekê koç di edebiyata devkî ya kurdî de bûye mijareke girîng. Bi taybetî di kilamên dengbêjan de temayeke serek e ye.

Dûrketina ji welêt yan jî ya hezkiriyan her tim bûye mijara kilamên dengbêjiyê û ev bûye birîna dengbêjan. Meryem Xan jî ji ber ku di ciwantiya xwe de ji welatê xwe koç kiriye di gelek kilam û stranên xwe de li ser vê hîsê rawestiyaye. Di gelek kilamên xwe de teswîra xwezaya welatê xwe kiriye û hesreta welatê xwe bilêv kiriye. Tê dîtî ku gelek mirov ne li cihê ku lê ji dayik bûne li cihêkî din çûne ser dilovaniya xwe. Meryem Xan jî ji wan mirovan yek e. Bi salan êş û kesera welatê xwe kişandiyê. Koçberî ji ber ku tişteki ne bi dil e sedema wê çî dibe bila bibe li dûv xwe hizineke mezin dihêle.

### **3.1.6. Evîn û Veqetîn**

Evîn tê wateya hesta bicoş ya di navbera du kesan de. Ji dema ku mirov hatine ser rûyê cîhanê hesta evînê jî bi afirandina wan xwe derxistiye der. Evîn ji bo mirovan hîseke pîroze. Lewre di nav van hîsan de hezkirin, dilsozî, dilovanî, dilgermî, fedakarî, xewn û xeyalên ku bisalan hatine parastin hene. Evîn bitenê nabe sedema guherîna hîsên mirovan herweha jiyana mirovan jî diguherîne. Kesên evîndar hemû jiyana xwe li gorî dilketiyên xwe saz dikin.

Lêbelê evîn her çiqas di nava xwe de hestên xurt yê hezkirinê dihewîne jî di heman demê de hestên bihizin, kerb û hêrsê jî dihewîne. Heke ji hezkiriyan yek bê terikandin ew hezkirina bicoş vedigere hizin û hêrsê. Ji ber vê sedemê evîn li ser

derûniya mirovan bandoreke mezin dihêle. Hesta evînê çawa ku li gorî şexsan diguhere li gorî çanda civakan jî diguhere.

Evîn hesteke wisa ye ku di her civak, çand û deman de hatiye jiyîn. Her mirov teqez di wextekî jiyana xwe de hîsa bengîtiyê jiyaye. Ji bo vê yekê mirovan ev hesta dilê xwe di stran û kilaman de bi lêv kirine. Lewre kilam ji bo bilêvkirna evînê rêbaza herî baş e. Di kilamên dengbêjiyê de temaya evînê cihekî pir girîng digire.

Dengbêjan bi taybetî evîna ku li ser axa wan nîvcomayî maye yan têkçûyî, êş û kesera ku dilketiyan kişandine kirine mijara kilamên xwe. Evîna Mem û Zîn, Siyabend û Xecê, Derwêş û Edûlê û evîna Zembîlfiroş û Xatûnê li ser axa Kurdistanê zîl dane û ji ber çewisandinên civakî û sedemên din ev evîn negihaştine heta serî.

Di dengbêjiyê de kilamên evînê piranî ji devê jinan ve hatine gotin. Jinan nalîn, qêrîn, gazî, hêvî, derd û kulên xwe di kilaman de veşartine. Lewre di civakên pedersahî de jina evîndar curet nake ku evîna xwe eşkere bike. Hemû derd û kulên xwe davêjin hundirê xwe. Ji bo vê yekê êş û kedera xwe di stranan de bilêv kirine.

Kilamên Meryem Xanê jî bêtir hest û hîsên jinên ku evîna wan têk çûyî tîne ziman. Tê dîtin ku hin faktor bûne sedem ku Meryem Xan ewqas zêde li ser bengîtiyê kilaman bistrê. Lewre Meryem Xan di seranserê jiyana xwe de di warê bengîtiyê de bêşûd û bextreşe. Bi vî awayî bûye berdevka hest û hîsên gelek jinan.

Di kilamên Meryem Xanê de evîn bi van her sê cureyan derdikeve pêş:

1. Evîna Platonîk (Xeyalî): Kesê evîndar hesta bengîtiyê di nava dilê xwe de dijî. Hezkirineke ji dûr ve û evîneke xeyalî ye. Kesê evîndar di xeyalên xwe de vê evînê dijî. Lewre di rastiyê de tu têkilî tune ye. Kesê/a evîndar ji ber ku di rastiyê de tiştekî wiha tune ye her tim bi êş û kesera vê evînê dijî. Bo vî cureyê evînê em dikarin ji kilamên Meryem Xanê kilama “Çemê Bişêrfika Şewitî” mînak bidin ku evînek bi vî rengî derbas dibe di kilamê de. Lehenga kilamê Nafya bi evîneke xeyalî dil berdaye Emînê Ehmed ku haya wî ji vê evînê tune ye.

2. Evîna Bêbersiv: Di vê evînê de kesê evîndar li dij evîna xwe bi tu awayî bersiveke erênî nabîne. Ev jî dibe sedema derûniyeke xirab. Kesê evîndar ji ber ku li dij evîna xwe bersiveke erênî nabîne dikeve nav hesta tenêtiyê. Ji aliyekî ve jî dibe sedem ku ev kes xwe bêqîmet û bêkêr bibîne. Di kilama “Zembîlfiroş” de em rastî evînek bi vî rengî tên ku lehengê kilamê Zembîlfiroş bi tu awayî bersivê nade evîna Xatûnê.

3. Evîna Nepêkan: Çewisandina civakî, bawerî, cudatiya nijadî, şert û mercên aborî, cudatiya perwerdehî û temen û wekî din gelek tiştên bi vî rengî dibin sedema evîna nepêkan (Erol&Sağır, 2017: 72). Kesên evîndar ji ber ku rastî gelek astengiyên civakî tên ev evîn ji bo wan dibe weke nexweşiyekê. Tirs û xofa negihaştinê di wan de peyda dibe. Ji bo vê yekê bi van hestên coş guh nadin gelek norm û nirxên civakê. Kilama “Qumrîkê” û kilama “Wele Domam” bo vî cureyê evînê du mînakên sereke ne.

Evîna evîndarên kurdan herdem bi encamek û dumahiyek kovanî û trajedî derbas bûye (Dêreşî, 1998: 63). Di vê çarçoveyê de evîn di kilamên Meryem Xanê de negihaştin, bêmirazî, jihevqetîn, bextreşî û neçariya evîndaran ya li dij hesta evînê ye. Lewre ji temayên sereke yên kilamên Meryem Xanê yek jî veqetîna evîndaran e.

Veqetîn her çiqas ji ber gelek sedeman be jî piranî li ser evînê ye. Ji xwe di kilamên Meryem Xanê yên dilinî de zêdetir veqetîna evîndaran hatiye bilêvkirin. Mirov di serî de mirin ji ber sedemên cur bi cur ji hezkiriyên xwe ve diqetin. Jihevqetîn ji bo evîndaran ji mirinê zehmetir e. Di dahûrîna kilamên ku temaya wan veqetîna dê bê dîtin ku li ser dilketiyan çiqas tesîr hiştiye.

### **3.2. NIRXANDIN Û ANALÎZA KILAMÊN MERYEM XANÊ**

Di nav 43 kilamên Meryem Xanê yên li ber destê me de 25 kilam hatine tespîtkirin ku temaya wan “hizin” e. Dikare bê gotin ku gelemperiya van kilaman li ser evîna trajîk e. Kilam li dor temayên weke mirin, tenêti, xerîbî, bêrîkirin-hesret, koç, evîn û veqetîn ku temayên sereke yên kilamên Meryem Xanê ne hatine analîzkirin.

Mebest ew bû ku kilam di bin van temayan de bên dabeş kirin. Lêbelê ji ber ku her kilamek di nava xwe de du-sê temayan dihevinin ne pêkan bû ku bi vî rengî bên dabeş kirin. Ji ber vê sedemê me kilam weke du sernavan kategorîze kirin. Weke kilamên şîne ku 7 kilam yê şîne ne û kilamên evîne ku 18 kilam yê evîne ne. Kilamên ku çîrokên wan hatin peydakirin li dor çîroka kilamê hatin analîzkirin lêbelê kilamên ku çîrokên wan nehatin peydakirin analîza wan li gorî gotinên kilamê hatin kirin.

Di beşa analîza kilaman de kilamên ku hatine deşîfrekirin cî girtine. Me xwest ku kilam bi tevahî li ber çavên xwîner bin. Piştî kilamê bi giştî derbarê kilamê û çîroka wê de agahî tên dayîn. Di analîzê de motîfên folklorîk yê bi hizinê re eleqedar hatine ravekirin û li dor van motîf û temayan kilam hatine nirxandin.

### **3.2.1. Kilamên Şîne**

Di vê beşê de ji kilamên Meryem Xanê yê ku weke kilamên şîne hatine dabeşkirin ku di van kilaman de zêdetir hêmanên şîne derbas dibin em ê nimûneyan bidin. Kilamên şîne ku cureyekî çanda devkî ne li ser qewimînên trajîk weke mirin, veqetîn, dûrketin, evîn û karesatên xwezayî tên gotin. Lê ev kilamên şîne bi taybetî li ser mirina lehengan hatine gotin. Bo vê sedemê di vê beşê de dê hêmanên hevpar yê şîne bên peydakirin ku hizina mirinê di kilamên Meryem Xanê de çawa hatiye ristîn. Bi tevahî 7 kilam ku yê şîne ne ji aliyê hêmanên şîne ve hatine analîzkirin. Kilama ku pêşî em ê li ser rawestî kilama “Bavê Wemîn” e

#### **3.2.1.1. Kilama Bavê Wemîn**

Lê dayê lê dayê lê dayê lê dayê lê dayê

Lê dayê lê dayê oy oy oy ax ax

Lê dayê dibê sibe ye bayekî sar e li axao

Wele Bavê Wemîn<sup>3</sup> çarneçar tê oy oy ay ay ax ax

Derbeka lédane li Bavê Wemîn

---

<sup>3</sup> Dengbêj di piraniya kilaman de weke formekê peyvan bi “w” yê didin destpêkirin. Di vê kilamê de jî navê lehengê kilamê ku Emîn e weke “Bavê Wemîn” hatiye bilêvkirin.

De weyla li min porbikurê wez ê ay ay ax

Li çardara Bavê Wemîn girêdane bi şelîtê bi melbetê

Zeraqê tavê re ber bi mal tê oy oy ax ax

De wez ê vê birînê wezîro çendî vê sibê xwîna sar tê oy oy ax

Lê dayê dibê sibe ye û axao vê sibê sibe ye

Vê sibê bayekî sira li min sar e oy oy oy ax ax

Di dengê topa cebilxane li ser sînga Bavê Wemîn

Wezîro vê sibê çarneçar e oy oy oy ax

Li çardara Bavê Wemîn girêdane bi şelîtê

Vê sibê zeraqê tavê re ber bi mala oy ax ax<sup>4</sup>

Kilam li ser kuştina bavê Emînê Perîxanê Ehmed e ku axayê eşîra Reman e. Ji aliyê cureyê edebî ve ev kilam zêmar e. Temaya wê mirin e. Vê kilamê Dengbêj Îsa Berwarî jî bi varyanteke cuda dibêje. Li gorî varyanta Meryem Xanê guhertoya Îsa Berwarî dirêjtire û derbarê kuştina Bavê Emîn de zêdetir agahî cî digirin. Kilam ji serî heta binî behsa kuştina Bavê Emîn Ehmed dike. Weke gelek zêmarên din ev kilam jî ji devê jinê hatiye gotin. Li gor agahiyên ku kurê Emînê Perîxan Huseyin Demirer dide:

“Axayê eşîra Remana Ehmedê Hecî Evdilah bi êrîşekê tê kuştin. Axayên eşîra Sînîka di eleyhê Ehmed û bavê wî Hecî Evdilah de ne. Bi bêbextî û tawanbarkirinên derew tevî leşkeran êrîşî Şikeftayê dikin ku Ehmed û rêhevalên xwe tenê li wira bûn. Tu carî bi hikûmetê re pirsgirêka wan çenebûbû. Helbet xwe radestî wan nakin û bi wan re pev diçin. Ehmedê Hecî Evdilah ku hêj 22 salî bû di encama vê pevçûnê de tê kuştin.” (Demirer, 2008: 57).

---

<sup>4</sup>Ev kilam ji vê çavkanîyê ([https://www.youtube.com/results?search\\_query=bave+emin+meryem+xan](https://www.youtube.com/results?search_query=bave+emin+meryem+xan)) hatiye guhdarîkirin û bi vî şikilî hatiye tekûzkirin.

Ehmedê Hecî Evdilah li dûv xwe du jin Eyşo û Perîxanê û sê zarokan sêwî dihêle. Çarenûsa wî û kurê wî Emîn ku ew jî bi guleyekê tê kuştin heman e (Demirer, 2008:57). Di kilama “Çemê Bişêrika Şewitî” de ku ev kilam li ser kurê wî Emîn hatiye gotin bi berfirehî dê behsa çîroka wî bê kirin. Li ser kuştina Ehmed şîn tê girêdan û ev kilama jêr tê gotin. Tê dîtî ku kilam ji devê jinê ve hatiye gotin.

Bi ihtimalek mezin kilam ji devê hevsera wî Perîxanê tê gotin. Lewre li gorî erf û edetên kurdan ji ber ku tiştêkî şerm e jin dema bangî hevserê xwe dike bi navê wî na bi navê kurê xwe weke “Bavê Emîn” bang dike. Ji ber ku Emîn kurê Perîxanê ye bi navê kurê xwe davêje ser hevserê xwe.

Kilamên ku di nava xwe de hizîne dihundirîne, bi taybetî kilamên şîne bi qalibên weke “lê dayê” dest pê dikin ku ev form temsîla êş û nalînan e. Dubareya gotina “lê dayê” em dikarin weke xwesipartin û medet xwestinê şîrove bikin. Lewre di gelek kilamên hizîne de dê weke mekanîzmeyeke xwesipartinê tê dîtî. Kilam ji serî heta binî behsa kuştina Bavê Emîn dike. Serê sibê ku hatiye kuştin û peyva “bayekî sar” bi rewşeke nexweş dikare bê têkildarkirin. Gotina xwîna sar jî îfadekrina mirina leheng e ku ev qalib ji yek qalibên stranên şîne ye.

Yek ji hêmanên ku di kilamên şîne de herî zêde tê bikaranîn hêmana “porkurê” ye. Ji vê gotinê jî diyar dibe ku vêbejera kilamê jin e. Di kilamên şîne de jin li hember rewşa mirinê porê xwe diqusînin. Porqusandinê li hember êş û nalîna mirî em dikarin weke reaksiyonekê şîrove bikin. Lewre, her çiqas por nîşaneyê xeml û xweşikbûn û nasnameya jinê be jî jin li dijî vê êşê tiştê ku herî zêde wê xweşik dike jêdike û xemgîniya xwe radixe ber çavan.

Bi îfadeya “bayekî sira li min sar” e ku îfadeyeke mecazî ye mebest ew e ku vebêjer rûyê mirinê yê sar bibîr bixe. Lewre mirin ji bo mirovan bûyereke qet nexweş e û di heman demê de hîseke tirsnaq û xemnak e. Herweha ev qalib rewşa vebêjer ku mirinê tesîreke çawa li ser derûniya wê kiriye bi awayekî zelal nîşan dide.

Qalibekî din ku bêgavî û neçariya vebêjer nîşan dide gotina “weyla li min” e. Jin kengi rastî bûyerek dilsoj hatibe û tu tişt ji dest wê nehatibe ev form hatiye bikaranîn. Di heman demê de ev gotin nîşaneyê qewimînek mezin e û

dramatîzekirina kilamê ye. Di berdewama kilamê de em rastî dubareyan tèn. Vebêjera kilamê piştî axîn û hawara xwe bi hûrgiliyan behsa çawaniya kuştina leheng dike. Ji gotinên wê em têdigihêjin ku Bavê Emîn bi guleyan hatiye kuştin.

Di kilamên bihizin de gotinên dubare ji bo dramatîzekirina bûyerê gelek caran tèn bikaranîn ku di vê kilamê de em rast tèn. Dema ku vebêjera kilamê Perîxan ducar qala çawaniya kuştina hevserê xwe dike heyfa xwe tîne ku çawa qemîş kirin ku wî bi vî awayî bikujin. Lewre leheng ji bo vebêjera kilamê kesê herî bi qîmet û qenc e ku herî zêde ew wî baş nas dike. Bi van gotinan dixwaze îfade bike ku leheng ev kuştin heq nekiriye. Di kilamê de tê dîtin ku jinek li hember kuştina hevserê xwe hestên xwe çawa bi awayekî hunerî anîye ziman. Di her gotineke jinê de êş û kesera dilê wê xwe dide der.

### **3.2.1.2. Kilama Bavê Koroxlî**

De hêê.. wez ê bi diyarî Mûşa şewitî ez ketim navî dara ax

De wez ê bi diyarî Mûşa şewitî ez ketim navî dara oy oy oy ax ax

De bejna Bavê Koroxlî bejna wî şîkan û şapikan û çîtara ay ay ax

De têlxirafekî ji Bavê Koroxlî re vê sibê wa hatî çil hezara ay ay ay ax

Perîşanê bi sê denga li Perîxanê dikir gazî

Digo xwehekê pora serê min û te bi kur bê ay ay ax

Derbeka lê dane li bavê Koroxlî ay bi sê gula li biniya çiyayê birîndar e

Ay de bavo wey bavo wey bavo wey bavo oy oy oy ax ax

De wax axao tu axa yî tu gula Mala Emer î

Ay tu çira Mala Temer î tu berxê Mala Xêlid î

Tu serkanê peya yî, ay tu berdevkê dewleta Ali Osman î

Ax de bavo wey bavo wey bavo wey bavo oy oy oy ax ax

De hê hê hê wez ê bi diyarî Mûşa şewitî diketim navî genim e ay ay ax

De hê hêê wez ê bi diyarî Mûşa şewitî diketim navî genim e oy oy ax

De dibê têlxirafekî ji Bavê Koroxlî re vê sibê û hatî wez ê nizanim çima ax

Perîşanê bi sê denga li Perîxanê fikir gazî

Digo xwehekê pora serê min û te bi kur bê ay ay ax ax

De wekî roja Bavê Koroxlî lê diqewimî

Ay li pêşiya siwarê Motka mîna serdarê Cengîz Xan disekinî

Ax de bavo wey bavo wey bavo wey bavo oy oy oy oy ax ax<sup>5</sup>

Mijara sereke ya kilamê kuştina lehengê kilamê Bavê Koroxlî ye. Temaya kilamê mirin e. Ji ber ku ji aliyê gelek dengbêjan ve bi guhertoyên cuda ve tê gotin ev kilam kilameke gelêrî ye. Dengbêj Şakiro ev kilam bi navê “Lo lo Riza” straye. Guhertoya ku Şakiro dibêje li gorî ya Meryem Xanê gelek dirêj e. Ji aliyê hîsî ve heke em berawirdkirinekê bikin di dengê Meryem Xanê de hizin zêdetir tê hîskirin. Lewre li jor jî me îfade kiribû ku vebêjerên kilaman zêdetir jin in. Ji ber vê sedemê Meryem Xan hestên vebêjera kilamê zêdetir dide hîskirin. Eyşe Şan jî ev kilam bi varyanta Meryem Xanê gotiye.

Çeşnê edebî yê kilamê zêmar e. Lewre di seranserê kilamê de behsa kuştina Bavê Koroxlî tê kirin. Vebêjera kilamê weke gelek kilamên din yên şînê jin e. Li gor hin agahiyan ji ber ku Peroya Têxut dengbêja Bavê Koroxlî ango Rizayê Xêlid bû weke ihtimalekê dibe ku afîrîner û vebêjera vê kilamê ew bi xwe be.

Li gorî salixdanên ku neviyê Koroxlî Evdilbaqî Unal dide; Rizayê Xêlid ku lehengê kilamê ye piştî ku Alayên Hemîdiyê tî avakirin di vê alayê de dibe serbaz. Piştî ku Meşrûtiyeta duyem tê îlankirin êdî ev alay tê belavkirin. Ji ber sedemekê gel û piraniya filehan giliyê Bavê Koroxlî dikin û li ser vê li bajarê Mûşe tê binçavkirin. Wê demê hejmara filehan di dewleta Osmanî de nêzî şeş milyon bûn. Nûnerê filehan

---

<sup>5</sup> Ev kilam ji arşîva taybet ya Berekat Ozmen hatiye guhdarîkirin.

patrîk diçe Mûşe kontrola girtîgeha ku Bavê Koroxlî tê de ye dike. Waliyê Mûşê ji Riza re agahiyê dişîne û dibêje were dibe ku patrîk te efû bike. Riza pêşwaziya wî nake û dema hêj di girtîgehê de ye gîzmeya wî dibin boyex dikan. Kesê ku gîzmeya Riza boyex dike fileh e û bi emrê patrîk jahrê dixê sola wî. Riza di 57 saliya xwe de di sala 1908an de diçe ser dilovaniya xwe. Qebra wî li Mûşê li hewşa mizgefta Eladîn Paşa ye. (Unal, 2018).

Du jinên Bavê Koroxlî hebûn ku yek Perîşanê û ya din jî Gulê ye. Perîşan diya Koroxli ye. Lêbelê di vê varyanta ku Meryem Xan bi deng dixê navê jina Bavê Koroxlî ji dêvla Gulê weke Perîxan derbas dibe. Em dikarin vê weke taybetiyek Meryem Xan şîrove bikin ku di gelek kilaman de guherînên mîna vê kirine.

Di kilamê de em rastî metaforan tînin. Dengbêj bi metafora “Mûşa Şewitî” dixwaze nîşan bide ku Mûş ji bo xizmên Rizayê Xêlid ku bi jahrê tê kuştin bajarekî wêran û bajarekî tije hizin e. Di piraniya kilamên xembariyê de bi taybetî di kilamên şînê de em li vê formê rast tînin. Ev form nîşaneyê neyîniya bûyeran e ku di destpêka kilaman de derbas dibe.

Piştî vê behsa têlxirafê tê kirin ku ev jî nîşaneyê xebera reş e. Lewre paşê ji gotinên vebêjer em fam dikin ku Bavê Koroxlî bi guleyekê derb xwariye û hatiye kuştin. Di zemanê berê de ji ber ku hemû ragihandin bi rêya têlxirafê dihat kirin û di heman demê de gelek xeberên nexweş bi wê dihat bihîstandin ji ber vê sedemê di kilamên xembariyê de jî weke nîşaneyê bûyerên êş û keser hatiye bikaranîn.

Kilamên ku Meryem Xanê bi deng xistine ji aliyê gotinên folklorîk ve pir dewlemend in. Têgeha “Porkurkirin”ê ku me li jor ravekirina wê kir divê kilamê de jî em dibînin. Dengbêj ji devê Perîşanê ku jina Bavê Koroxlî ye kilama xwe dibêje. Perîşanê êdî davêje ser hevserê xwe Rizayê Xêlid. Porkurkirin di kevneşopên milletê kurd de her çiqas ne weke berê ewqas zêde be jî hê jî li dûv miriyan por tê birîn. Ev tegver nîşana êşa dilê xizmên mirî ye.

Hêmaneke din ku bi hizinê têkildar e qalibê “wey bavo” ye ku bav weke mekanîzmeya xwesipartînê hatiye dîtin. Çawa ku di gelek kilaman de ji dê medet tê xwestin di vê kilamê de jî ji bav medet tê xwestin. Di civakên pederşahî de berevajî

vê bav karakterekî xurt temsîl dike. Di vir de jî vebêjer li dij êşa mirina leheng xwe dispêre bav ku bi arîkariya bav êşa nav dilê xwe kêmbike. Ev form ji wan formên ku di kilamên hizîne de herî zêde tên bikaranîn yek e.

Di kilamê de hem pesnê mîrxasiya Bavê Koroxlî û hem jî teswîra bejn û bala wî hatiye kirin. Vebêjer dixwaze bi van gotinan îfade bike ku yekî weke Bavê Koroxlî ku bi bejn û bal e heyf û xebînete ku hatiye kuştin. Heyf û xebînetê xwe bi vê gotina “De bejna Bavê Koroxlî bejna wî şîkan û şapikan û çîtara” bi lêv kiriye. Ji destpêka kilamê heta dumahîka kilamê hizîna li ser vebêjer dertê pêş.

### **3.2.1.3. Kilama Mihemed Selîm/Hêlî Delal**

Hêlî delal hêlî delal hêlî delal hêlî delal hêlî delal hêlî delal hêlî delal ax

Hêlî delal wez ê diyarî kavlê Nûrê diketim ber avê wa

De wez ê diyarî kavlê Nûrê diketim axao ber avê wa oy oy ax

De ji wê ve têtê Mihemed Selîm zavakî taze

Sê rextê biçek û pêş artaşa girêdane li bin çarê wax

De heyf û sêsed mixabîna min têtê

De çawa tovê mala Eliyê Remo qelandî ji dinê oy oy oy ax ax

De wax axao tu axa yî tu wê hena zavatiyê li destdayî

De çawa sala evê salê kuştin Mihemed Selîm zavakî taze

De buka salê li xopanê gunda da melîl mayî şewityo gundo oy oy oy ax

Hêlî delal hêlî delal hêlî delal hêlî delal hêlî delal hêlî delal hêlî delal oy oy oy ax

Hêlî delal wez ê diyarî kavlê Nûrê diketim û axao wa li wê de oy oy oy oy ax

De ji wê ve têtê Mihemed Selîm zavakî taze mehînekî şînî bozê wa li bin de

De çawa sala we vêt salê kuştin Mihemed Selîm zavakî taze

De kul û xemê vî xweşmêrî mabî li dil de wezîro oy oy oy ax <sup>6</sup>

Li gorî xebata Mendêş awazsaza vê kilamê Meryem Xan bi xwe ye. Mijara wê mirin e û kilam ji aliyê çeşnê edebî ve zêmar e. Kilam li ser kuştina mezinê eşîra Erebiya Mihemed Selîmê Eliyê Remo ve hatiye gotin. Em ji xebata Baran Mendêş têdigêhêjin ku piştî dê û bavê Meryem Xanê diçin ser dilovaniya xwe mala Eliyê Remo li wê û birayê wê xwedî derdikevin. Meryem Xan û birayê xwe yê biçûk Yehya çend salan li vê malê dimînin. Em dikarin gelek ihtimalan li ber çavan bigirin.

Meryem Xan herweha xizmeta vê malê jî kiriye. Dema hêj Meryem Xan li mala Eliyê Remo dima bûye şahidê vê bûyera dilsoj. Vebêjera vê kilamê dibe ku dayika Mihemed Selîm an xwişka wî yan jî keseke din be ku li ser çawaniya kuştina wî hatiye gotin. Meryem Xan jî ji ber ku şahidiya vê bûyerê kiriye vê kilamê ji devê wan digire û distrê.

Ev bûyer li gundê Çêlika ku navenda eşîra Erebiya ye û bi ser navçeya Kerborana Mêrdînê ve girêdayî pêk hatiye. Di sala 1920î de leşker bi ser gundê Çêlikê digirin û bi mezinên eşîra Erebiya ve pev diçin. Di encama vê pevçûnê de Mihemed Selîm tê kuştin (Mendêş, 2019: 114). Ji gotinên kilamê jî em hîn dibin ku Mihemed Selîm bi çekê ve hatiye kuştin û weke kilamên din ku çawaniya kuştina lehengan bi hûrgulî tî vegotin di vê kilamê de jî em rast tî.

Ji gotinên kilamê diyar dibe ku Mihemed Selîm dema hatiye kuştin hêj zavayekî teze ye û delaliyê ber dilê diya xwe ye. Ji xwe kilam bi du navan ku yek jê jî “Hêlî Delal” e belav bûye. Ji ber ku derbarê çîroka vê kilamê de agahiyên berfîreh nehatine bidestxistin ji atmosfer û hûnandina bûyera kilamê em xwe digihînin gelek zanyariyan. Kilam ji dengê Meryem Xanê belav bûye û gihiştîye heta roja îro.

Kilam bi dûpatkirina zavatiya lehengê kilamê Mihemed Selîm dest pê dike. Ji gotina “hêlî delal” tê famkirin ku lehengê kilamê ku hatiye kuştin hêj zavakî nû ye. Ev jî nîşaneya ciwantiya leheng e ku di temenekî gelek ciwan de hatiye kuştin. Di stranên dawetan de gotinên “hêlî can û hêlî delal” ji bo bûk û zava tî gotin.

---

<sup>6</sup>Ev kilam ji vê çavkaniyê ([https://www.youtube.com/results?search\\_query=h%C3%A4li+delal+meryem+xan](https://www.youtube.com/results?search_query=h%C3%A4li+delal+meryem+xan)) hatiye guhdarîkirin û bi vî şikilî hatiye tekûzîkirin.

Vebêjera kilamê jî bi vê gotinê dixwaze ciwantiya leheng nîşan bide ku bi vê jî ajitasyonekê çêdike. Lewre kuştina yekî ku nû bûye zava ji bo malbata wî mezintirîn êş e.

Ji xwe di berdewamiya kilamê de ji hestên vebêjera kilamê tê xuyakirin ku ev derd û kul her û her dê di dil de bimîne. Di şîngirêdana ji bo kesên ciwan de ji ber ku mirin layiqî wan nayê dîtin êş û keser zêdetir xwe dide der. Dubarekirina “zavakî teze, hena zavatiyê li dest dayî” êş û kesera dilê vebêjer radixe ber çavan.

Di gelek kilamên dengbêjiyê de îfadeyên qalibî yên mîna “wez ê diyarîka kavilê nûrê diketim” tîk bikaranîn. Bêguman kilamên ku bi gotinên mîna vê tîk destpêkirin nîşaneyê trajîkbûna çîroka kilamê ye. Vebêjer berî ku dest bi çîroka kilamê bike guhdaran ji bo vê bûyera dramatîk amade dike. Di heman demê de em dikarin vê îfadeyê weke peyitandina rasteqîna bûyerê jî şîrove bikin. Lewre vebêjer ji navenda cihê bûyerê ku çavdêriya vê qewimînê kiriye bi hûrguliyên behs dike.

Di berdewamiya kilamê de vebêjer bi “heyf û sêsed mixabînan” heyfa xwe bi kuştina Mihemed Selîm tîne ku ev qalib îfadekirina êş û hizinê ye. Bi taybetî di kilamên şînê de derbarê kuştina lehengan de tîk bikaranîn. Mihemed Selîm ji ber ku ji binamelek mezin e ku navê vê malê di kilamê de jî derbas dibe ji mala Eliyê Remo ye û axayê vê binemalê ye kuştina wî bi tu awayî nayê qebûl kirin.

Mihemed Selîm ji bo mala Eliyê Remo şexsiyeteke gelek girîng bû, lewre serokê eşîrê yê herî dawî ye. Mebest ji vê gotina vebêjer “de çawa to vê mala Eliyê Remo qelandî” ew e ku bi kuştina Mihemed Selîm ve qira mala Eliyê Remo anîne. Vebêjer dixwaze bibêje ku bi mirina Mihemed Selîm tu girîngiya mala Eliyê Remo jî namîne. Weke gelek kilamên din yên şînê di vir de jî hestên liberketin û dilşewitandinê eşkere xwe dide der.

Hêmaneke din ku di gelek kilamên êşê de dertê pêşîya me metafora “şewityo gundo” ye. Bi wateyêke mecazî vebêjer piştî kuştina leheng vî gundî weke cihekî xerabe ku êdî jiyan lê ne pêkan e teswîr dike. Bi vê re tîkildar behsa bûka nû ango hevsera leheng dike ku li vî gundê xopan (xerabe) melûl û stûxwar maye. Ji gotina

“buka salê” em dikarin vê jî fam bikin ku belkî hêj sala wan neqediya be jî. Hemû ev gotinên qalibî ku hatine hilbijartin bi êşê re têkildar in ku kilamê zêdetir ajîte dike.

Mebest ji gotina “kul û xemê vî xweşmêrî ma di dil de” Mihemed Selîm e ku bi kuştina wî hêviyên wî yên jiyane hatin şikandin. Ji ber ku hêj zavayekî teze bû negihîşt mirazê xwe. Vebêjer bi vê gotinê dixwaze diyar bike ku gelek xeyalên leheng hebûn ku ev hemû nîvco man. Nebûna zarokan, hevşanebûna bi hevsera xwe û gelek hêviyên din em dikarin weke mînak bidin. Herweha ev gotin giraniya êşa nav dilê vebêjer îfade dike. Wekî din em dikarin bêjin ku vebêjer êş û kesera vê kilamê bi taybetî bi zavabûn û ciwantiya leheng ve dide hîskirin.

### **3.2.1.4. Kilama Qesra Baxemsê**

Lê lê lê hayê lê hayê lê hayê lê hayê

Lê hayê ax lê lê lê hayê lê hayê lê hayê

Lê hayê lê lê lê lê lê lê lê ax de lê lê lê lê lê hayê oy ax

Lê lê lê hayê wez ê diyarî Baxemsa Bavê Weyob diketim

De weyla dayê rebenê û axao ji kêfa dilê min û te re wa li wê de ay ax

De erê kula Xwedê bikevî mala Bişarê Çeto Cemîlê bira pê re ax

De Eliyê Ênis qewmê çiyê ve qaymeqamê Zoqê ve

Canbêzarê deşta Mûşê ve sê bolik nezani ve çek û rima axao

Were dayê rebenê ji kêfa dilê min û te re vê sibê pê de wa dike rêçe oy ax

De erê Perîşanê bi sê denga li Perîxanê dikir gazî

Digo xwehekê pora serê min û te bi kur bê

Wele dengê Hesênê Osman li qesra Baxemsê tete

De weyla dayê rebenê û axao vê sibê mîna gamêşê hêç e ay ax

Lê lê lê hayê wez ê bi diyarî Baxemsa Bavê Weyob diketim

De weyla dayê rebenê û axao ji kêfa dilê min û te re li qilê çû ay ax

De erê kula Xwedê bikeve mala Bişarê Çeto Cemîlê bira pê re

Eliyê Ênis qewmê çiyê ve qaymeqamê Zoqê ve

Canbêzarê deşta Mûşê ve sê bolikê nezanî tevî çek û rima axao

Wele ji kêfa dilê min û te re axao vê sibê pê da wa dike rêç ax ay

Wele Perîşanê bi sê denga li Perîxanê dikir gazî

Digo xwehekê pora serê min û te bi kur bê

Wele dengê Hesênê Osman li qesra Baxemsê tête mîna gamêşê hêç e lo<sup>7</sup>

Kilama “Qesra Baxemsê” berhema herêma Xerzan e. Çeşnê edebî yê kilamê zêmar e. Lêbelê ji ber ku kilam di heman demê de behsa şerê di navbera eşîran dike ev kilam herweha kilameke mêrxasiyê ye jî. Mehmet Gultekîn ji bo kilamên bi vî rengî destnîşan dike ku kilamên mêrxasiyê pir caran li ser stranên şînê ava dibin ku afirînerên wan jin in. Jin di kilaman de wek dilketî, destgirtî, dê yan jî xwişka mêrxas diyar dibin, ango ji zarê wan tê gotin (Gültekin, 2015: 29) ku ev kilam jî ji zarê jinê hatiye girtin. Ango vebêjera vê kilamê dibe ku dê, xwişk an hevsera mêrxas be. Lê ji gotinên kilamê baş tê zanîn ku ev jin ji mala Hesênê Osman e.

Kilam ji ber ku kilameke şînê ye temaya wê mirin e. Em kilamê weke kilameke hizinê binav dikin, lewre berhem ji hêla hêmanên hevpar yên hizinê ve xwedî dewlemendiyek mezine. Ev şerê ku di navbera eşîra Elîkan ku serokê wê Hesênê Osman e û eşîra Pêncinaran ku serokê wê Bişarê Çeto ye û eşîrên wekî din ku alîkariya Bişarê Çeto kirine li gundê Baxemsê qewimiye. Li gorî salixdanên Salihê Qubînî di vî şerî de bi tevahî yazdeh kes mirine ku ji van yek kes bavê Weyop e (Qubînî, 2020). Lê em ji kilamê xwe nagihînin navê Bavê Weyop.

---

<sup>7</sup>Ev kilam ji vê çavkaniyê

([https://www.youtube.com/results?search\\_query=qesra+baxemse+meryem+xan](https://www.youtube.com/results?search_query=qesra+baxemse+meryem+xan))

hatiye guhdarîkirin.

Li gorî agahiyên ku me ji pirtûka “Filîtê Quto” ya Salihê Kevirbirî wergirt eşîra Bişarê Çeto tevî hêzên dewletê bi komê qerebalix bi ser gundê Baxemsê de digire. Li gund pevçûneke mezin dest pê dike. Bişarê Çeto bi her awayî dixwaze eşîra Elîkan biçewisîne. (Kevirbirî, 2002: 26-27). Di şer de kurê Hesênê Osman jî tê kuştin û Hesênê Osman mecbûr dimîne ku gund biterikîne. Gundê Baxemsê weke wargeh û navenda eşîra Elîkan tê binavkirin. Ango ji bo eşîra Elîkan cihekî pir girîng e.

Heke em xwe bispêrin gotinên kilamê em ê bi berfirehî bibînin ku gelek eşîr û hêzên weke Mala Eliyê Ênis, Canbêzarê Deştê Mûşê û qeymeqamê gundê Zoqê (gundekî Misircê ye) ku em fam dikin zabit û esker angê hêzên dewletê ne bi piştgiriya eşîra Bişarê Çeto êrîşî qesra Baxemsê dikin û Bavê Weyop di vê êrîşê de tê kuştin. Ev kilam li ser mêrxasekî eşîra Elîkan Bavê Weyop hatiye nivîsîn.

Kilamên şînê yan kilamên hizînê bi gelemperî bi nalînan dest pê dikin ku ev kilam jî bi nalînan “lê hayê, oy, ax” ê dest pê kiriye. Ev nalînan an baneşan di kilamên dengbêjiyê de tê vê wateyê ku dema bobelatek an karesatek mezin diqewime weke gaziyekê weke hawarekê vebêjera kilamê bûyera trajîk hatîye serê wan dide bihîstîn. Em dikarin weke bangeke neçariyê şîrove bikin. Ev ax û nalînan ku ji destpêka kilamê ve dest pê dikin heta dawiya kilamê dewam dikin ku ev kesera vebêjer bi her awayî radixe ber çavan.

Di vê kilamê de jî bi îfadeya “De weyla dayê rebenê” ve dayik weke mekanizmeya xwesipartinê dertê pêşîya me. Lewre weke ku berê jî hatibû şîrovekirin dayik tevî ku neçar, reben û bêzar e ku vebêjer bi xwe vê îfade dike, siparteka (palpişt) herî girîng e ji bo vebêjer. Weke ku li jor jî hat îfadekirin bûyerek gelekî trajîk û êşeke bêşînor heye û ev yek dike ku vebêjera kilamê ji derd û kulên xwe re li şîrîkekê bigere da ku êşa nav dilê xwe sivik bike. Ji bo vê yekê weke kesa herî nêzîk vebêjer dayika xwe dibîne ku bang li diya xwe dike.

Yek ji hêmanên ku herî zêde di kilamên hizînê de tê emilandin hêmana “nifir” e ku di vê rêza kilamê de “De erê kula xwedê bikevî mala Bişarê Çeto Cemîlê bira pê re ax” dertê pêşîya me. Nifir li dij êşên mezin ji aliyê kesên neçar bi taybetî ji aliyê jinê ve weke çekêkê tê dîtin. Heta “nifir” ji bo kesên hizindar weke amrazeke

arambûnê ya psîkolojîk jî dikare were nirxandin. Herweha ev nîfirên ku vebêjera kilamê li dij êşa nav dilê xwe bilêv dike tê wateya bêçarebûn û bêgaviya wê.

Têgeheke din ku di kilamên şînê de em rast tên têgeha “porkurê” ye ku nîşaneyê qewimîneke mezin e. Lewra por tenê di dema êşên mezin de tê jêkirin. Weke ku li jor jî hatibû ravekirin por xeml û nasnameya jinê ye ku jin zû bi zû porê xwe naqûsînin. Dema rastî bobelateke mezin weke mirina kesekî herî nêz ve tên ji xembariya xwe guliyên xwe dibirin. Ev îfade nîşaneyê mirina kesekî nêz e ku ev kes ji malbata vebêjera kilamê bi xwe ye.

### **3.2.1.5. Kilama Mala Faro**

Lê lê lê lê lê lê ax de lê lê lê lê lê lê lê oy ay ay ax

De lê lê lê lê ferman e axao ay ay ay ax

Lê lê axao dilê min î vê sibê gelekî hîn e

Ax wezîro dilê min î vê sibê gelekî hîn e ay ay ax

Wele destê peyayê Mala Faro eynelî ne

De destê peyayê de Mala Kêfir kurmancî ne ay ay ax

Wele destê peyayê Mala Faro Eynelî ne

De destê peyayê de Mala Kêfir kurmancî ne ay ay ax

De bi Xwedê heçî şerekê Mala Kêfir tê de bi û axao

Kesekî mecala xwe tinîne ay ay ay ax de lê lê

De lê lê lê lê lê lê ferman e û axao ay ay ay ax<sup>8</sup>

Kilama “Axao / Mala Faro” her çend ku kilamake mêrxasiyê be jî di bingeha xwe de kilameke şînê ye. Çeşnê edebî yê kilamê zêmar e. Temaya kilamê mirin e. Ev

---

<sup>8</sup> Ev kilam ji vê çavkaniyê

([https://www.youtube.com/results?search\\_query=mala+faro+meryem+xan](https://www.youtube.com/results?search_query=mala+faro+meryem+xan))

hatiye guhdarîkirin.

kilam jî kilameke herêma Xerzan e ku li ser şerê di navbera eşîra Elîkan û Pencînarana de ye. Esas kilam şerê di navbera Mala Dîbo ku şaxek ji eşîra Elîkan e û Mala Faro ku şaxek ji eşîra Pencînarana e dihevine. Eşîra Elîkan û eşîra Pencînarana du eşîrên mezin yê herêma Xerzan in. Ji hev gelek mêr kuştine.

Divê bê zelalkirin ku Mala Dîbo di kilamê de weke “Mala Kêfir” derbas dibe. Li gorî hin rîwayetan ev îfade ji aliyê Bişarê Çeto ve bo Mala Dîbo hatiye gotin. Her çiqas Mala Dîbo xayintî bi pismamên xwe kiribe û hevkarîya Bişarê Çeto kiribe jî Bişarê Çeto qet ji vê malbatê hez nekiriye û ev malbat weke “kêfir” bi nav kiriye. Ji ber hindê ji van zanyariyan em hîn dibin ku ev şer di navbera Mala Dîbo û Mala Faro de derbas bûye.

Di serî de divê bê gotin ku ji varyanta ku Meryem Xan distrê em xwe digihînin kêma agahiyan. Lewre kilam li gorî gelek kilamên şer û şûrê hem gelek kurt e û hem jî navên lehengan qet cî negirtine. Ji ber vê sedemê ji gotinên kilamê em fam nakin ku ev kilam li ser kîjan mêrxasê Mala Faro hatiye gotin. Dengbêj Salihê Qubînî jî vê kilamê bi varyanteke cuda dibêje. Kilam li ser kuştina mezinekî mala Faro hatiye gotin. Salihê Qubînî bi hûngulî qala kuştina mêrxasê Mala Faro dike. Varyanta Salihê Qubînî ji ya Meryem Xanê zêdetir dirêj e.

Çawa ku di piraniya kilamên şînê de tê dîtin, ev kilam jî bi temamî ji devê jinê ve hatiye gotin. Di vê kilamê de jî weke kilamên din yê hizinê ax û nalînên mîna “lê lê, ax, ay” derdikeve pêş me. Ev nalîn îfadeyên êş û xema nav dilê vebêjera kilamê ne.

Di berdewamiya kilamê de ku vebêjer vê îfadeya “axao dilê min î vê sibê gelekî hîne” bi lêv dike, me digihîne wê qenaetê ku tirs û xofek heye. Ev tirs û xof îfadeya bobelateke mezin e. Vebêjera kilamê herweha agahiya bûyerek xembar û trajîk bi me dide bihîstin ku ji gotinên kilamê xuyaye ku di vî şerî de mêrxasek hatiye kuştin.

Heke em vê kilamê û kilamên din yê hizinê ku analîza wan hat kirin berawird bikin tê dîtin ku ev kilam tevî ku kilameke hizinê ye ji aliyê hemanên hizinê ve li gorî yê din lawaz dimîne. Kilam li gorî kilamên dengbêjiyê û varyanta ku

Salihê Qubînî distrê kurt e. Lêbelê ji gotinan baş tê famkirin ku kilam li ser hizina mezinekî mala Faro ye.

### 3.2.1.6. Kilama Lo Siwaro

Lo lo siwaro de rabe Siwaro de rabe peyayo

De rabe xweşmêro de rabe mêrkujo

De rabe beranê nava hewdêyo lo lo

Lo lo Siwaro sê siwarê ji kerba dilê min û te re tene dilezîne

Hey lê Meymê rebenê dibê sê siwarê ji kerba dilê min û te re...?<sup>9</sup> dilezîne li min ê lê lê

De xwişkê de rabe ...? ji birakê xwe re bîne

Ka nîşanê va siwara çi ne lê lê Meymê rebenê lê lê

Wele dibê serê rimê wan li erdê ne binê rimê wan li hewa ne

Hespê wan boz in rimê wan qoz in

Lê lê dibê her yekî bi sê rextê çek û pêş artaşan li kêleka zirav diçikilîne

De rabe Meymê de rabe lê lê te porkurê lê lê dibê û havîn e xweş havîn e

Ev Siwarê mala bavê min o dibê havîn e xweş havîn e lê lê Meymê

Wele dibê kulîlkê gulê siwara ji kerba dilê min û te re vê sibê ...? Meymê lê lê

Wele dibê kulîlkê gulê siwara ...? li xelkê alemê vê sibê ...? li min ê<sup>10</sup>

Di navenda kilama “Lo Siwaro” de kuştina birayê Meymê heye. Ji ber vê sedemê temaya kilamê mirin e. Li gorî zanyariyên di nav gel de li aliyê Şingalê ev

<sup>9</sup> Di deşîfrasyonê de cihên ku em tenehiştine, me bi vî şikilî destnîşan kirine.

<sup>10</sup> Ev kilam ji vê çavkaniyê

([https://www.youtube.com/results?search\\_query=lo+siwaro+meryem+xan](https://www.youtube.com/results?search_query=lo+siwaro+meryem+xan))

hatiye guhdarîkirin û bi vî rengî hatiye tekûzkirin.

çîrok qewimiye. Tê rîwayetkîrin ku mêrxasekî êzdî yê bi nav Nêmetê Sêlim li dij berdêlkirina xwişka xwe Meymê derketiye. Xwişka wî Meymê bi xweşikbûn û bedewbûna xwe pir navdar bû. Li ser berdêlkirina Meymê şer derdikeve û Nêmetê Sêlim di vî şerî de tê kuştin. Nêmetê Sêlim di dema xwe de bi mêrxasiya xwe yekî navdar e ku dengbêjan kilam avêtine ser.

Dema em xwe dispêrin gotinên kilamê jî tê dîtîn ku ev kilam ji destpêkê heta dawî li ser kuştina Siwaro hatiye gotin ku em ji agahiyên di nav gel de hîn dibin ku navê lehengê kilamê Nêmetê Sêlim e. Weke taybetmendiyek kilamên Meryem Xanê ye ku bi gelemperî navên lehengên kilamê veşartîne ku di vê kilamê de jî ev taybetmendî der tê pêş.

Di kilamê de yek kes diaxive ku ev kes xwişka Siwaro Meymê ye. Xuyaye Meymê piştî kuştina birayê xwe avêtiye ser wî. Ji ber vê sedemê ev kilam kilameke şînê ye. Lewre weke kilamên din yên şînê ku analîza wan hat kirin di nava xwe de hêmanên hevpar yên kilamên şînê ango hêmanên hizîne dihundurîne. Weke taybetmendiyeke kilamên dengbêjiyê di vê kilamê de jî tê dîtîn ku vebêjera kilamê Meymê axaftineke xwebixwe dike ku di gelek cihan de bang li xwe dike. Bi bangkirina ji xwe re ya “Meymê rebenê” re xwe dike mixatabê hemû êşa kuştina birayê xwe. Lewre heke em di çarçoveya van agahiyên jorîn de ku ji aliyê gel ve hatine rîwayetkîrin binirxînin, dikare bê gotin ku Meymê xwe weke sedema kuştina birayê xwe Siwaro dibîne.

Di destpêka kilamê de Nêmetê Sêlim bi xweşmêrî, mêrkujî û mêrxasiya xwe ve tê şayesandin. Xuyaye ku mirina mêrxasekî wisa navdar nayê qebûlkirin. Têkildarî van agahiyan dikare ev kilam weke kilameke qehremanî jî bê pênasekirin. Piştî wesifandina mêrxasiya leheng digel ku Siwaro hatiye kuştin Meymê ango xwişka wî mirina wî qebûl nake û bang dike ku rabe ser xwe. Îfadeya “kerba dil” ku dubare tê bilêvkirin ravekirina êş û xema nav dilê Meymê ye.

Îfadeyeke din ku di kilamê de derbas dibe îfadeya “li min” e ku qalibên mîna vê ji aliyê dengbêj an vebêjer ve ji bo dramatîzekirina bûyerê bi taybetî tîn bikaranîn ku trajîkbûna kilamê derkeve holê. Li hember vê trajediya kuştina Siwaro xala herî

girîng qêrîna “li min” e. Lê di vê qêrînê de li dij mirinê xwesparî, qebûlkirin û bêgaviyek dertê pêş.

Qalibekî din ku Meymê ji bo belengazî û jarbûna xwe bi lêv kiriye qalibê “rebenê” ye. Ev motîf îfadeya bêçarebûna Meymê ye ku li dij kuştina birayê xwe jarbûna xwe aniye ziman. Ji vê îfadeya kilamê “Meymê rebenê” tê famkirin ku Meymê xwe spartîye xwe û mixatabê derdê xwe ango hevala dert û xemên xwe ew bi xwe ye.

Di berdewamiya kilamê de ji hêmanên hevpar yê kilamên hizinê “porkurê” tê dîtîn. Gulî di dema êşên mezin an bobelatên mezin de tîn birîn. Bi taybetî jin guliyên xwe li dûv mirina xizmên xwe yê herî nêz dibirin ku ev rîtuêl îfadeya êş û xema nav dilê wan e. Bi awayekî din dikare bê gotin ku porkurkirin kişandina hizina li dûv mirî ye. Weke kilamên din yê şînê di vê kilamê de jî “porkur” weke motîfeke sereke ya kilamên şînê dertê pêşiya me.

### **3.2.1.7. Kilama Cembelî**

De lorî lorî Cembeliyo

Ax de negrî negrî dayê bi goriyo

...?

Landika Cembelikê min e li darê biyê

Min hejandibû û bisaetê

Wez ê Cembelikê xwe yî mezin re bikim welatê jorî

Min ê Cembelikê biçûk hêlabû bi goriyo hêviya pîre dayê

De lorî lorî Cembeliyo ax Cembeliyo

Ay de negrî negrî ay dayê bi goriyo

Tu bi xêr û silamet ...? dê<sup>11</sup>

Kilama Cembelî kilameke şînê ye. Cureyê wê yê edebî zêmar e. Eyşe Şan û M. Arîf Cizrawî ev kilam bi guhertoyên cuda ve strane. Guhertoya ku Eyşe Şan distrê hem dirêjtir e hem jî zêdetir agahiyên derbarê Cembelî de cî digire. Eyşe Şan vê kilamê bi navê “Cembelî Mîrê Hekariya” distrê. Ango kilam kilameke gelêrî ye. Li ser mirina Mîrê Hekaryan Cembelî hatiye gotin. Kilam ji devê hezkiriya wî Binevşa Narîn ve hatiye girtin. Destana Cembelî Mîrê Hekaryan û Binevşa Narîn destaneke bi nav û deng e ku bûye mijara vê kilamê. Hewce ye li vira em behsa destana Cembelî û Binevş bikin da ku çîroka kilamê baş bê zanîn.

“Cembelî Mîrê Colemergê ye. Lehenga çîrokê Binevşa narîn keça Fariz Beg e. Kurapê wê Dewrêş Beg Mîrê Qerecdaxê ye û dil berdaye Binevşê. Lê Fariz Beg û 7 birayên Binevşa Narîn wê nadin Dewrêş Beg. Malbata Binevşê ji ber tirsê zilma Dewrêş Beg welatê xwe diterikînin û diçin ser axa Cembelî Colemergê. Li ser vê yekê Dewrêş Beg siwariyên xwe dişîne ser Fariz Beg û 7 kurên wî dîkuje. Li aliyê din Cembelî dema diçe şerekî li ser kaniyê Binevşa Narîn dibîne û jê hez dike. Cembelî û rîspî Remildar diçin Binevşê ji bavê wê dixwazin. Bavê Binevşê keça xwe dide Cembelî û xencerekê diyarî wî dike. Cembelî dest bi amadehiyên daweta xwe dike. Dewrêş Beg piştî ku dibîhise Binevş dane Cembelî bi ser qesra apê xwe de digire, apê xwe dîkuje û Binevşê direvîne û bi zorê pê re dizewice. Piştî vê Cembelî ji derdê evîna Binevşê bi çolan dikeve û bi salan şivantiyê dike. Rojekê rastî rîspî Remildar tê. Remildar jê re dibêje heke tu bibe xizmetkarê qesra Dewrêş tê Binevşê bibîne. Cembelî dibe xizmetkarê qesra Dewrêş. Rojekê radihêle bilûra xwe lê dixê û bi dengê bilûra wî Binevş şiyar dibe tê cem. Cembelî xwe hembêzî Binevşê dike. Lê Binevş ji ber ku wî nas nake radihêle xencera wî û wî dîkuje. Lêbelê ji xencerê fam dike ku Cembelî kuştiye. Lewre bavê wê ev xencer diyarî wî kiribû. Binevş ji kerba bi heman xencerê xwe jî dîkuje.” (isiszilan, 2013).

Dema em xwe dispêrin gotinên kilamê tê dîtin ku Binevş avêtiye ser hezkiriyê xwe Cembelî. Lêbelê di seranserê kilamê de tê dîtin ku Binevş bi kurê xwe yê biçûk bi Cembelî re derdê xwe par ve dike. Piştî ku Binevş bi Dewrêş Beg re

---

<sup>11</sup> Ev kilam ji vê çavkaniyê ([https://www.youtube.com/results?search\\_query=cembeli+meryem+xan](https://www.youtube.com/results?search_query=cembeli+meryem+xan)) hatiye guhdarîkirin û ji pirtûka bi navê *Miryem Xan* (Xoşnaw & Hesên, 2006) sûd hatiye wergirtin.

dizewice kurekî wê çêdibe û ji bo ku tu carî Cembelî ji bîr neke navê kurê xwe Cembelî datîne. Lewre bi kurê xwe hem paşeroja xwe û hem hezkiriyê xwe Cembelî bibîr tîne. Kurê xwe ji bo xwe weke teseliyekê dibîne.

Di destpêka kilamê de gotinên “lorî lorî” ku dayik bi gelemperî dema zarokên xwe dirazînin dibêjin, di vir de li ser mirî hatine gotin. Lewre di kilamên şînê de ev îfade gelek caran tê emilandin. Ango ev gotin îfadeya hizinê, bêçaretî û qêrînekê ye. Di berdewama kilamê de baneşana “ax” ku baneşaneke sereke ye di kilamên hizinê de di vê kilamê de jî dertê pêş me. Gotina “dayê bi goriyo” îfadeya fedakarî û neçariya lehenga kilamê ye. Vebêjer hemû derd û kulên xwe bi vê îfadeyê bilêv kiriye.

### **3.2.2. Kilamên Evîniyê**

Di vê beşê de dê analîza kilamên evînê li dor temaya hizinê bê kirin. Di nav kilamên Meryem Xanê de me tespît kir ku 18 kilam li ser evînê ne. Dikare bê gotin ku di kilamên Meryem Xanê de evîn bi sê cureyên weke evîna xeyalî, evîna bêbersiv û evîna nepêkan derdikeve pêş. Bo vê yekê evîn di kilamên Meryem Xanê de bi awayekî trajîk diqedin. Hezkirî bi tu awayî nagihêjin miradê xwe. Kilama ku em ê pêşî dahûrînin kilama “Çemê Bişêrîkê” ye ku bi encameke trajîk ve diqede.

#### **3.2.2.1. Kilama Çemê Bişêrîkê**

Lê lê yadê rebenê wez ê çûme çemê Bişêrîka şewitî

Ax dayê rebenê wez daketim oy gewra min tu yî lê ay ax

Oy sebra min tu yî lê de lê lê ax de lê lê ay ay ay ax

Lê lê yadê rebenê dibê xewka min tê vê sibê wez raketim way ax

Lê lê wez ê çîqa nav heval û hogirê xwe de bilind firîm

Ax dayê rebenê wez ê nizim li erdê ketim

Ay gewra min tu yî lê ay ay ax

Oy sebra min tu yî lê de lê lê ax de lê lê

Lê lê wez ê tobedara şêxê xwe me lo ax

De wez ê ji navikê bedew ez ê bejna lawikê xwe me

ax ax de lê lê ax de lê lê ay ay ay ax

Lê lê yadê rebenê keçikê dîgo wez koçer im ax

Ax dayê rebenê penîr tînim oy gewra min tu yî

Lê ay ay ay ax ay sebra min tu yî lê

De lê lê ax de lê lê ay ay ay ay

Lê lê yadê rebenê wez ê kolan bi kolan vê sibê digerînim ax

Lê lê wez ê çîqa çavê xwe digerînim nagerînim

Ax wez ê bejna bilind li nav wa bajara nabînim ax gewra min tu yî lê

Ay ay ay ax ax oy bermaliya min tu yî lê de lê lê

Ax ax de lê lê ay ay ay ay ax ax<sup>12</sup>

Ev kilam li ser evîndariyê ye. Cureyê edebî yê kilamê lîrik e. Temaya wê negihandin, bêmirazî, tenêti ye. Di gelek kilam û stranan de jin rolên sereke dilîzin û vebêjerên piraniya van kilaman in. Di vê kilamê de jî rola sereke jin dilîze ku ev kilam ji devê jinê hatiye gotin. Derd û kesera dilê xwe bi awayekî dilşewat tîne zimên.

Kilam ji serî heta dawîya wê bi gazina ji çarenûsa xwe ya keçikê dewam dike. Kilam ya herêma Xerzan e. Lehengê mêr yê kilamê Emînê Ehmed e ku ji eşîra Reman e. Li gorî salixdanên Salihê Qubînî navê lehenga jin ya kilamê jî Nafya ye ku keçeke koçer e. Di vê kilamê de hezkirina xwe ya ji bo Emînê Ehmed aniyê ziman. Ji devê dengbêj Salihê Qubînî çîroka kilamê bi vî awayî ye:

---

<sup>12</sup> Ev kilam ji arşîva taybet ya Berekat Ozmen hatiye guhdarîkirin.

“Lehengê vê kilamê Emînê Ehmed bi navekî xwe yî din Emînê Perîxanê ye. Di nav gel de weke ‘Bavê Şikrî’ jî tê nasîn. Emînê Ehmed ji gundê Kevirzo ye. Kevirzo gundekî Batmanê ye. Piştî ku birayê wî Seîdê Ehmed tê kuştin, jinbira xwe Wesîlayê li xwe mehr dike. Wesîla jineke jêhatî û mêr bû. Ji bo vê yekê mêrê ku bi Wesîlayê re dizewicîn dibûn serokê eşîrê. Wesîla jî ji eşîra Reman bû. Vebêjera kilamê keçeke ji mihacirên Serhedê ye. Navê wê Nafya ye. Bi dergistî ye. Navê dergistiyê wê jî Tewfîq e. Keçika mihacir dilê wê dikeve Emînê Ehmed. Lê haya Emînê Ehmed ji vê eşqê tune ye û çênabe jî. Keçika mihacir rojekê radihêje zêrên xwe û diçe cem dengbêjê êzidî Elîkê Mamed. Ji Elîkê Mamed re dibêje dema ku ez çûm tê vê kilamê bêje. Ango vê kilamê dengbêj Elîkê Mamed deraniye.” (Qubînî, 2020)

Derbarê jiyana Emînê Ehmed de ku di dîrokê de cihekî girîng digire hin zanyariyên din bi vî awayî ne:

“Emînê Perîxanê, di sala 1889an de li gundê Şikefta (Suçeken) ku girêdayî navenda Batmanê ye ji dayik bûye. Navê bavê wî Ehmed, navê diya wî Perîxan e. Diya wî li herêmê ji wan jinên mêr bû, ji ber vê sedemê bi navê diya xwe weke Emînê Perîxanê (Emînê Ehmed, Emînê Remanî) hatiye naskirin. Yekî esmer, dirêj, enîfireh, çavreş û birûreş bû. Ji melayê gundê xwe hînî Qur’anê bûbû û bi dengêkî xurt dixwend. Xwendin-nivîsandin û zimanê tirkî li girtîgeha Diyarbekirê ku şeş mehan tê de mabû hîn bûbû. Mêrekî çavfireh bû. Di şerê bi rûsan de Emînê Ehmed li ser daxwaza hikûmeta osmanî bi eşîra xwe tevlî artêşa Kazim Karabekir bû. Bi desteka eşîra wî artêşa rûsan têk diçe. Emînê Ehmed ji ber tawanbarkirina sûcekî di 9ê Avrêla 1933an de li Beşîriyê hat derdestkirin. Dema ji bo darizandinê ew ji Beşîriyê dibirin Garzanê (Xerzan) di dema bêhdanê de ji aliyê zabitekî ve bi çekê hat kuştin. Emînê Ehmed li Xerab Bajarî (Erzen) jiyana xwe ji dest da. Gora wî li goristana gundê Barisilê ye (Çevrimova) ku bi ser Beşîriyê ve ye.” (Batman Sonsöz, 2016).

Temamê mêrên vê malbata mezin bi kuştinê çûne. Niha lawekî pîr ê Emînê Ehmed heyê li heyatê (Taşkın & Yıldız, 2018: 17).

Ev kilam weke ku dengbêj Salihê Qubînî jî dibêje, ji devê keçeke mihacir hatiye girtin. Dengbêj ji devê keçikê bêçarebûna wê ya li hember eşqeke mezin ango qêrîna wê daye bihîstîn. Keçik hemû derdê dilê xwe bi diya xwe re par ve dike. Xwe

spartiye diya xwe. Bi gotina “yadê rebenê” bangî diya xwe dike ku diya wê jê re çareyekê bibîne. Lêbelê forma “yadê rebenê” ku di analîza kilamên jor de jî hatiye ravekirin îfadekirina bêçarebûna dayikê ye.

Nafya, her çiqas dizane ku diya wê jî ji bo vê evînê nikare çareyekê bibîne jî lê ji ber ku dê her tim weke mekanîzmeyeke xwesipartinê tê dîtin di vir de jî xwesipartineke bêçare heye. Bi taybetî di civakên pederşahî de ji ferdên malbatê ku keç herî zêde xwe nêzî wê dibîne dayik e. Lewre dayik tekane dikare wê fam bike, sirên wê veşêre û nehêle tu zirar bigihêje keça wê.

Di kilamê de qalibê “Bişêrîka şewitî” weke metaforekê hatiye bikaranîn. Ev gotin nîşaneya ew cihê ku êdî jiyan lê ne pêkan e weke wêranbûn û xerabûna wî cihî ye. Çimkî, li gorî çîroka kilamê Emînê Ehmed li Bişêrîkê hatiye kuştin û veşartin. Êdî Bişêrîkê ji bo keça mihacir ne cihê jiyînê ye. Di gelek kilam û zêmarên kurdî de ji bo bajarên ku qewimînên bi vî awayî dilşewat pêk hatine ev gotinên mecazî hatine bikaranîn. Di kilama bi navê “Ereba Min” ya Huseynê Farê de metaforek bi vî awayî hatiye bikaranîn “Berê mi daye sûra bedena Diyarbekira şewitî” (Meretowar, 2017: 86).

Di kilama “Rabe Rabe” ya Reso de jî ji bo Mûradê heman metafor hatiye bikaranîn. “Bihar e Mûrada şewitî lemeleme” (Beğik, 2018: 176). Di zêmareke gundê Heremhedat a Mêrdînê de jî ji bo Diyarbekirê ev wateya mecazî hatiye bikaranîn. “Ez ê bi Carbekira (Diyarbekir) şewitî ketim, ne tu war e / bi ruyê germ e, bi şevê sar e.” (Koçhan, 2019).

Hêmaneke din ku di kilamên bihizin de derbas dibe hêmana “koçer” e. Lehenga kilamê keçeke koçer e li xerîbiyê ye. Yanê hem êşa evînê hem jî êşa xerîbiyê keçik xistiye hizineke mezin. Di bangkirina li diya xwe de tenêtiya wê, jarbûna wê û êşa welatê xerîbiyê tê xuyakirin. Keça koçer Nafya bi gotina “oy sebra min tu yî lê” diya xwe her tim weke sebra dilê xwe dîtiye û ew kiriye şîrîka derdê xwe.

Ji gotinên vebêjera kilamê Nafyayê tê famkirin ku ev evîn evîneke platonîk e. Hezkirineke ji dûr ve ye. Lewre ev eşq tenê ji aliyê Nafyayê tê bilêvkirin ku bersiva

vê evînê bi tu awayî di kilamê de nayê dîtin. Ji destpêka kilamê heta dawiya wê tê dîtin ku Nafya hem ji aliyê hestî ve hem jî ji aliyê fizîkî ve xwe tenê hîs dike. Ji bo vê yekê heta ji dest hatiye li dûv evîna xwe çûye ku ev gotinên kilamê “wez ê kolan bi kolan vê sibê digerînim / wez ê çîqa çavê xwe digerînim nagerînim / wez ê bejna bilind li nav wa bajara nabînim” nîşaneyê têkoşîna ji bo evîna xwe ya Nafyayê ye.

Ji atmosfer û gotinên kilamê em têdigihêjin ku ev evîn bi bêmiraziyê encam dibe. Lewre ji her gotineke lehenga jin xembarî, hizin û êşa dil xwe dide der.

### **3.2.2.2. Kilama Ay Delal**

Ey delal delalo delalo delalo delal ay ay ax

Ay delalo delal de rabe emrê dilê min bi gorî

Sebra dilê min bê te nayê delalo ax

Ey delal siwarê me siwar bûyîne

Berê xwe dane walê Rojhileta

Pêşiya selebê siwara danîbû qûna çiyayê Evdilezîz

Paşiya selebê siwara danîbû qûna girê Ketketa ax

De erê xwezî ji xêra Xwedê ra wez ê bibîma baxekî gulan û rihana

Wez ê biketama destê lawikê xwe de

De wez ê rojê sê cara badim xeta simbêla reş de

De lawik destê min berde

Zikak û kolanê gundê me teng û tarî ne

Şeytan û ewanê gundê me gelek in

De dibê hinek ...? ta agirek biba ay deyne ser halê min û te da delalo ax

Ey lê delal heçiyê ciwabekî ya xêrê

Ji kenarî delalê mala bavê mi de ji min re bîne ax

De wez ê bidimê ciwanîka li ber mehînê heke pê qayil nebe

Wez ê bidemê sed û bîst kîsê zêr û zinetê malê dinê

De heke bi wê jî qayil nebê wez ê bidemê sê biskê min a dinê<sup>13</sup>

Kilama “Ay Delal” kilameke dilinî ye û temaya wê negihaştine. Kilam ji aliyê cureyê edebî ve lîrik e. Di vê kilamê de jî weke kilamên din yên Meryem Xanê tê dîtîn ku vebêjer jin e. Kilam ji dêvê jinê ve hatiye gotin. Lêbelê çi navê jinê û çi navê mêr digel ku lehengên kilamê ne, ne eşkere ne. Ev weke taybetmendiyek kilamên Meryem Xanê derdikeve pêşiya me. Lêbelê di navenda kilamê de evîneke xurt ya vebêjera kilamê xwe dide der.

Lehenga kilamê bi “Ay delal” bang li hezkiriyê xwe dike ku delal temsîla xweşikbûn, qeşengbûn, hêjabûn, delalîbûn, bêqusûrî, xoşewistî û gotinên mîna van e. Ango navê delal di wateya hemû tiştên xweş de tê bikaranîn. Ji ber vê sedemê di kilamên bengîtiyê de çi mêr çi jin ji bo hezkiriyê /a xwe sîfatên wiha diemilînin ku ev sîfat nîşaneyê taybetmendiyeke xusûsî ya hezkiriyên wan e. Gotinên wisa taybet di heman demê de nîşaneyê evîneke bihêz e.

Ji îfadeya “emrê dilê min bi gorî” ku vebêjer ji bo dilketiyê xwe tîne ziman me digihîne vê baweriyê ku astengiyek li ber gihastina wan heye ku lehenga jin ji bo vê gihastinê emrê xwe dike qurbana hezkiriyê xwe. Ev îfade herweha nîşaneyê êş û kesera nav dilê lehenga jin e. Hebûna hezkiriyê xwe weke sedema şabûna xwe dibîne. Herweha ev îfade nîşaneyê fedakarî, wefadarî û dilsoziya lehenga kilamê ye.

Yek ji gotinên ku herî zêde di kilamên bengîtiyê de tê emilandin îfadeya “sebra dilê min bê te nayê” ye ku îfadeyeke hizinê ye. Vebêjer bi vê gotinê hesret û bêrikirina ji bo dilketiyê xwe tîne ziman. Herweha em ji vê îfadeyê têdigihêjin ku lehenga kilamê keçik ji dilketiyê xwe dûr e. Lêbelê divê bê gotin ku ji gotinên kilamê em xwe nagihînin wê encamê ku ev negihaştin ji ber çi sedemê ye.

---

<sup>13</sup> Ev kilam ji arşîva Berekat Ozmen hatiye guhdarîkirin.

Di berdewamiya kilamê de tê dîtin ku ev hesret her ku diçe zêdetir dibe û vebêjer xeyalan dike ku nêz dilketiyê xwe bibe. Lêbelê piştî xeyalên ku dike, dikeve nav tirs û xofekê ku hin kesên fesad bibin sedema negihaştina wê û dilketiyê wê. Gotinên “şeytan û ewan” ew gotin in ku di kilamên bengîtiyê astengiya herî mezin a li ber hezkiriyên e. Çawa ku em ji çîroka Mem û Zîn zanin ku astengiya herî mezin ya li ber evîna wan Bekoyê Ewan bû, di kilamên bi vî rengî de ev îfadeya “ewan” pir tê emilandin.

Ji gotinên dawî yê kilamê tê dîtin ku her çiqas keçik û hezkiriyê xwe ji hev dûr bin û negihaştibin hev jî hêviyek xwe dide der ku bigihêjin hevdu. Lewre vebêjer ji bo ku “ciwabekî ya xêrê” ji hezkiriyê wê jê re bînin sê tiştan qewl dike. Lê ji van her sê qewlên wê ya ku herî zêde balê dikişîne “sê biskê” wê ne ku ev di heman demê de mehremiyeta jinê ye. Lewre por an bisk tiştê herî bi qîmet, veşartî yê jinê ne ku her kes nikare bibe xwediyê wan. Lêbelê ev hesret û êşa nav dilê leheng dike ku tiştê xwe yê herî bi qîmet ji bo dilketiyê xwe feda bike.

### **3.2.2.3. Kilama Mihemedo Ronî**

De loy loy loy loy loy loy loy ax de loy loy

Ax de loy loy de loy loy Mihemedo Ronî loy loy ax ax

De loy loy Mihemedo Ronî mi çi got û tu xeyidî

De giyyayê mêrga min û Mihemedê mi seridî

De heçî navbeyna min û Mihemedê min de fesadîkî bikê

De heke mêr bi rebî nezewici

De heke jin bi rebî newelidi

De heke keç bi Rebî bi ciwanîka xwe şa nebî

Ax de loy loy de loy loy Mihemedo Ronî loy loy ax

De loy loy Mihemedo Ronî

Ciwanîka Mihemedê min î çal a

De her çar lingê wî bê nal û bê bizmar e

Wez ê bazinê destê xwe bişkînim

De wez ê ciwanîka Mihemed derdûkê min nal û bizmar e

De wez ê pora serê xwe biqusînim

Wez ê ciwanîka Mihemed derdûkê min dest hefsar e (...?)

De wekî lawikê min çû û hate xerîbiyê

Da kesek nebêje çi kurekî bêpergal e

Loy loy loy loy loy loy loy loy loy loy

Ax de loy loy loy loy loy loy loy loy loy loy

De loy loy Mihemedo Ronî loy<sup>14</sup>

Kilam ji aliyê cureyê xwe ve kilameke evînî ye. Temaya wê jihevqetîn e. Li gorî agahiyên ku me derbarê Meryem Xanê de berhev kirine dibe ku Meryem Xan ev kilam li ser evîna xwe strabe. Li gor îdfayekê ku di beşa jiyana wê de me qal kiriye Mihemedo Ronî hevserê Meryem Xanê ye û ji ber nelihvkirina li ser stranbêjiya wê hevdu berdane. Meryem Xanê jî bi derd û keser ev kilam avêtiye ser hezkiriyê xwe.

Lêbelê kilam ji aliyê kê ve hatibe nivîsin ku derbarê vê de agahiyeke teqez li ber destan tune, kilameke trajîk e û li ser evîndariyê ye. Gotinên kilamê ji devê lehenga kilamê ya jin ve hatine rêzkirin. Kilam di nava xwe de gelek hêmanên hizinê dihundirîne ku dê li jêr yek bi yek bîn îzahkirin.

Lêbelê her çiqas zanyariyên teqez li ber destên me tunebin ku ev kilam ji aliyê Meryem Xanê ve li ser hevserê wê an hezkiriyê wê ve hatiye nivîsîn jî, ji ber ku Meryem Xanê jî ji hevserê xwe ve qetiyaye hest û hîsên wê bi awayekî xurt dertên pêş. Gelek kilamên bi vî rengî hene ku jinan avêtine ser hezkiriyên xwe. Ji bo vê

---

<sup>14</sup> Ev kilam ji arşîva Berekat Ozmen hatiye guhdarîkirin.

yekê em dikarin kilamê weke zêmarekê jî binirxînin. Lewre gelek zêmar li ser veqetînan hatine avakirin.

Lê em bawer dikin ku ji hûnandina çîroka kilamê û ji gotinên ku di kilamê de hatine rêzkirin em ê xwe bigihênin gelek hûrguliyên. Lewre her gotineke kilamê me digihîne gelek zanyariyan ku ev kilam derbarê veqetîna du hezkiriyan de ye. Vebêjera kilamê ku jin e hemî sedemên veqetîna xwe û hezkiriyê xwe di kilamê de rêz kirine.

Evîndar bi vê risteya “De giyayê mêrga li mi û Mihemedê mi seridî” de ew gihayên ku di dawiya demsalê de hişk dibin û êdî diseridin şibandiye jihevqetîna xwe û hezkiriyê xwe. Di heman demê de gihayên ku diseridin êdî digihêje dawiya emrê xwe ango nêzî jihevqetîna yan jî mirinê ye. Bi vê îfadeya hunerî vebêjer jihevqetîna ji hezkiriyê xwe tîne ziman ku bi vê îfadeyê em têdigêjin ku ev evîn bi dawî bûye ku ev jî keserê bi xwe re tîne.

Jixwe îfadeyên weke “ax, de loy loy” nîşaneyên bûyereke xembar in ku di seranserê kilamê de evîndar êş û nalîna xwe bi van tîne ziman. Ji gotinên kilamê xuya dibe ku rêveqetîna lehenga jin û hezkiriyê wê bi gotina wê ji ber “fesadî”ya millet e. Xuyaye ku lehenga jin ji evîndarê xwe gelekî hez kiriye. Lê, rê li ber fesadiya gel negirtiye û gazinên xwe bi gotinên “min çî got ku tu ji min xeyidî yî” li Mihemedo Ronî dike. Xuyaye ku veqetîna yekalî ye.

Di kilamên dengbêjiyê yên evîniyê de ‘fesad, fesadî’ ji bo wan kesên ku navbera hezkiran û evîndaran xera dikin tê bikaranîn. Heke yek bûbe sedema jihevqetîna evîndaran di kilamên dengbêjiyê de nifirên resen ku ji aliyê edebî ve gelekî xurt in tên kirin. Têgeha “nifir”ê bi gelemperî di kilamên şînê de weke hêmaneke sereke tê bikaranîn.

Lê di kilamên dilinî de jî heke yek bûbe sedema veqetîna hezkiriyan ev hêman dertê pêşiya me. Dema kesek dikeve tengasiyê yan jî bêçare be demildest serî li nifiran didin. Çimkî kesên ku nifiran dikin ji ber ku tu tişt ji destê wan nayê serî li vê rêyê didin. Lê dema em guhê xwe didin kilaman tê dîtîn ku nifir bêtir ji aliyê jinan ve tên kirin. Çimkî di civaka kurdî de ya ku gelekî rastî tade û zordestiyê tê jin e. Ji

bo vê yekê jin nifiran weke çekekê bi kar tînin. Vebêjer jana dilê xwe bi van nifirên ku dike nîşan dide.

Di vir de tê xuyakirin ku dilê vebêjera jin ji bo veqetîna wê û hezkiriyê wê çiqas dişewite. Hemû jan û kesera dilê xwe di vê kilamê de daye der. Wekî din di kilamê de motîfeke din ya folklorîk cî digire ku hêmaneke sereke ya kilama hizinê ye. Îfadeya “porqusandin” ê di kilaman de nîşana karesatên mezin e. Bi taybetî dema yek dimire por tê qusandin. Lê xuyaye ku ev veqetîn ji bo lehenga jin weke mirinê ye ku dibêje ez ê porê xwe jê bikim. Ev gotin îfadeya êş û kesera nav dilê evîndar e.

Jihevqetandina bazinan jî dikare bi vî awayî bê şîrovekirin ku êdî vegera bihevrebûnê ne pêkan e. Êdî hemû hêvî şikestine. Motîfa “xerîbiyê” di gelek kilamên kurdî de cihekî mezin digire. Ji tiştên ku herî zêde mirov pê diêşe yek jî xerîbî ye. Di kilamê de evîndar ji bo hezkiriyê xwe îfadeya “de wekî çû û hate xerîbiyê” bi kar tîne.

Em dizanin ku hesta xerîbiyê mirovan dixê çî rewşê. Lêbelê lehenga jin xerîbiyê ji xwe re weke teseliyekê dibîne. Xweziya xwe pê tîne ku hezkiriyê wê çûbe xerîbiyê. Lewre xerîbî her çiqas dûrketineke dilşewat be jî ji ber ku her tim hêviya vegera kesê li xerîbiyê heye di vir de dibe teseliyeke mezin ji bo evîndar.

#### **3.2.2.4. Kilama Helîmê**

Lê lê were were were were lê wer Helîmê

Lê lê keçikê dînê rebenê te kiras qazê lê doreşînê

Lê lê kubarê dînê dibê li xelkê tahl e lê li mi şêrînî

De were were lê wer Helîmê

Lê lê Helîm reben wez wa nakim lê wez wa nakim

Lê lê wez ê kirasê melesî kitan lê li xwe nakim

Lo lo mîro dibê serê Sîpanê Xelatê berf û bager e

Ax lê wedar nakim ax ax

De were were lê wer Helîmê

Lê lê were were were lê wer Helîmê

Oy keçikê dînê dibê te kiras qazê lê doreşînê

Ay dayê rebenê li xelkê tahl e lê li mi şêrîni

Lê lê Helîm reben li taxa jorî lê tenûr dada

Lê lê Helîm reben li taxa navî lê rihan avda

Lê lê rebê alemê miradê min û Helîma min ê hasil bike nav doşek û lihêfê

Ax lê qedîfe de, de were were lê wer Helîmê<sup>15</sup>

Kilama Helîmê ji aliyê cureyê edebî ve kilameke dilînî ye. Li ser negihaştina du hezkiriyên hatiye gotin. Vebêjerê kilamê yê sereke dilketiyê Helîmê ye. Lêbelê hin caran Helîmê dibe vebêjera kilamê. Berevajî kilamên din yên evînê ku piranî vebejerên wan jin in, di vê kilamê de vebêjer kur e. Hezkirina xwe ya ji bo Helîmê aniye ziman. Ev kilam ji aliyê gelek dengbêj û stranbêjên weke Mihemed Arif Cizrawî û Eysa Şan û Şakiro ve bi varyantên cuda hatiye bidengxistin. Lê mijara sereke ya çîroka kilamê hezkirina du evîndaran e.

Li gorî agahiyên ku di nav gel de berbelav e, lehenga jin ya kilamê Helîmê keçeke 13 salî ye û ji herêma Cizîra Botan e. Ji gundê wan kurekî cotkar jê hez dike. Lêbelê malbata herdu hezkiriyên li dij zewaca wan derdikeve û vê bihevrebûnê napejirîne. Li ser vê yekê kurik Helîmê direvîne gundê Girka Mehmê Emo. Birayê Mehmê Emo Êzêr vê revandinê napejirîne û keçikê teslîmî dê û bavê wê dike.

Wê demê jî li Cizîra Botan di navbera kurd û Osmanîyan de şerekî mezin dest pê kiribû. Di encama vî şerî de bi hezaran kurd tîr girtin û kuştin. Mehmê Emo û birayê wî Êzêr li zindanê tîr girtin û paşê tîr kuştin. Hezkiriyê Helîmê jî birîndar dibe û tê mişextî kirin. Di dema ku tê sirgûnkirin vê kilama xemginiyê davêje ser

---

<sup>15</sup> Ev kilam ji arşîva Berekat Ozmen hatiye guhdarîkirin.

dilketiya xwe Helîmê. Di her gotineke kilamê de hesret, hezkirin, bêçarebûn û gaziya vebêjer dertê pêşiya me.

Kilam bi gaziya evîndar ve dest pê dike ku ev forma “were were Helîmê” hesreta nav dilê vebêjer nîşan dide. Xuyaye ku leheng û Helîmê ji hev dûr ketine û ev dûrketin êşek mezin xistiye nav dilê wî. Ev qalib herweha îfadekirina bêfêkirin, bêçarebûn û evîneke jênevegere. Lewre ev evîn bûye weke nexweşiyêke bêderman ku tenê dermanê dilê vebêjer Helîmê ye.

Di dewama kilamê de îfadeya “keçikê dînê rebenê” dertê pêş. Evîndar jî dizane ku tu tişt ji destê dilketiya wî nayê. Lewre têgeha “reben” ku di kilamên xembariyê de piranî ji bo dayikê tê bikaranîn îfadekirina bêçarebûna jinê ye. Em jî çîroka kilamê dizanin ku ev bûyer di civakeke pederşahî de qewimiye.

Di civakên wiha xwedî rêzikên hişk de ku evîndariya keçan her tim şerm hatiye dîtin helbet keç nikare ji bo hezkiriyê xwe têbikoşe. Vebêjer her çiqas ku di destpêka kilamê de bangî Helîmê dike jî bi gotina rebenê dizane ku ev gaziya wî dê bêbersiv bimîne. Gotinên “kiras qazê û lê kubarê” ku hêmanên sereke yên kilamên evînê ne îfadeya xweşikbûna lehenga jin in.

Lewre di dewama kilamê de evîndar bi gotina “li xelkê tahlê lê li mi şêrîni” dixwaze hezkirina xwe îfade bike. Ev gotin evîna Mecnûn ya ji bo Leylayê bibîr dixê ku Leyla keçike pir jar û nexweşik bû. Lêbelê bi çavên Mecnûn Leyla jina herî xweşik bû ji bo wî. Çimkî bi evîneke ku nayê gotin jê hez dikir. Ji vê hêlê ve em dikarin evîna evîndar bişibînin ya Mecnûn.

Gotina “serê Sîpanê Xelatê berf û bagere” ku ji aliyê Helîmê ve tê bilêvkirin îfadekirina nepêkanbûna evîna wan e. Lewre jî gotina berf û bagerê em fam dikin ku astengiyêke mezin li ber evîna wan heye. Helîmê di heman demê de bêçarebûna xwe ya li dij van astengiyên tîne ziman. Li ser vê gotinê hezkiriyê Helîmê bi gotina “ax lê wedar nakim” diyar dike ku li dij vê êş û elema dil taqeta wî nemaye.

Di berdewamiya kilamê de leheng hezkiriyê xwe xeyal dike ku geh tenûr dadida geh rihan av dida. Ewqas bihesret bêriya hezkiriyê xwe kiriye ku di xeyalên xwe de wê bibîr dixê. Di dawiya kilamê de em dibînin ku tevî hemû nerênîyan

leheng hêviyên xwe qut nake û bi vê îfadeya “rebê alemê miradê min û Helîma min ê hasil bike nav doşek û lihêfê” ji Xwedê lava dike ku bigihêje mirazê xwe. Lê ji çîroka kilamê tê famkirin ku ev evîn jî weke gelek evînên din bi dûmahîkek trajîk ve encam bûye.

### **3.2.2.5. Kilama Wele Domam**

Wele domam wele domam wele domam wele domam wele domam

Ax ax wele domam dibê kulîlka hemî zûma ax

Lê lê domam dibê heçî derdê evînîkê dîtî ax

Ay ji min û domama min nekin çî gazindan û çî loma ax

Ax de domamê domamê domamê ay ay ax ax

Ay zerî kubarê wez bi xulamê oy oy oy ax ax

Wele domam ava şetê me şerbet e domam ava şetê me şerbet e ay ax

Pêla navî li hev dikete ax

Lê lê domam dibê evînîka xelkê alemê adet bû

Lê lê ya min û domama min li Cizîra Bota bûye çî qebhet e

Ay de domamê domamê domamê ay ay ay ax ax

Ay zerî kubarê wez bi xulamê ay ay ax ax

Wele domam ava şetê me heşîn e domam

Ava şetê me heşîn e ay ax pêla navî har û dîn e

Lê lê wez ê werim domama xwe ji mamê xwe bixwazim

Lê lê bi Xwedê heke mamê min domama min nede min

Wez ê çemilê domama xwe bigirim birevînîm ser çemê xanekê re biqulipînîm

Ay de domamê domamê domamê oy oy oy ax

Wele domam wele domam navê domama min Gulsin e

Domam navê domama min ax Gulsin e

Tava heyvê derketî û avêtî Cizîra Bota serûbin e ay ay ax

Wez ê werim domama xwe ji mamê xwe bixwazim

Lê lê bi Xwedê heke mamê min domama min nede min

Wez ê bêjim bi xwedê mamo tu qatilê serê min î

Ay de domamê domamê domamê domamê oy oy ax ax

Ay de domamê domamê domamê oy oy ax ax

Ay zerî kubarê wez bi xulamê oy oy ax ax

Wele domam wez nizanim navê domama min ê çi ye

Domam wez nizanim navê domama min ê çi ye

Bejna domama min zirav e mîna şerabekî çiyayê Şingalê û êzidiya

Wez ê werim domama xwe ji mamê xwe bixwazim

Lê lê bi Xwedê heke mamê min domama min nede min ax

Wez ê çemilê domama xwe bigirim birevînim

Bavêjim ser hidûdê îngiliziya ax

Ay de domamê domamê domamê ax ax

Ay de domamê domamê domamê ax ax

Ay zerî kubarê wez bi xulamê ax ax<sup>16</sup>

Kilam ji aliyê cureyê edebî ve kilameke evînî ye. Temaya wê negihaştine. Behsa çîroka evîna Gulsin û pismamê wê ya qedexe dike. Çîroka kilamê li Cizîra Botan qewimiye. Ji kilamê xuyaye ku evîna pismam û dotmamê bi tu awayî nayê qebûlkin. Ji kilamê em ténagihên ku çima ap keça xwe nade pismamê wê. Lê em dikarin vê rewşê weke rewşeke malbatî şîrove bikin ku dibe herdu malbat neyarê hev bin an kêfa wan ji hev re nayê û her wekî din.

Wekî din em dikarin vê evînê weke evîna di navbera du ciwanên êzdî de jî şîrove bikin. Lewre pismam bejna hezkiriya xwe dişibîne şeraba çiyayê Şingalê. Ev şibandin bi awayekî vê baweriya me piştras dike. Weke li jor jî me got qedexeya vê evînê ne ji ber sedemeke erf û edetî ye. Lewre ne li gorî erf û edetên kurdên misilmanan û ne jî li gor kurdên êzdî evîna pismam û dotmam ne qedexe ye. Berevajî vê zewacên êzdiyan û qismek kurdên misilman endogamîk e (navxweyî). Heta li gorî baweriya êzdiyan bi kesên ne êzdî re ango ji oleke din bi tu awayî zewac nepêkan e.

Her çiqas kilam li ser evîna du kesan hatibe hûnandin jî evîna welat jî bi awayekî xurt xwe dide der. Lewre di gelek risteyên kilamê de Meryem Xan ji devê pismam behsa xwezaya Cizîra Botan dike. Dikare bê gotin ku Meryem Xan hestên xwe yên li ser evîna welatê xwe ji devê lehengê kilamê tîne ziman. Ev jî nîşan dide ku Meryem Xan bi giyanê xwe çiqas girêdayî welatê xwe ye.

Kilam bi keserê dest pê dike. Lewre nalînên “ax ax” ku di destpêka kilamên dengbêjiyê de tén bikaranîn nîşaneyê xembariya çîroka kilamê ye ku di piraniya kilamên bi vî rengî trajîk de derbas dibe. Di seranserê kilamê de gilî û gazindên evîndarekî li dij biryara apê xwe dertê pêş. Pismam gazindan ji apê xwe dike ku domama wî nade wî.

Vebêjerê kilamê pismam bi gotina “heçî derdê evînikê dîti ji min û dotmama min nekin gazindan” dixwaze êş û kesera dilê xwe îfade bike. Lewre encax yekî mîna wî ku êş û kesera dil kişandibe wî fam bike. Kesên ku ev derd û kul nekişandibin nikarin wî fam bikin. Lewre encax bi empatiyê kesên li dij vê evînê

---

<sup>16</sup> Ev kilam ji arşîva Berekat Ozmen hatiye guhdarîkirin.

dikarin rewşa wan fam bikin. Wekî din vebêjer dixwaze bibêje ku ev rewşa wan rewşeke edetî ye û bila tu kes wan şermezar nekin.

Hêmaneke din ku di kilamên evînê de derbas dibe motîfa “xulam, xulamtî” ye ku mebest ji vê gotinê ew e ku kesê evîndar dê her û her koletiya hezkiriya xwe bike. Lewre têgeha “xulam” bi awayekî têkiliya kole û efendiyê wî rave dike. Kole ew kes e ku hemû xwestekên efendiyê xwe tîne cih. Pismam xwe dixê şûna kole û hezkiriya xwe jî dike efendiyê xwe. Bes ku ew û hezkiriya xwe bigihêjin hevdu.

Di dewama kilamê de lehengê kilamê tu wateyê nade vê qedexeya li ser evîna xwe û ya dotmama xwe. Lewre Cizîra Botan warekî wisa ye ku ji evîna Mem û Zin re mazûvantî kiriye û evîna wan her û her pîroz hatiye dîtin. Li cihekî wisa ku wargeha evînê ye çawa evîna wî weke qebhetekê tê dîtin têngihêje. Vebêjer li aliyekî derd û kulên xwe bilêv dike li aliyê din jî teswîra xweşikbûna xwezaya welatê xwe dike. Çawa ku ji dotmama xwe hez dike ewqas jî ji welatê xwe hez dike.

Hêmaneke din ku di kilamên dilînî de dertê pêşiya me hêmana “keçrevandinê” ye. Vebêjer dike û nake bi lavakirinê apê xwe qanî nake û nagihêje armanca xwe. Gefê li apê xwe dixwe ku dotmama xwe birevîne “hidûdê îngiliziyân” ku mebest ji vê îfadeyê ew e ku dotmama xwe bibe welatekî dûr. Dixwaze bi vî awayî apê xwe ceza bike. Di heman demê de keçrevandin ji bo civakeke pederşahî qebhet û rûreşiyêke mezin e. Leheng bi vê armanca dike ku apê xwe qanî bike û ew jî bigihêje mirazê xwe. Ev hemû îfade di heman demê de nîşaneyên êşa nav dilê leheng in.

Ji gotinên kilamên yên dawî tê dîtin ku vebêjer hêdî hêdî hêviyên xwe wenda dike. Di serî de behsa xweşikbûna xwezaya welatê xwe Cizîra Botan dike lê paşê vî bajarî weke bajarekî “serûbin” teswîr dike. Ji ber ku nagihêje mirazê xwe ev bajar ji bo wî êdî bajarekî wêran e. Di kilamên evînên bêmiraz de gotinên mecazî yên weke “serûbin û wêran” îfadeya negihaştina dilketiyan e.

Vebêjer herî dawî bi gotina “bi Xwedê mamo tu qatilê serê min î” gefê li apê xwe dixwe ku dê xwe bikuje. Bi vê îfadeyê dixwaze bêje ku mamê wî dotmama wî nede wî dê bibe sedema xwekuştina wî. Tê dîtin ku êş û kesera evînê herî dawî dike

ku pismam xwe bikuje. Lewre ji mirinê pê ve tu çareyê nabîne ji xwe re. Mîna gelek kilamên din yên evînê di vê kilamê de jî bêmiraziya du evîndaran bûye mijar û gihîştîye heta roja îro.

### **3.2.2.6. Kilama Qumrîkê**

Qumrîkê wez romî me bilê delalê wez romî me

Qumrîkê wez romî me bilê delalê wez romî me

De yar yar yar de yar yar yar de yar yar yar

De yar yar de yar yar yar de yar yar bê te sebra min nayê

Kumsoro bi wefendî me bilê kumsoro bi wefendî me

Xulam çavên reşbelek wez aşqê keçka keyfî me

Xulam çavên reşbelek aşqê keçika keyfî me

De yar yar yar de yar yar yar de yar yar yar

De yar yar de yar yar yar de yar yar bê te sebra min nayê

Qumrîk sêva ticara bilê delal sêva ticara

Qumrîk sêva ticara bilê delal sêva ticara

De yar yar de yar yar yar de yar yar bê te sebra min nayê

De yar yar de yar yar yar de yar yar bê te sebra min nayê

Kevoka li ser minara bilê kevoka li ser minara

Heyfa çavên reşbelek ketî destê neyara

Heyfa çavên reşbelek ketî destê neyara

De yar yar yar de yar yar yar de yar yar yar

De yar yar de yar yar de yar yar bê te sebra min nayê<sup>17</sup>

Ev kilam kilameke gelêrî ye. Mihemed Arîf Cizrawî û Gulîstan Perwer bi varyantên cuda ev kilam strane. Kilam ji aliyê cureyê edebî ve lîrik e. Temaya wê negihaştine. Li ser evîna eskerekî Romê ji bo keçeke kurd tê gotin. Dikare bê gotin ku kilam li ser evîna di navbera du neteweyên ji hev cuda de ye. Ji ber ku li aliyekî xortekî tirk li aliyê din jî keçeke kurd heye. Ji gotinên kilamê diyar e ku ev evîn di dema dewleta Osmaniyan de pêk hatiye.

Lewre peyva “romî” tê wateya tirkbûnê. Kurd bi Împaratoriya Romaya Rojhilat re yanê bi Bîzansîyan re cîran bûn. Ji bo vê yekê ji cîranên xwe yên aliyê rojava re “romî” digotin. Piştî ku tirk hatin li vira bi cî bûn jî kurdan dîsa ji cîranên xwe yên rojava re gotin “romî”. Ji wê demê û heta niha ev nav li ser tirkan ma. Di nav gel de ji bo tirkan û welatê wan gotinên wiha qalibî weke “welatê romê, eskerê romê, bextê romê reş e” berbelave.

Kilam ji serî heta dawiyê ji devê xort ve hatiye gotin. Li gorî rîwayetan eskerê tirk li cihê ku eskeriya xwe dike dilê wî dikeve keçeke kurd. Lê ev gotinên ku di kilamê de derbas dibin weke “kumsor û romî” van rîwayetan piştrast dike ku kumsor nîşaneyê kincên eskerê Romê ne. Weke ku me got vebêjerê kilamê ku xortekî tirk e vê evîna ku negihiştîye serî bi van gotinên jor aniye ziman.

Kilam bêmirazî, negihaştin, gazind û bêçarebûna evîndarekî radixe ber çavan. Ev evîndarê Romî ku ji bo eskeriyê hatiye welatekî xerîb ji ber êşa dil per û perîşan dibe. Ji bo ku hezkiriya xwe bi dest bixe gelekî hewil dide lê bêfêde. Ji gotina “kumsoro” ya kilamê ku tê wateya “fes”ê Osmaniyan em fam dikin ku ev xort eskerek e û bûye dildarê keçeke kurd.

Ji hêmanên sereke ku bi gelemperî di kilamên evîne yên bi hizin de derbas dibe yek jî gotina “sebra min bê te nayê” ku di vê kilamê de jî dubare hatiye bikaranîn. Ji vê gotinê tê famkirin ku evîndar negihaştîye hezkiriya xwe ku ji serê kilamê heta dawiya wê êşa dilê xwe tîne ziman û bi tirs û xofê ku dê çawa bêyî wê bikaribe îdare bike.

---

<sup>17</sup> Ev kilam ji arşîva Berekat Ozmen hatiye guhdarîkirin.

Dema behsa kumê xwe dike û dibêje “ez efendî me” dixwaze rutbeya xwe nîşanî keçê bide û wê qanî bike. Xuyaye ku bi rutbeya xwe nagihêje daxwaza xwe vê carê xwe li ber keçikê dadixîne xwe dike xulamê wê ku bigihêje armanca xwe. Motîfa “xulam” ku li jor jî hatiye ravekirin di kilamên dilînî de her tim ji aliyê kesê ku dixwaze bigihêje hezkiriya xwe ve tê bilêvkirin ku weke navgîneke qanîkirinê ye. Evîndar bi vê gotinê dixwaze bêje ku heke evîna wî bersivê bibîne dê heta û heta bibe xizmetkarê dilketiya xwe. Helbet êşa dil leheng mecbûrî bilêvkirina gotinên bi vî rengî dike.

Di kilamên dilînî de teswîr cihekî muhîm digirin. Di vê kilamê de jî evîndar teswîra hezkiriya xwe kiriye. Geh wê şibandiye sêva ticaran ku sêv nîşana xweşikbûnê ye. Geh pesnê çavên wê yên reşbelek dide. Motîfa “çavên reşbelek” di piraniya kilamên evînî yên dengbêjan de weke hêmaneke xweşikbûnê cî digire.

Şibandîna wê ya “qumrîk”ê balê dikişîne. Qumrîk cureyeke kevokan e. Dema em li taybetmendiyên vê ajelê dinêrin ajeleke pir dilsoz û dilrast e. Ji du qumrîkan dema yek bimire ya din tu carî bi qumrîkeke din re nabe heval. Lewre qumrî hêlîna qumrîyeke din xera nake. Em vê îfadeyê jî dikarin wiha şîrove bikin ku evîndar bi gotinên herî xweşik hezkiriya xwe teswîr dike. Di vir de jî hem şibandîneke xweşikbûnê heye ku kevok nîşaneyê xweşikbûnê ye hem jî baweriya dilsoziyê ya ji bo keçikê heye.

Xortê evîndar di her çarîneke kilamê de hesreta xwe, bêrîkirin û hezkirina xwe aniye ziman. Di dewama kilamê de tê dîtin ku leheng nagihêje mirazê xwe. Îfadeya “heyfa çavên reşbelek ketî destê neyara” van gotinên me piştrast dike. Ji ber ku ev evîn tenê ji devê lawikê evîndar ve hatiye gotin dibe ku evîneke yekalî be yan evîneke platonîk be jî. Lewre em tenê hestên xortê evîndar dibînin. Lê çî dibe bila bibe ev evîn bi dûmahîkeke dramatîk ve bi dawî bûye.

### **3.2.2.7. Kilama Yar Gewrê**

Yar Gewrê de yar yar yar yaran yar Gewrê ax

De yar yar yar Gewrê şewitiyo gundo gewra min ne diyar e

Sebra dilê min bê te nayê oy oy oy ax ax

Yar Gewrê çi dikî li wî çiyayî ax  
Sê biskê zirav û dirêj têl bi têl bide ber wî bayî  
Min ê devê xwe avêtî neqeba sîngan û beran  
Devê min ê lê şemitî ketî serê memikê te  
Rebenê şîr tê negerayî ax ax de yar yar yar Gewrê ax  
Ax şewitiyo gundo Gewra min ne diyar e  
Sebra dilê min bê te nayê oy oy oy ax ax  
Yar Gewrê û havîne dinya li min kelan û kel e  
Kerîke xemşan û du xezala wele sala evî çaxî gewra min  
Keçan ji keçik bû li mala bavê xwe bû oy oy oy  
Lê lê di vê sala we vê salê dere dergisiyê xwe re cih û karan diemile  
De yar yar yar yar yar yar yar yar gewrê  
Yar yar oy oy oy oy oy ax ax  
Yar Gewrê yar Gewrê yar Gewrê yar Gewrê ax  
Yar Gewrê havîne dinya li min kelan û dikeliji  
Havîne dinya li min kelan û dikeliji  
Kerîke xezal û du xezalan li binê berika jêrê dimijmiji oy oy ax  
Lê lê îjar rebenê fistanekî kiraskî melesî kitan  
De wî wî li ser halê min û xwe de diponijî  
De yar yar Gewrê şewitiyo gundo Gewra min ne diyar e

Sebra dilê min bê te nayê oy oy oy ax ax<sup>18</sup>

Kilama “Yar Gewrê” kilameke bêmiraziyê ye ku çeşnê edebî yê kilamê evîn e. Kilam ji devê mêr ve hatiye girtin. Vebêjerê kilamê ku mêr e li ser bêmiraziya xwe û dilketiya xwe Gewrê hestên xwe bi awayekî dilsoj bi lêv kiriye. Kilam ji axaftineke hundirîn ya vebêjer pêk tê ku di piraniya kilamên Meryem Xanê de weke taybetmendiyeke dertê pêşiya me. Lehengên kilamên Meryem Xanê çi jin çi mêr bin gelemperî bi axaftineke hundirîn ve derd û keserên xwe tînin ziman ku ew kesên ku bangî wan dike carinan dê ye carinan hezkirî ye.

Di navenda vê kilamê de negihaştina du hezkiriyan heye. Ji bo zelalkirina çîrokên kilaman çawa ku di kilamên din de jî me xwe spart gotinên vebêjer ji vegotinên vê kilamê jî em têdigihêjin ku dilketiya leheng Gewrê bêyî dilê xwe bi zorê hatiye zewicandin. Lewre ev îfadeyên vebêjer “Lê lê îjar rebenê fîstanekî kiraskî melesî kitan / De wî wî li ser halê min û xwe de diponijî” vê şîroveya me piştrast dike.

Tê dîtî ku lehengê kilamê her dem bi “yar Gewrê” bangî hezkiriya xwe dike. Berî her tiştî divê bê zelalkirin ku “Gewrê” ne navê rasteqîn yê dilketiya leheng e. Ji ber ku peyva “gewr” di nav gel de weke sembola xweşikbûn, bedewbûn û bozbûna keçan tê bikaranîn leheng jî ji bo hezkiriya xwe gotina herî xweşik hîlbijartiyê û bi kar aniye. Çawa ku em di gelek kilaman de rastî şibandinên weke “werdek, qaz, sêvê û kewê” tînin di vê kilamê de jî şibandineke mîna van hatiye bikaranîn.

Helbet sedemeke civakî ya bikaranîna van sembolan jî heye ku leheng ji ber erf û edetên civaka xwe evîna xwe her dem veşartine ku rastî astengiyan neyên. Lewre kilamên bi vî rengî ku ji bo dilketiyan “sembol” hatine bikaranîn exleb bi encameke têkçûyî qediyane ku ev kilam nimûneyek e. Ji bilî vê di civaka kurd de çi mêr çi jin dema dizewicin bi navên xwe yî rasteqîn bangî hevdu nakin. Lewre ev di civakê de weke tişteke şermê dîtî. Ji ber vê yekê di berhemên çanda devkî ya kurdî de em rastî gelek sembolen ji xwezayê û sembolen ajelan tînin ku ji bo hezkiriyan hatine bikaranîn.

---

<sup>18</sup> Ev kilam ji vê çavkaniyê (<https://www.youtube.com/watch?v=BwRN9AHbSd0>) hatiye guhdarîkirin û tekûzîkirin.

Kilama “Yar Gewrê” yek ji wan kilaman e ku dê di çarçoveya temaya hizinê de bê analîzkirin ji aliyê hêmanên hevpar yên hizinê ve têr û tije ye. Dilketî ji destpêka kilamê heta dûmahîka wê bi banga “yar Gewrê” ku ev hezkiriya wî ye êş û kedera dilê xwe û bêgaviya xwe tîne ziman. Di kilamê de em rastî metafora “şewityo gundo” tên ku di kilamên bihizin de hêmaneke sereke ye. Mebest ji vê îfadeyê ew e ku nebûna “Gewrê” ya ji bo dilketî gund dixwe cihekî talan, kavi û xerab e. Lewre ji bo evîndar eşq watedarkirina jiyanê hemû ye. Li ber çavên leheng ev gund bi eşqa hezkiriya wî watedar dibe. Piştî ku evîndar negihaşt mirazê xwe ev gund bi hebûn û nebûna xwe ji bo wî tu wateya wî tune ye.

Lewre di berdewama kilamê de vebêjer bi gotina “sebra dilê min bê te nayê” dixwaze îfade bike ku evîn stargeha evîndaran ya her tiştî ye. Di vê stargehê de xwe gelekî kêfxweş û şanaz dibînin. Lêbelê piştî ku ev stargeh hildiweşe ji kêfxweşî û şanaziyê tu tişt namîne. Bi vê îfadeyê leheng di heman demê de hesret û bêrîkirina ji bo hezkiriya xwe nîşan dide.

Leheng car caran teswîra xwezayê dike ku têkiliyekê dibîne di navbera êşa dilê xwe û xwezayê de. Çawa ku behsa demsala havînê dike diyar dike ku keke kela germa havînê êş û kesera dilê wî zêdetir kiriye û ji bo wî bûye eziyet. Ango vebêjer dixwaze îfade bike ku li aliyekî êşa evîna hezkiriya wî û li aliyê din germa havînê wî xistiye halekî perîşan. Ev gotina leheng ya “havîn e dinya li min kelan û kel e” vê şîroveya me piştrast dike.

Lehengê kilamê piştî ku behsa kela dilê xwe dike bi van îfadeyên weke “kerîke xezal û du xezalan li binê berika jêrê dimijmiji” xweziya xwe bi rewşa ajelan tîne ku ew li cem xwediyên xwe û hezkirên xwe ne. Ev gotinên mîna van hemû nîşaneyên derûniya leheng in ku di rewşeke çawa de ye.

Di rêzên dawî yên kilamê de em dibînin ku vebêjer ji bo hezkiriya xwe gotina “reben” bi kar tîne ku ev qalib îfadeya belengazî, jarbûn û bêgavî ye. Lewre ji gotinên leheng “De wî wî li ser halê min û xwe de diponijî” tê famkirin ku ev evîn evîneke dualî ye û hezkiriya wî bêyî dilê xwe ji dilketiyê xwe qetiya ye. Leheng bi van rêzan di heman demê de jana dilê hezkiriya xwe jî radixe ber çavan.

### 3.2.2.8. Kilama Yadê

Yadê yadê yadê yadê yadê yadê yadê

Yadê yadê yadê yadê yadê yadê ax

Yadê were li min û vî dilê dêranî

Li vî sewdayî li vî aqilî

De kanî dem û dewranî te yî de ewilî dest

Xortekî çardeh salî berdabû li seyê

Pîsê mêrekî seyê dê lê yê hasilî ax yadê yadê

Li serê te ecêbî li min ê bê miradê

Yadê bejna zirav min dîtibû li ber derê wî

Xweş tê qubêna cezmê min xulama çi yê na

Dev û lêva lê lê ramûsanê keleş gewra min

Rebenê xweştirîn yadê yadê ji îro pê ve<sup>19</sup>

Di navenda vê kilamê de jî evîneke nîvcomayî heye ku temaya kilamê bêmiradî, negihaştine. Di kilamê de evîna keçekê dertê pêş me. Bi vê sedemê çeşnê edebî yê kilamê lîrik e. Weke kilamên din ev kilam jî ji devê keçeke evîndar hatiye girtin. Ji destpêka kilamê heta dawiya wê em li derd û kulên keçekê guhdarî dikin. Vebêjera van derd û kulan keça evîndar bi xwe ye.

Qeyda dengê vê kilama ku arasteyî Meryem Xanê tê kirin me peyda nekir. Bo vê sedemê ev kilam di pirtûka “Miryem Xan” de çawa hatiye deşîfrekirin em jî li gorî deşîfrasyona vê pirtûkê kilamê analîz dikin. Kilam ji aliyê hêmanên ku hizinê temsîl dikin ve kilameke dewlemend e.

---

<sup>19</sup> Ev kilama ku arasteyî Meryem Xanê tê kirin ji ber ku qeyda dengê wê nehat peydakirin kilam jî pirtûka *Miryem Xan* hatiye wergirtin.

Kilam bi banga lehenga kilamê dest pê dike ku ev bang li dê tê kirin. Banga “yadê” hawara keça evîndar e. Çawa ku di kilamên din de jî pir caran em rast hatin “dayik” di vê kilamê de jî ji bo evîndar bi taybetî ji bo keçên evîndar cihê herî biewle yê xwesipartinê ye. Xuyaye ev bang bangeke bêçaretîyê ye. Lewre ev gotina leheng ya “Yadê were li min û vî dilê dêranî” îfadeya belengazî û bêgaviya keça evîndar e. Ev gotinên leheng bi me dide nîşan ku ji ber vê evîne tu tişt ji destê evîndar nayê. Ango leheng bêçaretîya xwe bi van gotinan bilêv kiriye. Ji bo vê rewşa xwe ya trajîk diya xwe weke arîkar dibîne ku dubare bang li dê tê kirin.

Dema em têgeha “dayikê” bi nêrîneke sosyolojîk û civaknasî ve binirixînin di civakên baviksalarî de jina evîndar evîna xwe ji dê û birayê xwe re nabêje. Lewre ev rewş weke rewşeke şerm tê dîtin ji bo jinê. Ji ber vê jin derd û kulên xwe tenê ji hev re dibêjin. Ev kes dibe xwişka evîndar an kesek nêzî evîndar be. Lê di vê kilamê de û di gelek kilamên din de “dayik” weke faktoreke girîng derdikeve pêşîya me. Dê ji bo jina evîndar her tim şîrîka derd û kulan e.

Hêmaneke din ku her tim bi hemana “dayik”ê re tê bikaranîn gotina “reben” e. Lewre figura “dayikê” di kilaman de bi gelemperî bêçaretî, belengazî û rebentîyê temsîl dike ku di vê kilamê de jî bi vî rengî hatiye emilandin. Lehenga kilamê digel ku dizane diya wê jî weke wê bêgav e û ji bo vê dilêşîya wê tu çare ji dest nayê jî xwe spartîye wê.

Hêmaneke din ku îfadekirina hizinê ye qalibê “bêmiradî” ye. Ev qalip îfadeya negihaştina dilketî ye. Ji bo keç û mêrekî “bêmiradî” rewşa herî dilsoj e ku weke nifir jî li keç û mêran tê kirin. Vebêjera kilamê bi vê îfadeyê şewata dilê xwe tîne ziman. Motîfa “xulam” di kilamên evîniyê de motîfeke pir xurt e. Li hember dilketî teslîmîyeteke mezin xwe dide der. Herweha îlana qebûlkirina koletîya xwe ya li dij evîna xwe ye. Leheng bi vê îfadeyê dixwaze bibêje ku hebûna wê bi hebûna hezkiriyê wê ve heye. Dilketî bi her awayî xwe dispêre hezkiriyê xwe.

### **3.2.2.9. Kilama Derdo**

Ax derdo derdo derdo derdo derdo

Derdo ay derdo derdo derdo

Derdo ax ez bi kul im oy oy ay tu dimrî can hey cano

Ay derdo kuriko dîno derdê dilê min giran e dabû li ser derda

Bihar e giya şîn dibe li zozana li çîmara ax li hemî erda

Lê wekî jina zeîf bikeve berîka sebebê mêrê xirab de

Ay ne tê kuştin ne ne tê bêrdan

Ax wez bi kul im ay ay ay ay tu dimirî can bê cano

Ax derdo kuriko dîno derdo dilê min ...? zirç e

Dewsa pezkê kovî winda kir rêka vî mîratî

Ay zirç e wele dibê bi dîtina çava ber qinyata dikî

Ax ez bi kul im tu dimirî can be cano<sup>20</sup>

Kilama “Derdo” kilameke lîrîk e ku li ser bengîtiyê ye. Temaya kilamê negihaştin û veqetîn e. Gelek kilamên ku Meryem Xanê strane tê dîtîn ku ji aliyê hevçaxê wê Mihemed Arif Cizrawî ve hatine gotin. Ev kilam jî bi guhertoyên cuda ve ji aliyê M. Arif Cizrawî û Tahsîn Taha ve hatiye gotin. Kilam ji devê jinê ve hatiye girtin. Ji bo vê yekê vebêjera kilamê keç e. Ev keç ku di heman demê de lehenga kilamê ye davêje ser evîna xwe û hezkiriyê xwe. Ji ber ku em çîroka vê kilamê baş nizanin weke kilamên din ku çîrokên wan me peyda nekirin di vê kilamê de jî em xwe dispêrin gotinên kilamê ku ji gotinên kilamê em xwe digihînin gelek zanyariyan.

Li gorî famkirina me ya ji kilamê em dikarin bêjin ku lehenga kilamê bi hezkirineke jêneveger evîndar bûye. Lewre ji destpêka kilamê heta dawiya wê tenê keçik diaxive û evîna xwe tîne ziman. Lê em têngihêjin ku ev evîneke yekalî ye yan dualî ye. Dibe ku evîneke platonîk be jî. Em dikarin gelek îhtimalan li ber çavan

---

<sup>20</sup>Ev kilam ji vê çavkaniyê  
([https://www.youtube.com/results?sp=mAEB&search\\_query=derdo+meryem+xan](https://www.youtube.com/results?sp=mAEB&search_query=derdo+meryem+xan))  
hatiye guhdarîkirin û tekûzkin.

bigirin. Lewre weke ku me got di seranserê kilamê de axaftineke yekalî xwe dide der.

Ji rêza “Derdo ax ez bi kul im oy oy tu dimrî can hey cano” tê famkirin ku hezkiriyê keçikê miriye. Le em dikarin vê weke mirineke fizîkî jî fam bikin an jî dibe ku vebêjer negihaştina xwe şibandibe mirinê. Lewre ji bo evîndar negihaştin weke mirinê ye heta rewşeke ji mirinê xerabtir e. Li dor van agahiyan dikare bê gotin ku kilam ji aliyê cureyê edebî ve zêmar e. Ji ber ku zêmar ji bilî mirinê li ser rewşên dramatik yên weke evîna têkçûyî, negihaştin, derd û kul, koçberî û her wekî din tên gotin em vê kilamê jî di vê çarçoveyê de dinirxînin.

Kilam bi banga “derdo” dest pê dike ku ev îfade ji bo lehengê mêr yê kilamê hatiye bikaranîn di nava xwe de gelek wateyan dihewîne. Di serî de divê bê gotin ku ev îfadeya “derdo” ji bo ew kesê ku bûye sedema derd û kulên vebêjer weke navê wî kesî hatiye bikaranîn. Ango “derdo” hezkiriyê lehenga kilamê ye. Ev îfade di nava xwe de hem gilî û gazincan dihewîne ku ev kes bûye sedema êşeke bêderman û hem jî hezkirin, bêçarebûn û bêzarbûnekê dihewîne.

Îfadeyeke din ya hevpar ku di kilamên hizinê de em rast tînin îfadeya weke “derdo ez bi kul im” nîşaneyê birîna dil e. Dilê vebêjer li dij vî derdî ku tu çareyê nabîne birîn digire. Bi dubareya gotina “derdo” lehenga jin weke sedema birîna dilê xwe her tim hezkiriyê xwe sûcdar dike. Lêbelê her çiqas bangî hezkiriyê xwe dike û kesera dilê xwe bi wî re par ve dike jî ji vê xembariyê xelas nabe, heta derd û kulê wê zêdetir dibin.

Lewre ev îfadeya “Ay derdo kuriko dîno derdê dilê min girane dabû li ser derda” vê îzaha me piştrast dike. Ji vê îfadêyê em têdigêhêjin ku lehenga jin ji xwe xwedî gelek derd û kulan e, lê piştî mirina hezkiriyê xwe an negihaştina wî êdî nikare serê xwe ji xeman rake. Derd li derdên wê zêde bûne. Bêçarebûna xwe ya li dij mirinê an veqetîna dişibîna rewşa jineke bêçare ku bi mêrekî zordest zewiciye.

Rewşa xwe bi van gotinên “lê wekî jina zêf bikeve berîka sehabê mêrê xirab de” dişibîna rewşa jineke jar û bêçare. Lewre hêviyên wê yê gihaştinê li dij mirina hezkiriyê wê qut bûne. Ji ber vê sedemê rewşa xwe dişibîna rewşeke ku ji bo jinê

rewşa herî xirab e. Lewre vebêjer bi vê îfadeya “ay ne tê kuştin ne tê bêrdan” vê rewşa xerab baş teswîr dike.

Ji destpêka kilamê ve lehenga kilamê her tim bêçaretiya derdê xwe tîne ziman. Her çend hin derd hene ku çareya wan hene lê ji van şibandinên rewşên xirab tê famkirin ku çareya vî derdê wê tuneye. Ev hemû îfadeyên ku di kilamê de hatine bikaranîn di heman demê de nîşaneyên êş û kesera nav dilê lehenga jin in ku hizina hezkiriyê xwe dikişîne.

### **3.2.2.10. Kilama Bejna Zirav**

Eman eman eman eman eman eman eman lê ay ay

Eman kuriko dîno bejna te zirav e

Lê wextê bişkê lê lê wez ê werim sûka Sêrtê

Kemerkê bînim lê bidim piştê

Wele Xwedê malika te re sê sebeba xira bike

Çawa neşem ez ê bêhnekî rûnim li def teniştê ax ax

Lê lê bejnê law kuriko law kurê Wanê

Wele xwezî bav û bira ne wez tê da mê

Eman ez ê vê re biçûma li ser serê lê ne fîramê oy oy ax ax

Lê hawar delal lo hawar delal eman ezîzê dilê min o

Wez heliyam lê çi li min nema oy oy oy oy

Lê lê kuriko dîno were mala me bi mêvanî

Lê ezîzê dilê min o taştê dîne lê şîv çi nanî

Wele wekî min ê şermoka bavo û birakê xwe ba

Min ê ji te re şerjêkîra berxê li ber beranî<sup>21</sup>

Kilama “Bejna Zirav” kilameke evînî û hizinê ye û ji aliyê cureyê edebî ve lîrîk e. Temaya kilamê negihaştine. Ji hûnandina bûyera kilamê tê famkirin ku kilam derbarê evîna keçekê de ye ku vebêjera kilamê keçik bi xwe ye. Ji destpêka kilamê heta dûmahîka wê kilam ji devê keçikê ve hatiye gotin. Mixatabê keçikê ango lehengê mêr yê kilamê hezkiriyê keçikê ye.

Bangkirinek heye ku keçik hemû derd û kulên dilê xwe û gazine xwe bi hezkiriyê xwe re par ve dike. Lewre sedema negihaştina wan malbata hezkiriyê wê ye ku gilî û gazinan ji wan dike. Her çiqas sedema negihaştina keçik û dilketiyê wê di kilamê de nehatibe eşkerekirin jî ji gotinê kilamê baş tê xuyakirin ku astengiya li ber vê evînê malbata hezkiriyê keçikê ye.

Di seranserê kilamê de tê dîtina ku keçik ji bo dîtina hezkiriyê xwe hin tiştan dike sedem lê mixabin nagihêje armanca xwe. Ji bo vê kilamê em dikarin bêjin ku dengbêj hest û hîsên evîna jêneveger ya keçekê bi awayekî profesyonel radixe ber çavan. Ji aliyê hêmanên evînê û hizinê ve kilameke têr û tije ye.

Hêmana ewil ya hizinê ku di kilamê de em rast tên gotina “eman kuriko” ye ku îfadeya medetxwestin û lavahiyê ye. Di kilamên evîniyê de piranî ev medet ji dayikê tê xwestin ku li jor gelek mînakên vê hene. Lêbelê vê carê tê dîtina ku keçik ji hezkiriyê xwe medetê dixwaze. Lewre hezkiriyê xwe weke kesê herî nêz xwe dibîne ku tekane êşa dilê wê ew fam dike. Wekî sedemeke din jî dikare bê gotin ku ji ber ku astengiya herî mezin ya li dij evîna wan malbata hezkiriyê wê ye wisa bawer dike ku hezkiriyê wê dikare wan qanî bike.

Ji her îfadeyeke kilamê tê xuyakirin ku keçik bi çî sedemê dibe bila bibe bi dil û can daxwaza dîtina hezkiriyê xwe dike. Lewre di berdewama kilamê de dema keçik teswîra bejn û bala hezkiriyê xwe dike di heman demê de dixwaze piştî wî bişkê ku ev bibe sedema dîtina wê û hezkiriyê wê. Ev hemû îfade nîşaneyên kesera dilê keçikê ne ku astengiyeke mezin li ber evîna wê heye.

---

<sup>21</sup>Ev kilam ji vê çavkaniyê  
([https://www.youtube.com/results?search\\_query=bejna+zirav+meryem+xan](https://www.youtube.com/results?search_query=bejna+zirav+meryem+xan))  
hatiye guhdarîkirin û deşîfrekirin.

Hêmaneke din ku îfadeya xembariyê ye nifira “Xwedê malika te re sê sebeba xira bike” ye ku nifir hêmaneke herî girîng e di kilamên hizînê de. Piraî dema ku hin kes dibin sedema negihaştina hezkiriyên nifirên bi vî awayî tînin kirin. Lewre nifir, îfadeya bêçarebûn û bêzarbûna hezkiriyên e.

Di berdewamiya kilamê de keçik bi gotina “hawar delal û eman ezîzê dilê min” dubare arîkariyê ji hezkiriyê xwe dixwaze ku çareyekê ji agirê dilê wê re bibîne. Ev gotinên bi vî rengî ku di kilamê de hatine bikaranîn herweha îfadeyên evîneke jêneveger e ku bi israr daxwaza çareyekê tê kirin.

Lehenga kilamê ango vebêjera kilamê ber bi dawiya kilamê ve rewşa xwe bêtir dramatîze dike ku qalibê “Wez heliyam lê çî li min nema” îfadeya perîşanbûn û bêzarbûna wê ye. Bi vî îfadeyê dixwaze xemgîniya xwe raxîne ber çavan. Herweha em dikarin vî îfadeyê weke şîdeta êşa nav dilê keçikê şîrove bikin.

### **3.2.2.11. Kilama Zembîlfiroş**

Xatûnê wez tobedar im

Xwedanê erz û iyal im

Zarok birçîne li mal in

Xatûnê wez tobedar im

Xatûnê gerden bi morî

Şuxil nabi bi kotek û zorî

Tirsa min ji Îlahê jorî

Xatûnê wez tobedar im

Zembîlfiroş lawikê biyanî

Kerem bike were banî

Qîmetê selikan tu zanî

Xatûnê wez tobedar im

Zebîlfiroş lawikê derwêş e

Kerem bike were pêş e

Qîmetê selikan tu bêje

Xatûnê wez tobedar im<sup>22</sup>

Kilam, kilameke gelêrî ye. Ji bilî Meryem Xanê Karapetê Xaço û Mihemed Arif Cizrawî bi varyasyonên cuda ve ev kilam strane. Kilam ji aliyê çeşnê edebî ve lîrîk e. Temaya kilamê bêmirazî û negihaştin e. Lewre lehenga jin ya kilamê Gulxatûn nagihêje mirazê xwe û mirazê wê di dile wê de dimîne. Evîna Gulxatûnê evîneke yekalî ye û Zebîlfiroş qet bersivê nade vê evîna wê. Kilam hem ji devê lehenga jin hem jî ji devê lehengê mêr ve tê gotin. Ev çîroka folklorîk ku di nav gelê kurd de belav bûye weke çîrokên din yê gelêrî ku bi devkî gihîştine heta îro gelek guhertoyên wê hene.

Li gorî çavkaniyên ber destan kesê ku cara pêşî çîroka Zebîlfiroş nivîsiye Helbestkarê klasik Feqiyê Teyran (1549-1631) e. Piştî Feqiyê Teyran Melayê Bateyî (1675-1760) û Mûradê Bayezidî jî di sala 1776an de bi helbestkî ev çîrok nivîsîne (Samur, 2015: 81). Aziz Samur ji Abdureqîp Yûsiv vediguhezîne ku çîroka Zebîlfiroş û Gulxatûnê wekî ya Mem û Zîn û her wekî çîrokên evîne yê din ên cîhanî û rojhilatî qewimînek rasteqîn e û di serdemeke diyar de qewimiye (Samur, 2015: 98).

Serpêhatiya Zebîlfiroş û Gulxatûnê di dema Dewleta Merwaniyan de di sala 994ê zayinî de ango di dawiya sedsala 10an de li navçeya Farqîna Amedê qewimiye. Zebîlfiroş weke Mîr Seîdê kurê Mir Hesên Paşayê Diyarbekirî tê nasîn. Li gorî vegotinan Zebîlfiroş yekî bi bejin û bal bû û gelekî çeleng bû. Ji malbateke dewlemend bû. Rojekê dema diçe nêçîrê di ber goristanekê de derbas dibe û bandorek mezin li ser giyanê wî çêdibe. Piştî vê bûyerê êdî dev ji mal û milkê

---

<sup>22</sup>Ev kilam ji vê çavkaniyê  
([https://www.youtube.com/results?search\\_query=zembilfiro%C5%9F+meryem+xan](https://www.youtube.com/results?search_query=zembilfiro%C5%9F+meryem+xan))  
hatiye guhdarîkirin û deşîfrekirin.

dinyayê berdide û xwe dispêre Xwedê. Debara xwe bi zembîlfiroşiyê dike. Tax bi tax digere û ew zembîlên (selik) ku çêdike difiroşe. Zembîlfiroş rojekê dema li kûçeyên Farqînê selikan difiroşe bala jina Mîrê Farqînê Gulxatûnê dikişîne. Dilê wê dikeve Zembîlfiroş. Bi hinceta ku wê jê zembîlan bikire wî dawetî qesrê dike û evîna dilê xwe jê re dibêje.

Lêbelê ji ber ku Zembîlfiroş yekî tobedar bû û ji jina xwe jî hez dikir bersiv neda vê evînê. Gulxatûn ji ber vê evînê dîn û har dibe. Zembîlfiroş ji wê derê direve diçe. Gulxatûn pêşiya Zembîlfiroş bernade. Ji bo Zembîlfiroş bi dest bixe her rêyê diceribîne. Dawiya dawîn xwe digihîne ew konê ku Zembîlfiroş lê dimîne. Ji bo ku tenê carekê têkeve nav nivînên Zembîlfiroş lava ji jina wî dike û qewl dike ku dê hemî zêrên xwe û xişirên xwe bexşî wê bike. Li ser israrên Gulxatûnê jina Zembîlfiroş vê daxwaza wê qebûl dike. Gulxatûn kincên jina Zembîlfiroş li xwe dike û dikeve nav nivînan li benda Zembîlfiroş dimîne.

Piştî ku tarî dikeve erdê û Zembîlfiroş zembîlên xwe difiroşe tê konê xwe. Dikeve nav nivînên xwe. Lêbelê ji dengê xirxalên di lingê Xatûn de fam dike ku ya li cem ne jina wî ye û ji kon derdikeve û diçe. Gulxatûn wî dixwe zindanê. Di dawiya çîrokê de Zembîlfiroş dimire. Li gor hin vegotinan Zembîlfiroş dinêre ku xelasiya wî ji Xatûnê tune ye xwe ji ser bircan davêje û dimire. Li gorî vegotîneke din jî Zembîlfiroş li hember evîna Gulxatûnê bêçare dimîne û ji yezdan lava dike ku canê wî bistîne. Piştî ku Zembîlfiroş dimire li dû wî Xatûn jî heman daxwazê ji yezdan dike û ew jî dimire.

Dawiya vê çîroka evînê weke gelek çîrokên evînê mîna Mem û Zîn û Siyabend û Xecê bi hizîne bi dawî dibe. Li ser qebra Zembîlfiroş û cihê bûyara wî gotegotên ji hev cuda hene. Li gorî vegotinan li başûrê Kurdistanê li Batîfayê bi navê “Mezargehê Zembîlfiroş” goristanek heye û tê gotin ku bûyera Zembîlfiroş li vê deverê qewimiye. Lêbelê li gorî Samûr ji Wesfî Hesên Ridênî vediguhezîne têkiliya serpehatiya Zembîlfiroş û Batîfayê bi hev tune ye. Li gorî hizîra wî ev çîrok bi rêya dengbêj, feqî, mela û derwêşan li hemî deverên Kurdistanê belav bûye û hatiye heta Batîfayê û weke yadîgar li vira bi navê Zembîlfiroş mezargehek hatiye çêkirin (Samur, 2015: 62-63).

Berhemên folklorîk ji ber ku devkî ne bi demê re gelek guherîn di wan de çêdibin û ji bo vê yekê gelek vegotinên ji hev cuda derdikevin holê. Helbet bi saya van guhertoyan em xwe digihînin gelek pêzanînên rastîn jî. Vê guhertoya jor ku Meryem Xanê bi deng dixê derbarê cih û warê Zembîlfiroş de mixabin tu agahiyan em bi dest naxin lêbelê evîna Xatûn ya ji bo Zembîlfiroş di kilamê de bi awayekî xurt xwe dide der.

Weke ku li jor jî hat destnîşankirin gelek varyantên bûyera Zembîlfiroş hene. Di kilaman de jî ev guherto xwe didin der. Di varyanta ku stranbêj Şivan Perwer bideng dixê, di risteya dawî de ku dibêje “Tobedarê Zerdeştê Kal im” nîşan dide ku li gorî hin jêderkan Zembîlfiroş êzîdî ye. Lewre di pirtûka O. Celîl û C. Celîl “Zargotina Kurda” de Zembîlfiroş weke yekî êzîdî derbas dibe. Di pirtûkê de navê Zembîlfiroş weke Bênamên; navê Xatûnê weke Qedîmxas û navê jina Zembîlfiroş jî weke Elê derbas dibe (Samûr, 2015: 144).

Zembîlfiroş çi êzîdî çi misilman ji bo me ya herî girîn ev e ku ev kilam bi çi hestî hatiye nivîsin an strîn. Meryem Xan bi strîna vê kilamê hîsên jineke ku dilê wê ji bo hezkiriyê wê disoje bi me re par ve dike. Ji hûnandina çîroka kilamê jî em têdigihêjin ku ev hestên lehenga jin ya kilamê Xatûn yekalî ne. Her derdê wê ew e ku bigihêje miradê xwe. Lêbelê Zembîlfiroş jî yekî li dûv rizqê zar û zêçên xwe ye. Zembîlfiroş ji xwe tê wateya kesê ku zembîlan difiroşe. Tenê derdê wî ew e ku zembîlên ku çêdike wan bifiroşe û zarokên xwe birçî nehêle. Qet çavên wî ne li derve ye. Heta jê tê xwe ji evîna Xatûn diparêze.

Di her çar malikên kilamê de jî tê dîtin ku Zembîlfiroş li dij îsrarên Xatûn nayê xapandin û her daîm tobedariya xwe dubare dike û bi gotina “lawikê derwêş im” jî bi Xatûnê dide famkirin ku êdî dest ji mal û milkê dinyayê berdaye êdî xwe daye eşqa Xwedayî. Zembîlfiroş ji ber evîna xwe ya Xwedayî vê xwesteka Xatûnê qet qebûl nake. Xatûn jî çi dike nake nikare wî ji rê derxîne.

Ji serî heta dawiya kilamê ji diyaloga di navbera Zembîlfiroş û Xatûnê de xuya dibe ku Xatûn bi tu awayî serfiraz nabe û li dij vê evîne têk diçe. Ji îsrarên Xatûn xuya dibe ku eşqa Zembîlfiroş li serê wê xistiye. Tevî ku zewiciye jî çavên wê tu tiştî nabîne. Wisa xuyaye ku her tişt daye ber çavên xwe. Lewre dixwaze agirê dilê

xwe vemirîne. Lêbelê tu çareyê ji agirê dilê xwe re nabîne. Serpêhatiya Zembîlfiroş û Xatûnê bi van taybetmendiyên xwe dişibe serpêhatiya Yûsiv û Zuleyxa. Lewre Zuleyxa jî tevî gelek hewildanan nagihêje mirazê xwe. Mirazê her du jinan di dilê wan de dimîne.

### **3.2.2.12. Kilama Weyla Li Min Xerîbê**

Weyla li min xerîbê

Bê tal û nesîbê

Xwedê neki kes bê xweyî bi

Xerîbka ezmana

Ser kêla kizwana

Ser serê gund û cîrana

Xerîbkê çî goto

Cotyarî çûn coto

Xerîbê kemer firoto

Xerîbkê nizani

Kulîlka hinarê

Xerîb wê gihabanê buharê<sup>23</sup>

Kilam ji aliyê çeşnê edebî ve lîrîk e. Temaya kilamê tenêtî ye. Ji gotinên kilamê em têdigêhjin ku vebêjera kilamê jin e. Kilam ji devê jinê ve tê gotin. Ev kilam jî weke gelek kilamên din yê Meryem Xanê kilameke xembariyê ye ku gelek hêmanên hizinê di nava xwe de dihewîne.

---

<sup>23</sup>Ev kilam ji vê çavkaniyê

([https://www.youtube.com/results?search\\_query=weyla+li+min+xeribe+meryem+xan](https://www.youtube.com/results?search_query=weyla+li+min+xeribe+meryem+xan))

hatiye guhdarîkirin û deşîfrekirin.

Ji destpêka kilamê heta dûmahîka wê lehenga jin ya kilamê tenêti, bêûdî û bêxwedîbûna xwe tîne ziman. Ji gotinên kilamê em baş fam dikin ku lehenga kilamê ji tenêtiyê gilî û gazinan dike. Ango behsa tenêtiya jinê dike ku çiqas bêkesbûn ji bo jinê zor û zehmet e. Vê tenêtiyê em dikarin bi du awayan şîrove bikin. Tenêtiya jineke ku ji hevserê xwe qetiya ye an hevserê wê miriye yan jî tenêtiya keçeke azib ku nesîb nehatiye ser wê.

Weke ku li jor jî me îfade kiribû kilamên ku Meryem Xanê strane em nikarin ji jiyana wê dûr binirxînin. Em dizanin ku Meryem Xan piştî du zewacên nîvcomayî heta dawiya temenê xwe tenê jiyaye. Li gorî ku heval û hogirên wê dibêjin Meryem Xanê her tim ji tenêtiyê gilî û gazin kiriye û qala bêkesbûna xwe kiriye. Têkildarî van agahyan dikare bê gotin ku Meryem Xan dibe ku ev kilam bi van hest û hîsan ve avêtibe ser xwe jî. Bi vê kilamê Meryem Xanê bûye tercûmana hestên gelek jinan.

Gotina destpêka kilamê weke “weyla li min xerîbê” îfadekirina tenêti û hizînê ye. Ev îfade herweha nîşaneyê bêkesbûn, belengazî û dilşewitandina jinê ya bi xwe ye. Ev gotina folklorîk dema jin bêkes bimînin an bûyereke nebaş li serê wan biqewime vê îfadeyê bi kar tînin. Lehenga kilamê dibe ku keçeke azib û bênesîb be yan jî jineke bêxwedî be ku hevserê wê miribe. Sedem çî dibe bila bibe vebêjera kilamê bêkesbûna jinê bi awayekî trajîk aniye ziman.

Di risteya jêr de bi îfadeya “bê tal û nesîbê” vebêjer dixwaze îfade bike ku ji her xweşiyên cîhanê bê par û bê nesîb e. Di dewama kilamê de bi gotina “Xwedê neke kes bê xweyî be” daxwaz ji Xwedê tê kirin ku tu kes bêxwedî nemînin. Lê em wisa fam dikin ku mebest ji vê gotinê ew e ku tu jin bê xwedî nemînin. Lewre bi vê gotinê dixwaze îfade bike ku bêxwedîbûn ji bo jinekê tiştêkî gelekî zor û zehmet e.

Em dizanin ku dengbêj di civakeke pederşahî de mezin bûne û hemû kevneşopên civaka xwe baş dizanin. Di civakên pederşahî de jineke bêxwedî rastî gelek pirsgirêk û zehmetiyan tê. Ji bo vê yekê dengbêj ji devê jinê zor û zehmetiyên bêxwedîbûn û tenêtiyê aniye ziman. Her gotineke kilamê diramatîzebûna kilamê zêdetir dike. Îfadeya “xerîbka ezmana” û gotinên ku li dûv tîne rewşa lehenga jin ya dilsoj bêtir radixîne ber çavan.

Mebest ji îfadeya “xerîb” di vir de ne dûrketineke fîzîkî ye. Lê çawa ku tê zanîn xerîbî tiştêkî pir zor û zehmet e vebêjer xwe weke xerîba Xwedê dibîne ku ji Xwedê pê ve tu kesê wê tune. Lewre her çiqas li welatê xwe yan li mala xwe be jî ji ber ku bêkes e ew her tim xwe weke xerîban dibîne. Bi van îfadeyan vebêjer tenêtiya xwe diresimîne.

Ji gotinên din yên kilamê tê dîtin ku lehenga kilamê rewşa xwe ewqas diramatîze dike ku ew mecbûrê gundî û cîranan e. Lewre li jineke bêxwedî gundî yan cîran dê xwedî derkevin ku ev gotina “ser serê gund û cîrana” îfadekirina vê rewşê ye. Di berdewamiya kilamê de gotina “cotyar çûn coto” em dikarin weke teswîra demsala payizê îfade bikin ku ev demsal di kilamên xemgîniyê de sembola hizinê ye. Lehenga jin ya kilamê bi vê teswîrê hest û hîsên xwe yên xembar bilêv dike. Lêbelê ji gotina dawî ya kilamê tê dîtin ku her çiqas tabloyeke reş li ber çavan hatibe resimkirin jî vebêjer hêviyên xwe yên rojên xweş diparêze. Gotina “Xerîb wê gihabanê buharê” vê şîroveya me piştrast dike. Bi gelemperî kilam derbarê zor û zehmetiya tenêtiya jinê de ye ku ji devê jinê hatiye gotin.

### **3.2.2.13. Kilama Sêva Hecî**

Eman eman eman eman eman eman eman ax

Ax de oy oy oy oy oy oy oy oy oy ax

De oy oy oy ax de oy oy jaro dilo ax ax

Eman eman yadê rebenê karwanê mala bavê Sêvê bûrî

Ax lê tev hêstir in ay dayê rebenê ser bara wan xurme ne

Bin bara wan ay lê tev şekir in oy oy ax

Lê lê wez ê li bextê we û Xwedê de

Ciwabekî bidin lawikê min evdala Xwedê

Bêjin Hecî Elî hat Sêvê lê ji xwe re birî oy ax

Ax de oy oy oy ax de oy oy ez ê mirim

Eman eman eman yadê rebenê dibên karwanê

Ay ay ay ax ay mala bavê Sêvê bûrî

Tev hêstir in oy oy oy oy ax

Ax daye rebenê serbara wan xurme ne

Bin bara wan ay lê tev şekir in oy oy oy ax

Lê lê wez ê li bextê we û Xwedê de

Ciwabekî bidin lawikê min evdala Xwedê

Bêjin Hecî Elî hat Sêvê lê ji xwe re birî oy oy

Oy oy oy oy ax de oy oy oy jaro dilo<sup>24</sup>

Kilama “Sêva Hecî” kilameke anonîm e. Ji aliyê cureyê edebî ve lîrîk e. Temaya kilamê negihaştin e. Kilam ji devê jinê hatiye girtin. Bi giştî derbarê çîroka kilamê de dikare bê gotin ku di navenda kilamê de zewaceke bîzorê heye. Lehenga kilamê Sêvê serboriya xwe bi xwe dibêje û li benda arîkariyekê ye ku ji vî halê bijan xelas bibe. Qêrîneke bêdeng di nav rêzên kilamê de veşartîne. Kilam ji aliyê hêmanên hevpar ên hizîne ve xwedî dewlemendiyekê ye. Em dikarin bêjin ku di her gotîneke vebêjer de axînek bilind dibe.

Axîna yekem ku di kilamê de em rast tîna axîna “eman” e ku ev axîna îzaha medetwextina jîneke bêçare û belengaz e. Lewre ev jin rastî zewaceke bêdil hatiye ku ji ber erf û edetên civaka xwe tu tişt ji dest nayê. Ji ber vê sedemê ku di gelek kilamên din de jî hat dîtin keç di rewşên wiha bêçare de dayikê weke mekanîzmeyek medetwestinê dibînin û tekane arîkariyê ji dê dixwazin. Çawa ku di vê rêza “eman yadê rebenê” de tê dîtin bangê ji dayikê re heye ku dayik ji vê rewşa wê re çareyekê bibîne. Ev gotin herweha îfadeya belengazî û jarbûna dayikê ye. Lêbelê her çiqas leheng dizane ku tiştê ji destê dayikê nayê jî ji bo xwe cihê herî biewle û xwesipartinê dayika xwe dibîne.

---

<sup>24</sup> Ev kilam ji arşîva taybet ya Berekat Ozmen hatiye guhdarîkirin û deşîfrekirin.

Kilam ji destpêkê heta dawiyê bi nalînên “Oy, ax, ay” ê dewam dike ku ev nalîn nîşaneyên hizinê ne. Yek ji hêmanên ku di kilamên evîne de herî zêde tê bikaranîn qalibê “jaro dilo” ye ku ev îfadeya bêmiraziya dilekî ye. Dil jar e, lewre negihaştîye miradê xwe. Lehenga kilamê ango Sêvê bi vê gotinê îzaha bêçarebûna jarbûna dilekî evîndar dike ku ev dil dilê wê ye. Di kilamên bengîtiyê de leheng dema ku nagihêjin miradê xwe dilê xwe weke dilekî şikestî û bêzar dibînin. Lehenga kilamê bi vê îfadeyê perîşanbûna dilê xwe nîşan dide.

Vebêjera kilamê Sêvê digel ku karwan hatiye wê dibin û di rêwîtiyê de ye hêj jî bi hêviye ku hezkiriyê wê were wê ji vê rewşa biêş xelas bike û bigihêje miradê xwe. Lewre di vê rêza “Lê lê wez ê li bextê we û Xwedê de / Ciwabekî bidin lawikê min evdalê Xwedê” de dubare bangî diya xwe dike û ji Xwedê lava dike haya dilketiyê wê jê hebe ku tiştê bike ji bo xwe û wê. Lêbelê Sêvê bi peyva “evdalê Xwedê” li xwe mikur tê ku dilketiyê wê yekî reben e ku tu tişt ji dest nayê. Ango “evdal” weke mecazî îfadeya perîşanî, rebentî, hejarî û belengaziyê ye.

Zewaca bi zorê ji bo keçekê bi mirinê re hemwate ye. Lewre li aliyekî zewaca bédil û li aliyê din negihaştina wê û hezkiriyê wê bûye weke mirina wê. Ji ber vê sedemê êş û kesera dilê wê vê gotina “ez ê mirim” bi wê dide gotin. Lewre ev rewşa ku tê de ye ji halê mirinê ne cudatir e ji bo Sêvê. Ji destpêka kilamê heta dawiya wê gaziya keçekê heye ku nagihêje tu kesî. Di çarçoveya zayenda civakî de heke nirxandinek bê kirin di seranserê kilamê de bîndestîya jinê xwe dide der.

#### **3.2.2.14. Kilama Bêmal**

Bêmalê dîne li te şevgerê li min xaftê

Hawar li şevgerê li min xaftê

Li ser serê min û bejna bilind tavekî barana hûr tê

Wez ê nadim terka bejna bilind çavê reş û belek

Heta serê min bikevê li ser darê vê tabûtê

Ax Rebî Rebî ax Rebî rebî oy oy oy

Bêmalê dînê sibe ye roj derketî ji aliyê Bota

Rebî sibe ye roj derketî ji aliyê Bota

Tavê dabî bedena Diyarbekira şewitî qîzan û xorta

Xwezî miradê min û bejna bilind hasil bibiya

Min ê kirasê ber bedena xwe ....? ax eman eman

Ax Rebî megrî megrî tu delalî

Hawar çavê reş û belek

Ji kilê Sibhanî meke xalî

Eman tu bimirî tu ya erdî tu bimînî

Tu ya canê min î helal malî ax eman eman <sup>25</sup>

Ji gotinên kilamê xuyaye ku ev kilam ya herêma Botan e. Di navenda kilamê de evîneke xurt ya jineke têkoşer heye. Di vê çarçoveyê de kilama “Bêmal” kilameke evînê ye û temaya wê negihaştin û bêmirazî ye. Kilam ji devê jinê ve tê gotin. Vebêjera kilamê lehenga kilamê bi xwe ye ku hîsên xwe yên evînî bi lêv kirine.

Ji kilamên din cudatir ji bo lehenga vê kilamê dikare bê gotin xwedî giyanekî têkoşer e. Her çend ku li dij evîna lehenga kilamê çî astengî hebin jî bi biryardar e ku ji xeynî mirinê dilketiyê xwe bi dest bixe. Weke cudatiyeke din ku derdikeve pêş me lavakirina keça evîndar ji Xweda ye ku xwe tenê spartiyê Xwedê. Em vê dikarin wiha şîrove bikin ku leheng wisa bawer dike ku bi duayan wê miradê wê û hezkiriyê wê hasil bibe. Ev jî nîşaneyê bibiryardariya leheng e.

Leheng di destpêka kilamê de bi îfadeya “Bêmal” weke mecazî bêwarbûn û bêxwedîbûna xwe bilêv dike. Lewre ji bo leheng cih û warê wê dilê evîndarê wê ye.

---

<sup>25</sup> Ev kilam ji vê çavkaniyê (<https://www.youtube.com/watch?v=9Sn5WI-SQRA>) bi navê “Bejna Bilind” hatiye guhdarîkirin. Wekî din ji pirtûka *Miryem Xan* sûd hatiye wergirtin ku navê kilamê di wir de wek “Bêmal” derbas dibe.

Heta ku negihêje dilketiyê xwe ew xwe weke keseke bêmal dibîne. Çi wext ku bigihêje miradê xwe wê demê dê niştecih bibe. Di heman demê de leheng bi vê îfadeyê bêçarebûna xwe jî nîşan dide ku li hember evîna xwe bêçare ye.

Hêmaneke din ku îfadeya dilêşî û bêçarebûna lehenga kilamê ye têgeha “hawar” e ku di kilamên hizinê de ji bo bobelatên mezin tê emilandin. Di vê kilamê de jî leheng negihaştina xwe û dilketiyê xwe weke bobelateke mezin dibîne û dike qêrîn ku çareyek ji bo derdê wê bê dîtin. Lê ev arîkarî bi gotina “Rebî Rebî ax” tenê ji Xweda tê xwestin ku li jor jî hat şîrovekirin bi lavakirina ji Xwedê leheng wisa bawer dike ku dê bigihêje miradê xwe. Ango bibiryardariya leheng hêza xwe ji hêviya wê werdigre.

Di evînên gelek xurt de dilketî bi gelemperî tiştê xwe yê herî biqîmet qewl dike da ku bigihêje miradê xwe. Di vê kilamê de jî leheng bi gotina “Min ê kirasê ber bedena xwe” ve dixwaze îfade bike ku ji bo dilketiyê xwe amade ye ku ji hemû malê dinê bêpar bimîne bes ku miradê wê hasil bibe. Xuyaye ku leheng zû bi zû dev ji vê têkoşîna xwe bernade.

Ji destpêka kilamê heta dawiya wê bibiryardariya leheng bi awayekî eşkere xwe dide der. Lewre ji her gotineke leheng em jineke ku tu carî xwe teslîmî astengiyên li ber evîna wê ne nake, dibînin. Tevahiya kilamê ji axaftineke xwe bi xwe ya leheng pêk tê. Ji rêzên dawî yê kilamê em dibînin ku leheng xwe teselî dike û detsnîşan dike ku heta dilketiyê wê sax be dê yê wê be. Ev hemû îfade nîşaneyê evîneke xurt û jêneveger ya lehenga kilamê ye.

### **3.2.2.15. Kilama Eman Sêva Minê**

Eman eman eman eman ax ax eman

Eman ax eman eman jaro dilo oy ay ax

De eman eman perçem hûrê ay

Eman eman keçikê dînê sêva min ê ax

Ax lê tu xanim î wele çima li bin siha kon ax

Ax lê naqedimî lê lê heke tu wê jina bimêr î

Çima tu maşûq e ax dilê min î ax

Eman eman xerîbo dilo oy ay ay ax

Eman eman keçkê dînê kanîka gundê me ax ax lê

Kevz girtî jaro dilo ay ax ax lê

Lê lê wez û Sêvê rûniştîne me ji xwe re ax ax lê sohbet girtî ax

Lê lê memikê te ...?

Mîna tirihê ...? ax lê xwenav girtî<sup>26</sup>

Kilama “Eman Sêva Minê” kilameke bengîtiyê ye ku ji aliyê cureyê edebî ve lîrîk e. Temaya kilamê negihaştin e. Berevajî kilamên din ên evîne ku vebêjerên van kilaman piranî jin bûn di vê kilamê de weke vebêjer mêr derdikeve pêş. Lehengê kilamê evîna xwe ya ji bo hezkiriya xwe bi axaftîneke hundirîn ve ango bi bangewaziyeke bêdeng bi lêv kiriye ku di kilamên Meryem Xanê de em pir caran rastî ve taybetmendiye tên.

Em dikarin bêjin ku kilam ji destpêkê ve heta dawiya wê bi baneşanên trajîk ve ku têra xwe hizinê dihewînin weke “ax lê, ay, oy” ê ve dewam dike. Derbarê çîroka kilamê de ku em ji gotinên kilamê “Ax lê tu xanim î wele çima li bin siha kon ax / Ax lê naqedimî lê lê heke tu wê jina bimêr î” xwe digihênin hin zanyariyan em dikarin bêjin ku lehengê kilamê dil xistiye jineke bimêr ku ev jin jî jineke koçer e. Lê leheng tevî ku dizane ev jin bimêr e jî bi vê rêzê “Çima tu maşûq e ax dilê min î ax” li xwe mikur tê ku çima ji jineke bi mêr hez dike. Ji vê lixwemikurhatinê em dikarin vê encamê derxînin ku ev evîn evîneke pir bihêz e ku pêşî li ber nayê girtin.

Ev kilam jî weke gelek kilamên din yê Meryem Xanê bi gotin û baneşanên trajîk ve hatiye hûnandin. Wek taybetiyeke hevpar ya kilamên hizinê ku piranî di destpêka van kilaman de derdikeve pêşiya me bangewaziya mîna “eman” kurtasiya

---

<sup>26</sup>Ev kilam ji vê çavkaniyê (<https://www.youtube.com/watch?v=yLe90PqHVdc>) hatiye guhdarîkirin û ji bo tekûzîkirinê ji pirtûka *Miryem Xan* sûd hatiye wergirtin.

dramatîkbûna kilamê ye. Gotina “eman” ku berê jî di gelek kilaman de îzahata wê hatiye kirin îfadeya medetxwestin û bangeweziya lehengê kilamê ye. Leheng li dij êşa dilê xwe ji dilketiya xwe arîkariyê dixwaze ku derd û kulên dilê wî kêmbike. Lewre ev gotina “eman perçem hûrê” vê şîroveya me piştrast dike.

Di berdewamiya kilamê de em rastî gotina “eman dilo jaro” tên ku vebêjer rewşa dilê xwe ew bi xwe îzah dike û ketiye rewşeke perîşan, bêçare û bêhêz. Behsa êş û jarbûna dilê xwe dike ku leheng ketiye derdê evîneke nepêkan. Dikare bê gotin ku lehengê kilamê bi dilê xwe re ketiye axaftinê û ji bo xema dilê xwe li pey çareyekê ye.

Hêmaneke din ku di kilamên evîniyê de cî digire hêmana “sêv” e ku sêv sembola xweşîkbûn û evînê ye. Ji ber vê sedemê lehengê kilamê bi gotina “sêv” ê bangî dilketiya xwe dike ku di piraniya kilamên dengbêjiyê de dilketî hezkiriya xwe dişibîne sêvê. Em dikarin vê şibandinê weke pesindayînê jî şîrove bikin ku di nav gel de jî ji bo keçên xweşîk gotina “sûretê wê sorgewez e weke sêvê” pir caran ji bo pesindayînê tê bikaranîn. Di kilaman de jin bi gelek nasnavên weke qaz, kewê û sêvê hatine binavkirin.

Di vir de hêjayî gotinê ye ku di serdemên berê de di nav kurdên Hewremanê de dema ku du malbatên nelihev lihev dihatin sêvên sor diyarî hevdu dikirin ku sêv îfadeya berdewamiya aştiyê bû. Herweha evîndaran ji bo ku hezkirina xwe nîşanê hev bidin sêvên biqurneflê xemilandî ango “sêva mîxekrêj” diyarî hev dikirin. Îro jî hêj di nav kurdên Îranê de di roja evîndaran de dilketî sêva mîxekrêj diyarî hev dikin. Ji bo vê yekê “sêv” îfadeya gihastin, bextewarî, evîneke bêdawî, lihevkirina du dilan û hwd. Wekî din dikare bê gotin ku di nav kurdan de navê gelek jinan “Sêvê” ye ku ev nîşaneyê girîngiya motîfa “sêvê” ye di zargotina kurdî de.

Ji vê rista kilamê “Ax lê tu xanim î wele çima li bin siha kon ax” me gotibû em xwe digihênin wê agahiyê ku hezkiriya leheng jineke koçer e. Lewre bi gelemperî ji gotina “kon” em koçberiyê fam dikin. Em dikarin vê îfadeyê wiha şîrove bikin ku leheng heyfa xwe pê tîne ku xanimeke wisa ku ji bo wî gelekî taybet e çawa di bin kon de dijî. Hezkiriya xwe layiqî tiştê herî xweş dibîne ku îfade dike di dilê xwe de cî daye wê.

Hêmaneke din ku di nava xwe de hesta xembariyê dihewîne ku derdikeve pêş me “eman xerîbo dilo” ye ku lehengê kilamê ji ber êş û kesera dilê xwe, dilê xwe dişibîne xerîban. Dilê xwe bi xwe dişewitîne ku ji ber perîşanî û belengaziyê êdî dilê xwe nas nake. Bi giştî dikare bê gotin leheng ji bo îfadekirina xem û kesera nav dilê xwe rewşa dilê xwe dişibîne rewşa kesên ku li xerîbiyê dijîn.

Di kilamên bengîtiyê de motîfa “memik”an cihekî taybet digire. Weke ku tê zanîn di kilamên dengbêjiyê de erotîzm û zayendîtî temayeke sereke ye. Lehengê kilamê heke mêr be bedena jinê bi berfirehî teswîr dike ku gelek caran memikên jinê dişibîne sêv, porteqal, hinar û tirî ku di vê kilamê de leheng memikên hezkiriya xwe şibandîye tirî. Bi vî awayî leheng bedena hezkiriya xwe bi şibandina herî xweşik teswîr dike.

### **3.2.2.16. Kilama Tirsim Bimrim Dilo Heyran**

Tirsim ez bimrim dilo heyran li vê payizê delalo li vê payizê

Tirba min çêkin dilo heyran li biniya guzê delalo li biniya guzê

Wez ê ramûsim dilo heyran sê biskê qîzê delalo sê biskê qîzê

Tirsim wez bimrim dilo heyran li vê biharê delalo li vê biharê

Tirba min çêkin dilo heyran li biniya darê delalo li biniya darê

Wez ê ramûsim dilo heyran sê biskê yarê delalo sê biskê yarê<sup>27</sup>

Temaya vê kilamê negihaştin e. Cureyê edebî yê kilamê lîrîk e. Kilam li ser evînê ye. Di vê kilamê de hestên hevpar yê herdu zayendan dertê pêş me. Ango em nikarin bêjin ku ev hest tenê ji aliyê zayendekê ve hatiye bilêvkin. Herweha hestên du zayendan bo negihaştinê hatine bilêvkin. Çîroka vê kilamê tune ye. Tenê tirsî negihaştina du zayendan hatiye bilêvkin. Di seranserê kilamê de axaftineke xwe bi xwe dertê pêş. Geh ev kes dibe mêr geh dibe jin.

---

<sup>27</sup> Ev kilam ji vê çavkaniyê ([https://www.youtube.com/watch?v=70\\_j0Ukww74](https://www.youtube.com/watch?v=70_j0Ukww74)) hatiye guhdarîkirin û deşîfrekirin.

Di destpêka kilamê de hizin xwe dide der. Demsala payizê ku weke hêmanekê hizinê dertê pêş me îfadeya xemê, hizinê, negihaştin, mirin û bêhêvîbûnê ye. Herweha em dikarin wiha şîrove bikin ku piştî payizê demsala herî dijwar zivistan tê. Bo vê sedemê hezkirî “payiz”ê weke destpêka şert û mercên dijwar dibîne. Ango hezkirî payizê weke negihaştina xwe hezkirîya /ê xwe dibîne.

Di berdeyama kilamê de gotina “tirbê” derdikeve pêş me ku tirb mirinê tîne hişê mirov. Lêbelê em vê îfadeyê dikarin wiha şîrove bikin ku di vira de vebêjer negihaştin şibandiye mirinê. Herweha hezkirî ditirse ku negihêje miradê xwe. Lewra negihaştin ji mirinê jî xirabtir dibe bo hezkirîyan. Herweha di her rêzikek kilamê de tirsê negihaştinê ya herdu zayendan derdikeve pêş me.

### **3.2.2.17. Kilama Ereb Şênî**

Ax şênî şênî ereb şênî tu wê kêlê dikenî lê min dixapînî

Wele li min rebenê çav û birhê belek li kê dişkênî oy oy ax

Ax şênî gundê me gundê lê mûntezî ne oy oy ax

Wele bejna zirav meşîya bi misîna lêbikimê oy

Yekî weke keleş gewra lê min tunebû oy oy

Ax tu bigerî nav wezîra li nav hakima oy oy

Ax şênî bejna zirav dît û li ser xanî ye

Wele min ê bi sê denga gazî kirê lê bi erebiyê

Ax dibê wê li min veğerandî ezmanê lê ermeniyê

Yekî weke keleş gewra lê min tunebû

Ax digerî nav heft dewletê lê wez nebiya

Ereb şênî keçikê dînê kêlê dikenî lê min dixapînî

Wele ...? mi rebenê çav û birhê belek li kê dişkênî<sup>28</sup>

Kilama “Ereb Şênî” kilama bengîtiyê ye. Çeşnê edebî yê kilamê lîrîk e. Temaya kilamê negihaştin e. Kilam ji devê mêr ve hatiye gotin. Di navenda kilamê de evîna xortekî heye ku wisa xuya ye ev evîn evîneke yekalî ye. Lewre dema em xwe dispêrin gotinên kilamê vebêjer ku mêr e gazine xwe bilêv dike ku hezkiriya wî, wî dixapîni. Ji ber hindê em dikarin vê evîne weke evîneke bêbersiv şîrove bikin.

Taybetmendiya herî girîng ya kilamên hizinê ew e ku ji aliyê nalînan ve dewlemend in. Bi gelemperî kilam bi van nalînan ve dest pê dikin. Dengbêj bi van nalînan guhdaran ji bo çîrokeke xembar amade dike. Lewre ji nalînen destpêka kilamê guhdar dizanin ku dê li çîrokeke xembar guhdarî bikin. Kilama “Ereb şênî” jî bi nalînen weke “ax, oy”ê dest pê kiriye ku ev îfadeyên hizinê ne.

Ji hemanên hizinê yek jî qalibê “reben”e ku îfadeya belengazî, bêçarebûn û perîşantiyê ye. Evîndar dema ku ji bo evîna xwe bêçare be û tu tişt ji dest neyê xwe weke reben dibîne. Evîndar bi îfadeya “reben” ve dilê xwe bi xwe dişewitîne ku ketiye nav derdekî bêçare.

### **3.2.2.18. Kilama Te Dibînim Te Nabînim**

Te dibînim te nabînim

Oy oy oy oy oy oy oy oy

Te dibînim te nabînim

Yar yar yar yar yar yar

Dest gerdenê ez wer tînim

Oy oy oy oy oy oy oy oy

Dest gerdenê ez wer tînim

Yar yar yar yar yar yar

---

<sup>28</sup> Ev kilam ji vê çavkaniyê (<https://www.youtube.com/watch?v=pCbrsAYk1dk>) hatiye guhdarîkirin û bi vî şikilî hatiye tekûzîkirin.

Te ji dê û bavan distînim

Oy oy oy oy oy oy oy oy oy

Te ji dê û bavan distînim

Yar yar yar yar yar yar

Tirsim bimrim nebînim

Oy oy oy oy oy oy oy oy oy

Tirsim bimrim nebînim

Yar yar yar yar yar yar

Rêka Midyadê kaş e

Oy oy oy oy oy oy oy oy oy

Rêka Midyadê kaş e

Yar yar yar yar yar yar

Qutikê Helîm qumaş e

Oy oy oy oy oy oy oy oy oy

Qutikê Helîm qumaş e

Yar yar yar yar yar yar<sup>29</sup>

Strana “Te Dibînim Te Nabînim” di gel ku stranek rîtmîk e bi melodiya xwe û bi naveroka xwe straneke hizinê ye. Çeşnê edebî yê stranê lîrîk e. Di naveroka stranê de tirsî veqetîna hezkirîya leheng heye. Vebêjerê stranê mêr e. Tirs û xofa

---

<sup>29</sup> Ev kilam ji vê çavkaniyê (<https://www.youtube.com/watch?v=f5Q5wadmIhU>) hatiye guhdarîkirin û deşîfrekirin.

xwe ya veqetîna ji hezkiriya xwe bilêv kiriye. Çîroka vê stranê li gorî kilamên din yên Meryem Xanê tune. Di seranserê stranê de tirsî ku ji hezkiriya xwe veqete û tu carî wê nebîne heye. Çawa ku me berê jî gotibû weke taybetmendiyek Meryem Xanê dema çî stranên govendî û çî kilamên dengbêjiyê distrê hizin ji dengê wê dibare.

Ev stran ji bo vê taybetmendiya Meryem Xanê nimûneyek e. Ji ber ku ev stran straneke rîtmîk e her çiqas ji aliyê hêmanên hizinê ve li gorî kilaman lawaz bimîne jî bi melodiya xwe û bi naveroka xwe ve straneke bihizin e. Lewre tirsî mirinê û tirsî veqetîna ya lehengê kilamê hizinê bi mirovan dide hîskirin. Di vê stranê de ji bûyerekê zêdetir em derûniya vebêjer dibînin. Lewre car caran em dibînin ku vebêjer gihaştîye hezkiriya xwe car caran jî bi tirsî e ku bimire û hezkiriya xwe nebîne.

## ENCAM

Dengbêj Meryem Xan ku yek ji veguhêzera hafizeya civakî ya kurd e bi kilamên xwe hafizeya civakekê parastiye û ev hafize gihandiye heta roja îro. Lewre dengbêjan qewimînên civaka xwe yên paşerojê bi kilamkî belav kirine û ev kilam ji ber ku derbarê hemû çanda civaka wan de ye weke belgeyên girîng tînin ji bo civakên xwedî çanda devkî. Civaka kurd ji ber ku civakeke xwedî çanda devkî ye gotin û çîrok pir girîng hatine dîtin. Di vê çarçoveyê de kilamên dengbêjan ji bo civaka kurd xwedî nirxeke mezin e.

Me jî ji bo vê xebata xwe biryar da ku li ser kilamên Meryem Xanê rawestin. Têkildarî kilamên Meryem Xanê pêşî bi giştî behsa çanda devkî û hafizeya kolektîf hatiye kirin ku kilamên dengbêjiyê di heyameke çawa de hatine afirandin û ji bo civakekê girîngiya wan baş bê famkirin. Lewre hin dengbêj bi perwerdehiyê ango bi rêbaza hosteyî-şagirtî hin dengbêj jî weke Meryem Xanê bi hewla xwe ev pîşe îcra kirine.

Meryem Xan ji dengbêjên din cudatir li derdoreke teng ango li dawet û di şevbihêrkên ku ji hevalên Meryem Xanê pêk dihatin, hunera xwe pêşkêş kiriye. Helbet radyoya Bexdayê bo pêşkêşîya hunera Meryem Xanê dibe xala herî girîng. Lewre deng û awaza wê li çar hêlên Kurdistanê bi saya radyoya Bexdayê belav dibe. Her wiha em dikarin bêjin ku pêşkêşîya hunera Meryem Xanê ku bi rêbazeke modern hatiye kirin wê ji dengbêjên din ve diqetîne. Lewre Meryem Xan di civakeke pederşahî de mezin bûye û astengiyên li ber pêşkêşîya hunera wê kir ku Meryem Xan bi rêbazeke wiha hunera xwe pêşkêş bike.

Meryem Xan di seranserê serpêhatiya xwe de tûşî gelek astengî û nexweşîyan hatiye. Ji ber hindê di 45 saliya xwe de ango di temenekî ciwan de jiyana xwe ji dest daye. Di lêkolîna ku me li ser jiyana Meryem Xanê kir me dît ku Meryem Xan jiyaneke bi keser jiyaye. Ev taybetmendiya jiyana wê û civaka ku lê jiyaye Meryem Xan kir jineke bi keser. Bo vê sedemê me jî xwest em di vê xebata xwe de li ser kilamên Meyrem Xanê yên bihizin rawestin.

Di vê xebatê de bi tevahî analîza 25 kilaman hatiye kirin ku tamaya wan “hizin” e. Di kilamên Meryem Xanê de me tespît kir ku Meryem Xan zêdetir li ser êşa evîn û mirinê rawestiye. Gelemperiya kilamên wê yên evînê li ser bêmirazî, bextreşî, bêrikirin, negihaştin û veqetînê ne. Lewre Meryem Xan jî li gorî lêkolîna me du zewac kirine û herdu zewacên wê jî neçûne heta serî. Bo vê em dikarin bêjin ku di her kilameke xwe de Meryem Xan hîsên xwe jî bi lêv kirine.

Meryem Xan di kilamên xwe de piranî li ser pirsgerêkên jinên civaka bavixsalarî ku rastî qedexeyan an fişaran hatine rawestiyaye. Di kilamên wê de zêdetir evînên ku civakê destûr nedaye yan civak li dij van evînan derketiye derdikeve pêş. Ji ber hindê evînên di kilamên wê de yan evînên nîvcoyîmayî ne yan ev evîn bi dûmahîkek trajîk ve qediyane. Bo vê sedemê ji bo Meryem Xan em dikarin bêjin ku di hemaya xwe de jineke bihişmend bû ku bi taybetî ev kilam hîlbijartine da ku van pirsgerêkan bîne ziman û bibe dengê jinên belengaz.

Wekî din di kilamên Meryem Xanê de em rastî kesayetên mezin ên dîrokî weke Bavê Koroxlî, Cembelî Mîrê Hekaryan, Bişarê Çeto û Mihemed Selîm tên ku navê xwe di dîrokê de nivîsîne. Ev kilamên ku li ser van kesayetên dîrokî hatine gotin jî kilamên şînê ne. Lewre ji mîrxasiya wan zêdetir li ser mirina wan an kuştina wan ev kilam hatine gotin. Her wiha Meryem Xan di kilamên xwe de li ser nîrxên civaka xwe sekiniye û ev nîrx bi kilamên xwe gihandiye heta roja îro.

Dema em hin kilamên Meryem Xanê bi hin varyantên din yên dengbêjên din berawird dikin tê dîtin ku kilamên Meryem Xanê li gorî van gohertoyan pir kurt in. Her çend ku kilamên dengbêjiyê pir dirêj in guhertoyên ku Meryem Xanê distrê weke “Cembelî Mîrê Hekaryan, Mala Faro, Bavê Wemîn, Bavê Koroxlî” kurt in. Ji ber hindê di kilamên Meryem Xanê de hûrguliyên bûyera çîrokan kêr in.

Di hin kilaman de jî navên lehengan ne diyar in. Ango nayê zanîn ku kilam li ser kîjan lehengî ve hatiye gotin. Di hin kilaman de jî navên lehengan hatine guherîn. Em dikarin weke taybetmendiyên kilamên Meryem Xanê van xalan rêz bikin. Taybetmendiyek dengbêjên Botî ji dengbêjên Serhedê ew e ku di kilamên xwe de amûrên mûzîkê bi kar tînin. Meryem Xan jî ji ber ku dengbêjeke Botî ye di kilamên xwe de amûrên mûzîkê bi kar anîye. Dengbêj Meryem Xan weke hunermendeke jin tevî gelek astengî û qedexeyan bi hunera xwe dengê xwe gihandiye heta roja îro.

## ÇAVKANÎ

- Akgül, H. (2016). Yanlızlık Duygusu ve Ölçümü. *Sosyal Bilimler Dergisi*, 9, 273-289.
- Alakom, R. (2009). *Di Folkloru Kurdî de Serdestiyeke Jinan*. İstanbul: Avesta.
- Alan, R. (1997). Kürt Halk Şarkıları İçin Küçük Bir Poetika. *Kovara War*, 2, 11-33.
- Al-Salihî, Dr. N. (2002). Kürdistan'da Müzik. *Kürt Müziği Dansları ve Şarkıları: Müzik, Dans û Şarqiyên Kurdî*. Mehmet Bayrak (Edt.), 143-203. Ankara: Özge.
- Amêdî, S. B. (2013). *Folkloru Kurdî*. İstanbul: Lîs.
- Aras, A. (2007). Kilama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê. *Kovara Bîr*, 7, 228-244.
- Aras, A. (2009). *Serhildana Berazan û Seyidan*. İstanbul: Weşanên Perî.
- Arslan, M. (2004). Hüznün Sesi: Meryem Xan, *Gündem Kadın*.
- Asmann, J. (2018). *Kültürel Bellek, Eski Yüksek Kültürlerde Yazı Hatırlama ve Politik Kimlik*, Ayşe Tekin (Çev.). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Beğik, M. (2018). *Reso Şahê Dengbêjan*. İstanbul: Nûbihar.
- Bender, Dr. Cemşid. (1995). *Kürt Tarihi Ve Uygarlığı*, İstanbul: Kaynak Yayınları.
- Christine, A. (2013). Folklor ve Fantezi: Kürt Sözlü Geleneğinde Kadınların Sunumu, Devletsiz Ulusun Kadınları, Sehzad Mojab (Edt). F. Adsay, S. Kılıç, E. Uşaklı (Çev.). İstanbul, Avesta, 245-264.
- Connerton, P. (2019). *Toplumlar Nasıl Anımsar*, Alaeddin Şenel (Çev.). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Çiftçi, T. (2014). *Kilam û Jin*. İstanbul: Nûbihar.
- Demirer, H. (2008). *Ha Wer Delal; Emînê Perîxanê'nin Hayatı*. İstanbul: Avesta.

- Dêreşî, S. (1998). Stirana Miryemxanê: Were Domam. *Kovara Huner*, Hej. 1, 62-64.
- Emirođlu, G. & Aydın, S. (2003). *Antropooji Sözlüğü*. Ankara: Bilim ve Sanat Yayınları.
- Erbay, V. (2012). *İnatçı Bir Bahar*. İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Erol, Z. & Sağır, F. G. (2017). *Aşk Psikolojisi*. İstanbul: Timaş Yayınları.
- Erol, Z. (2018). *Yalnızlık Psikolojisi*. İstanbul: Timaş Yayınları.
- Guliyeva, G. V. (2012). Türk Kültüründe Göç ve Türkçemizde Göç Anlayışlı Kelimeler, Prof. Dr. Ali Duymaz (ed.), Halk Kültüründe Göç Uluslararası Sempozyumu, İstanbul, Motif Vakfı Yayınları, 402-407.
- Gültekin, M. (2013). *Zargotina Kurdên Serhedê; Kilam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mêrxasî û Serhildanan*. İstanbul: Avesta.
- Gültekin, M. (2015). Dengbêjên Herêma Serhedê. *Folklor Kurdan*, 1, 17-29.
- Güvenç, B. (2018). *İnsan ve Kültür*. İstanbul: Boyut.
- Katar, D. Y. (2011). *Kürt Sözlü Kültüründe Kadın Dengbêjler: Ayşe Şan ve Meryem Xan*. Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Lefkoşa: Yakın Dođu Üniversitesi.
- Kemal, Y. (1993). *Ađıtlar*. İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.
- Keskin, N. (2016). *Müzik, Anlatı, Kimlik: Tûr-Abdin'de Bir Anlatım Biçimi Olarak Mıtrıplık*. Ankara: Gece Kitaplığı.
- Kevirbirî, S. (2002). *Filîtê Quto*, Stockholm: Nefel.
- Kevirbirî, S. (2009). *Sedsala Qêrînekê; Karapetê Xaço*. Şerif Derince (Wer.). İstanbul: Weşanxaneya Do.
- Mendeş, H.B. (2019). *Meryem Xan; Hayatı, Sanatı ve Şarkıları*. İstanbul: Avesta.
- Meretowar, A. (2017). *Huseynê Farê*. Diyarbakır: Wardoz.
- Nado, K. (2011). Awaza Xerîbî, Tenêtî, Huzn û Kederê; Meyrem Xan. *Kovara Pêngav*, Hej. 6, 5-12.
- Nezan, K. (2002). Kürt Müziđi. *Kürt Müziđi Dansları ve Şarkıları: Mûzîk, Dans û Şarqiyên Kurdî*. Mehmet Bayrak (Edt.), 51-60. Ankara: Özge.
- Nezan, K., Izady, M. R., Tatsumura, A., Mutlu, E., Poche, C., Christensen, D. & Komitas, A. (1996). *Kürt Müziđi*. N. Hasgöl, M. Öztürk, G. Gökçen ve K. Özdemir (Çev.). İstanbul: Avesta.

- Nikitin, B. (2013). *Kürtler; Sosyolojik ve Tarihi İnceleme*. Hüseyin Demirhan, Cemal Süreya (Çev.). İstanbul: Deng Yayınları.
- Ong, W. J. (2014). *Sözlü ve Yazılı Kültür*. Sema Postacıoğlu Banon (Çev.). İstanbul: Metis Yayıncılık.
- Oremar, K. (2004). 100 Saliya Jidayikbûna Meryem Xanê Pîroz Be. *Kovara Hîwa*, 111, 8-9.
- Oremar, K. C. (1998). Stêrka Geşa Ezmanê Huner û Muzîka Kurdistanê; Miryem Xan (1904 – 1947), *Kovara Huner*, 2, 6-14.
- Parlıtı, A. (2006). *Dengbêjler Sözüün Yazgısı*. İstanbul: İthaki.
- Propp, V. (1998). *Folklor Teori ve Tarih*. Necdet Hasgöl, Tolga Tanyel (Çev.). İstanbul: Avesta.
- Poche, C. (2002). Kürt Müziği. Kürt Müziği Dansları ve Şarkıları: Müzik, Dans û Şarqiyên Kurdî. Mehmet Bayrak (Edt). 125-126. Ankara-Özge
- Samur, A. (2015). *Destana Zembîlfiroş û Gulxatûn*. İstanbul: Nûbihar.
- Sancar, M. (2016). *Geçmişle Hesaplaşma, Unutma Kültüründen Hatırlama Kültürüne*. İstanbul: İletişim Yayınları.
- Sanders, B. (2017). *Öküzün A'sı, Elektronik Çağda Yazılı Kültürün Çöküşü ve Şiddetin Yükselişi*. Şehnaz Tahir (Çev.). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Schafers, M. (2016). Utançtan Kamusal Sese Kadın Dengbêjler, Acının İşlenişi ve Kürt Tarihi. E. Öpengin (Çev). *Kürt Tarihi Dergisi*, 26, 24-29.
- Şen, B. (2016). *Devlet Piyasa Parti*. İstanbul: Avesta.
- Uluç, A. Vahap. (2007). *Güneydoğu Anadolu Bölgesinin Toplumsal ve Siyasal Yapısı: Mardin Örneği'nde Siyasal Katılım*. Yayınlanmamış Doktora Tezi, İstanbul: İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.
- Ulugana, S. (2016). "Dengbêjler Şahı" Reso, *Kürt Tarihi Dergisi*, 26, 38-43.
- Uslu, A. (2017). Nalan Barbarasoğlu'nun Hikâyelerinde Biçim Olarak Melankoli, *Akademik Bakış Uluslararası Hakemli Sosyal Bilimler E-Dergisi*. 60. Sayı. 350-366.
- Xoşnaw, C. M. & Hesen, C. C. (2006). *Miryem Xan*. Hewlêr: Enstîtuyê Kelepûrî Kurdistan.
- Yaş, Z. (2015). *Şakarên Muzîka Kurdî*, (Cilda 1.) Diyarbakır: Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê.
- Yıldız, A. & Taşkın, H. (2018). *Şakiro*. İstanbul: Nûbihar.

## Çavkaniyên Elektronîk

Ay Delal. [https://www.youtube.com/watch?v=70\\_j0Ukwg74](https://www.youtube.com/watch?v=70_j0Ukwg74) 07.11.2019

Baran Barî. <https://www.youtube.com/watch?v=pCbrsAYk1dk> 10.11.2019

Baran Barî. <https://www.youtube.com/watch?v=WGA9PFzVTX4> 29.11.2019

Bavê Wemîn.

[https://www.youtube.com/results?search\\_query=bave+emin+meryem+xan](https://www.youtube.com/results?search_query=bave+emin+meryem+xan)  
17.09.2019

Bejna Zirav.

[https://www.youtube.com/results?search\\_query=bejna+zirav+meryem+xan](https://www.youtube.com/results?search_query=bejna+zirav+meryem+xan)  
15.10.2019

Bêmal/Bejna Bilind. <https://www.youtube.com/watch?v=9Sn5Wl-SQRA>  
15.01.2020

Binevşa Narîn û Cembeliyê Çolêmerg.  
<https://isiszilan.tumblr.com/post/50599133960/binev%C5%9Fanar%C3%AEn-%C3%BB-cembel%C3%Aey%C3%AA-%C3%A7ol%C3%AAmerg> 16.10.2020.

Cembelî. [https://www.youtube.com/results?search\\_query=cembeliyomeryem+xan](https://www.youtube.com/results?search_query=cembeliyomeryem+xan)  
05.10.2019

Derdo.

[https://www.youtube.com/results?sp=mAEB&search\\_query=derdo+meryem+xan](https://www.youtube.com/results?sp=mAEB&search_query=derdo+meryem+xan) 10.10.2019

Edlê. <https://www.youtube.com/watch?v=YRg4JNd61gg> 20.11.2019

Eman Sêva Minê. <https://www.youtube.com/watch?v=yLe90PqHVdc> 25.10.2019

Emînê Perîxanê'nin Hayatî. <http://www.batmansonsoz.net/haber/11314/emin-perixan-nin-hayati> 16.09.2019.

Emînê. <https://www.youtube.com/watch?v=Y2uDedSTwaI> 10.12.2019

Erivan ve Bağdat Radyoları. <https://www.mirbotan.com/candi-gisti/61979-erivan-ve-bagdat-radyolari.html> 19.09.2019.

Geleneksel Kürt Müziğine Genel Bir Bakış.  
<http://www.kardesturkuler.com/paylasim/28eylul2006.htmberhevkar>.  
25.07.2019.

Gulê Wey Nar. <https://www.youtube.com/watch?v=qMBhajgVBcU> 25.11.2019

- Günün Kadını: Meryem Xan. <https://ekmekvegul.net/sectiklerimiz/gunun-kadini-meryem-xan>, 19.08.2019.
- Halk Şiirlerinde Gurbet Teması. <https://on5yirmi5.com/kultur-sanat/edebiyat/halk-siirlerinde-gurbet-temasi/> 11.02.2020.
- Hêlî Delal/Mihemed Selîm Zavaî Taze.  
[https://www.youtube.com/results?search\\_query=heli+delal+meryem+xan](https://www.youtube.com/results?search_query=heli+delal+meryem+xan)  
20.09.2019
- <https://tr.glosbe.com/tr/ar/h%C3%BCz%C3%BCn> 27.02.2020.
- Lê Lê Weso. <https://www.youtube.com/watch?v=OTkc5kQBog> 22.11.2019
- Lo Siwaro. [https://www.youtube.com/results?search\\_query=siwaromeryem+xan](https://www.youtube.com/results?search_query=siwaromeryem+xan)  
30.09.2019
- Lorkê. <https://www.youtube.com/watch?v=xCePCuZ8TPk> 10.01.2020
- Mala Faro. [https://www.youtube.com/results?search\\_query=mala+faromeryem+xan](https://www.youtube.com/results?search_query=mala+faromeryem+xan)  
25.09.2019
- Müzisyen Meryem Xan Kimdir?.  
<https://mehmetayaz.blogspot.com/2010/03/meyremxan-kimdir.html>  
16.09.2019.
- Qesra Baxemsê.  
[https://www.youtube.com/results?search\\_query=qesra+baxemse+meryem+xan](https://www.youtube.com/results?search_query=qesra+baxemse+meryem+xan) 22.09.2019
- Te Dibînim Te Nabînim. <https://www.youtube.com/watch?v=f5Q5wadmIhU>  
13.11.2019
- Ülkesini Ruhunda, Aşkını Sesinde Taşdı: Meryem Xan.  
<http://gazetekarinca.com/2017/08/ulkesini-ruhunda-askini-sesinde-tasidi-meryem-xan/> 16.09.2019.
- Weyla li Min Xerîbê.  
[https://www.youtube.com/results?search\\_query=weyla+li+min+xeribe+meryem+xan](https://www.youtube.com/results?search_query=weyla+li+min+xeribe+meryem+xan) 03.11.2019
- Xum Xumê. <https://www.youtube.com/watch?v=t0AOU2DKMc4> 05.01.2020
- Yar Gewrê. <https://www.youtube.com/watch?v=BwRN9AHbSd0> 08.10.2019
- Zembîlfiroş.  
[https://www.youtube.com/results?search\\_query=zembilfiro%C5%9F+meryem+xa](https://www.youtube.com/results?search_query=zembilfiro%C5%9F+meryem+xa) 17.10.2019

### **Çavkaniyên Zindî**

Abdulbaqî Unal, (2019). 61 salî, Muş, *Hevpeyvîn*.

Berekat Ozmen, (2019). 65 salî, Dîyarbekir, *Arşîva Taybet ya Kilaman*.

Cemile Koçhan, (2019). 63 salî, Mêrdîn, *Hevpeyvîn*.

Dengbêj Salihê Qubînî, (2020). 71 salî, Êlih, *Hevpeyvîn*.

Zeyneb Yaş, (2019). 46 salî, Amed, *Hevpeyvîn*.

**PÊVEK: KILAMÊN MERYEM XANÊ YÊN LI  
DERVEYÎ TEMAYA HIZINÊ**

**1. Edlê**

Edlê rabe sibe ye wey

Şinyê rabe sibe ye

Tîrq û tîrqa derge ye way

Li çaxê û nimêja te ye

Mala Edlê li zîro way

Mala Şinyê li zîro

Lê da bakî xefîro

Lê da bacê xefîro

Derdê Edla mi giran e

Da ser derdê xezîro

Derdê Şinya min giran e

Da ser derdê xezîro

Mala Edlê li gundiko

Mala Şinyê li gundiko

Lê da bakî honiko

Lê da bakî honiko

Derdê Edla mi giran e way

Da ser derdê kuriko

Derdê Şinya mi giran e way

Da ser derdê kuriko

Ferşê keniye dirêje way

Ferşê wêran dirêje

Edlê li ser kir nimêje way

Şinyê li ser kir nimêje

Baca Edla mi dirêj e

Edlê li ser kir nimêje way

Baca Şinya min dirêj e

Hey rabe û rabe û rabe

De rabe û Edlê rabe

De rabe û rabe û rabe way

De rabe û Şinyê rabe

De rabe û rabe û rabe way

Kopek mêrê xirab e

Mala Edlê li neqebê

Mala Şinyê li neqebê

Lê da bakî xezebê wey

Lê da bakî xezebê

Derdê Edla mi giran e way

Da ser derdê kezebê

Derdê Şinya mi giran e way

Da ser derdê kezebê<sup>30</sup>

## 2. Lê Lê Weso

Lê lê Weso lê lê lê Wesîlayê wey wey

Lê lê Weso lê lê lê Wesîlayê wey wey

Lê lê Wesîm lê lê lê Wesîlayê wey wey

Lê lê Wesîm lê lê lê Wesîlayê wey wey

Te por sorê lê lê lê hine dayê wey wey

Te por sorê lê lê lê hine dayê wey wey

Te por sorê lê lê lê hine dayê wey wey

Teşî rêşêm lê lê lê çû serayê wey wey

Teşî rêşêm lê lê lê çû serayê wey wey

Teşî rêşêm lê lê lê çû serayê wey wey

Teşî rêşêm lê lê lê çû Bexdayê wey wey

---

<sup>30</sup> Ev kilam ji vê çavkaniyê (<https://www.youtube.com/watch?v=YRg4JNd61gg>) hatiye guhdarîkirin û deşîfrekirin.

Mala Weso lê lê lê ji mala wê de wey wey  
Mala Gewrê lê lê lê ji mala wê de wey wey  
Mala Weso lê lê lê ji mala wê de wey wey  
Mala Gewrê lê lê lê ji mala wê de wey wey  
Qirka Weso lê lê lê çil geza zêde wey wey  
Qirka Weso lê lê lê çil gaza zêde wey wey  
Rêka Weso lê lê lê çil gaza zêde wey wey  
Qirka Weso lê lê lê çil gaza zêde wey wey  
Wez ramûsim lê lê lê li mala bavê de wey wey  
Mi divê ramûsim lê lê lê li mala bavê de wey wey  
Mi divê ramûsim lê lê lê li mala bavê de wey wey  
Mi divê ramûsim lê lê lê li mala bavê de wey wey  
Mala Weso lê lê lê li taxa jorî wey wey  
Mala Gewrê lê lê lê li taxa jorî wey wey  
Mala Weso lê lê lê li taxa jorî wey wey  
Mala Gewrê lê lê lê li taxa jorî wey wey  
Qirka Weso lê lê lê mircan û morî wey wey  
Qirka Weso lê lê lê mircan û morî wey wey  
Qirka Weso lê lê lê mircan û morî wey wey  
Qirka Weso lê lê lê mircan û morî wey wey  
Mi divê ramûsim lê lê lê keçika torî wey wey

Mi divê ramûsim wey wey lê keçika torî wey wey<sup>31</sup>

### 3. Mêremê

Mêremê Mêremê wax lê gidiyê Mêremê

Mêremê Mêremê tu lê ciwanê Mêremê

Bîka şahê ecemê tew lê gidiyê û Mêremê

Kaşarê ecemê to lê ciwanê Mêremê

Mêrem têtô ji çiyê de tew lê gidiyê û Mêryemê

Mêrem têtô ji çiyê de to lê ciwanê Mêryemê

Qolana zêra girêda wax lê gidiyê Mêryemê

Qolana zêra girêda to lê ciwanê Mêryemê

Mêryem li mala û bavê de wax lê gidiyê Mêryemê

Mêryem li mala û bavê de to lê ciwanê Mêremê

Mêremê Mêremê tew lê gidiyê û Mêremê

Mêremê Mêremê to lê ciwanê Mêremê

Mêrem hat û çiyayê wax lê gidiyê Mêremê

Mêrem hat û çiyayê to lê ciwanê Mêremê

Qolana zêra girêdayi tew lê gidiyê Mêremê

Qolana zêra girêdayi to lê ciwanê Mêremê

Mêryem li malê tew mayî wax lê gidiyê Mêryemê

---

<sup>31</sup> Ev kilam ji vê çavkaniyê (<https://www.youtube.com/watch?v=OTkc5kJObog>) hatiye guhdarîkirin û ji bo deşîfrekirina vê kilamê ji pirtûka *Miryem Xan* jî sûd hatiye wergirtin.

Mêryem li malê tew mayî to lê ciwanê Mêremê

Mêremê Mêremê tew lê gidîyê û Mêremê

Mêremê Mêremê to lê ciwanê Mêremê<sup>32</sup>

#### **4. Gulşênî**

Gulşênî şênî şênî lê Gulşênîya min mala min

Gulşênî û şênî û şênî Gulşênîya min mala min

Gulşênî done done lê Gulşênîya min emrê we

Gulşênî û şênî û şênî Gulşênîya min mala min

Hatî reza datêne lê kur keçîkê xelkê ne lê

Gulşênî û şênî û şênî way Gulşênîya min mala min

Gulşênî şene şene lê Gulşênî û şênî û şênî lo

Gulşênî û şênî û şênî Gulşênîya min mala min

Hatî reza datêne lê Gulşênî û şênî û şênî emrê min

Kur keçîkê xelkê ne lê Gulşênî û şênî şênî wey

Gulşênî û şênî şênî wey Gulşênîya min mala min<sup>33</sup>

#### **5. Lê Dînê**

Lê dînê lê dînê wax lê dînê lê dînê

Lê dînê lê dînê tew dînê û zalim dînê

Wez dîna çiyakî spî me wax lê dînê lê lê dînê

---

<sup>32</sup> Ev kilam ji arşîva taybet ya Berekat Ozmen hatiye guhdarîkirin û ji pirtûka *Miryem Xan* bo deşîfrasyona vê kilamê sûd hatiye wergirtin.

<sup>33</sup> Ev kilam ji arşîva taybet ya Berekat Ozmen hatiye guhdarîkirin û deşîfrekirin.

Wez dîna çiyakî spî me dînê û zalim dînê  
Hemaîl û birîşîne wax lê dînê lê lê dînê  
Lê dînê lê dînê tew dînê û zalim dînê  
Dosta lawikê kefi me wax lê dînê lê lê dînê  
Dosta lawikê kefi me dînê û zalim dînê  
Lê dînê lê dînê tew dînê û zalim dînê  
Wez dîna çiyakî reş im wax lê dînê lê lê dînê  
Wez dîna çiyakî reş im tew dînê zalim dînê  
Hemaîl û binevşim wax lê dînê lê lê dînê  
Hemaîl û binevşim tew lê dînê zalim dînê  
Lê dînê lê dînê wax dînê û zalim dînê  
Wez dînek çiyakê sor im wax lê dînê lê lê dînê  
Wez dînek çiyakê sor im dînê û zalim dînê  
Hemaîl û textsor im wax lê dînê lê lê dînê  
Hemaîl û textsor im tew dînê û zalim dînê  
Lê dînê lê dînê wax dînê û zalim dînê<sup>34</sup>

## **6. Gulê Wey Nar**

Gulê wey nar wey nar wey narê canê wey nar wey nar wey narê  
Gulê wey nar wey nar wey narê canê wey nar wey nar wey narê  
Gulê memik sêniya savarê canê memik sêniya savarê

---

<sup>34</sup> Ev kilam ji arşîva taybet ya Berekat Ozmen hatiye guhdarîkirin û deşîfrekirin.

Gulê min çavên belek xwarê canê te çavên belek xwar  
Gulê wey nar wey nar wey narê canê wey nar wey nar wey narê  
Gulê mi di bajêr de meyzê kir canê te di bajêr de meyzê kir  
Gulê mi di bajêr de meyzê kir canê te di bajêr de meyzê kir  
Gulê şamqutinî li bejna xwe kir canê şamqutinî li bejna xwe kir  
Gulê şamqutinî li bejna xwe kir canê şamqutinî li bejna xwe kir  
Gulê ya min bû Xwedê nekir canê ya te bû Xwedê nekir  
Gulê wey nar wey nar wey narê canê wey nar wey nar wey narê  
Gulê mi di bajêr de dinêrî canê te di bajêr de dinêrî  
Gulê mi di bajêr de dinêrî canê te di bajêr de dinêrî  
Gulê şamqutinî li bejnê kirî canê şamqutinî li bejnê kirî  
Gulê şamqutinî li bejnê kirî canê şamqutinî li bejnê kirî  
Gulê wey nar wey nar wey narê canê wey nar wey nar wey narê<sup>35</sup>

## **7. Berde**

Ay berde berde berde wey lawo destê min berde oy oy  
Ay berde berde berde kuriko deste ...? min berde  
Ay berde berde berde lo lawo destê min berde  
Ay berde berde berde wey Têmo destê min berde  
Çendî kolan tarî ne wey gund û cîran da ser de

---

<sup>35</sup> Ev kilam ji vê çavkaniyê (<https://www.youtube.com/watch?v=qMBhajgVBcU>) hatiye guhdarîkirin û deşîfrekirin.

Çendî kolan tarî ne gund û cîran dan ser de  
Hay berde berde berde lo lawo destê min berde  
Hay berde berde berde wey Têmo destê min berde  
Çendî kolan tarî ne wey gund û cîran da ser de ay ay  
Çendî kolan tarî ne gund û cîran dan ser de  
Hay berde berde berde Heseno destê min berde  
Hay berde berde berde lawiko destê min berde  
Min dîbû kir fitîlê wey çavreş dî kir fitîlê oy oy  
Eynik danî xemilî eynik danî xemilî  
Hay berde berde berde lo Heseno destê min berde  
Hay berde berde berde lawiko destê min berde<sup>36</sup>

### **8. Kirasê Te Kitan e**

Kirasê te kitan e lê ha wer lê lê ha wer lê lê hawer lê  
Kirasê te kitan e can û can can heyran  
Merîşî jê berdane lê ha wer lê lê ha wer lê lê ha wer lê  
Merîşî jê berdane can û can can heyran  
Kirasê te meles e lê ha wer lê lê ha wer lê lê hawer lê  
Kirasê te meles e can û can can heyran  
Mi dabû li ber meqesê lê ha wer lê lê ha wer lê lê ha wer lê  
Mi dabû li ber meqesê can û can can heyran

---

<sup>36</sup> Ev kilam ji arşîva Berekat Ozmen hatiye guhdarîkirin û deşîfrekirin.

Heçî yara wî tune lê ha wer lê lê ha wer lê lê ha wer lê

...? can û can can heyran

Kirasê te megrûn e lê ha wer lê lê ha wer lê lê ha wer lê

Kirasê te megrûn e can û can can heyran

Hûrik hûrik didirûme lê ha wer lê lê ha wer lê

Hûrik hûrik didirûme can û can can heyran

Heçî yara wî tune lê ha wer lê lê ha wer lê lê ha wer lê

Ji dinyayê mehrûm e can û can can heyran<sup>37</sup>

## 9. Çûme Derya Dadayê

Çûme derya dadayê lê lê lê lê lê lê lê lê lê lê lê

Hatim derya dadayê yar mîro, hekîmo, paşayo, wezîro

Nava beşek radayî de hayê li min de hayê li min de hayê li min

De hayê li min de hayê li min de hayê li min

Fîstan sorê dadayê yar mîro, hekîmo, paşayo, wezîro

Ay lê gidiyê Sidîqe lê lê lê lê lê lê lê lê lê lê lê

Ay lê gidiyê Sidîqe yar mîro, hekîmo, paşayo, wezîro

Fîstan sorê qedîfe lê lê lê lê lê lê lê lê lê lê lê

Fistan sorê qedîfe yar mîro, hekîmo, paşayo, wezîro

Bûka hecî Nayîf e de hayê li min de hayê li min de hayê li min

<sup>37</sup> Ev kilam ji vê çavkaniyê ([https://www.youtube.com/watch?v=qveVu-mN594&list=UUZNMFuKpm\\_J\\_yfacU3Lhx8Q&index=47](https://www.youtube.com/watch?v=qveVu-mN594&list=UUZNMFuKpm_J_yfacU3Lhx8Q&index=47)) hatiye guhdarîkirin û deşîfrekirin.

De hayê li min de hayê li min de hayê li min

Bûka hecî Nayîf e yar mîro, hekîmo, paşayo, wezîro

Çûme derya daxistî lê lê lê lê lê lê lê lê lê lê lê

Hatim derya daxistî yar mîro, hekîmo, paşayo, wezîro<sup>38</sup>

## 10. Girê Sîra

Girê sîra bi nîsk e lê lê lê lê Meyro

Gir xopanê bi nîsk e to lê ciwanê Meyro

Girê sîra bi nîsk e lê lê lê lê Meyro

Gir xopanê bi nîsk e to lê ciwanê Meyro

Va siwara hîsk û hîsk e lê lê lê lê Meyro

Va siwara hîsk û hîsk e to lê ciwanê Meyro

Va siwara hîsk û hîsk e lê lê lê Meyro

Va siwara hîsk û hîsk e to lê ciwanê Meyro

Xweskê Meyro bi lalîsk e lê lê lê lê Meyro

Xweskê Meyro bi lalîsk e to lê ciwanê Meyro

Xweskê Meyro bi lalîsk e lê lê lê lê Meyro

Xweskê Meyro lalîsk e to lê ciwanê Meyro

Girê sîra bi sîr e lê lê lê lê Meyro

Gir Xopanê bi sîr e to lê ciwanê Meyro

---

<sup>38</sup> Ji ber ku qeyda dengê vê kilamê nehat peyda kirin, kilam ji pirtûka *Miryem Xan* hatiye wergirtin û latînîzekirin.

Girê sîra bi sîr e lê lê lê lê Meyro

Gir Xopanê bi sîr e to lê ciwanê Meyro

Va siwara hîr û hîr e lê lê lê lê Meyro

Va siwara hîr û hîr e to lê ciwanê Meyro

Va siwara qîre qîre lê lê lê lê Meyro

Va siwara qîre qîre to lê ciwanê Meyro

Xweskê Meyro wezîr e lê lê lê lê Meyro

Xweskê Meyro wezîr e to lê ciwanê Meyro

Xweskê Meyro wezîr e lê lê lê lê Meyro

Xweskê Meyro wezîr e to lê ciwanê Meyro

Girê sîra bi ci ye lê lê lê lê Meyro

Gir Xopanê bi ci ye to lê ciwanê Meyro

Va siwara hey û heye lê lê lê lê Meyro

Va siwara hey û heye to lê ciwanê Meyro

Va siwara heye heye lê lê lê lê Meyro

Va siwara heye heye to lê ciwanê Meyro

Xweskê Meyro file ye lê lê lê lê meyro

Xweskê Meyro file ye to lê ciwanê Meyro

Xweskê Meyro file ye lê lê lê lê Meyro

Xweskê Meyro file ye to lê ciwanê Meyro<sup>39</sup>

## 11. Narûnê

Dar darûka li nav dara

Narûnê Narûnê Narûna min

Dar darûka li nav dara

Kurtikê rindikê berxika min

Tevşokê dest necara

Narûnê Narûnê Narûna min

Tevşokê dest necara

Kurtikê rindikê berxika min

Çêkin dergûşê yara

Narûnê Narûnê Narûna min

Çêkin dergûşê yara

Kurtikê rindikê berxika min

Çi dara belalûka

Narûnê Narûnê Narûna min

Çi dara belalûka

Kurtikê rindikê berxika min

Tevşokê dest biçûka

---

<sup>39</sup> Ev kilam ji vê çavkaniyê (<https://www.youtube.com/watch?v=6FJV-OPGMTQ>) hatiye guhdarîkirin û deşîfrekirin.

Narûnê Narûnê Narûna min

Tevşokê dest biçûka

Kurtikê rindikê berxika min

Çêkin dezgoşê bûka

Narûnê Narûnê Narûna min

Çêkin dezgoşê bûka

Kurtikê rindikê berxika min<sup>40</sup>

## **12. Yar Sînemê**

Yar Sînemê Sînemê hawara Xwedê Sînemê

Yar Sînemê Sînemê sitara dinya alemê

Reşrîhana li mêrgê wa te

Tu tenê nere avê way

Desta vê ji gerdenê

Xêrên dike vê navê way

Min divê Sînem ramûsim

Pagûna li stuyê bavê wê

Reşrîhana li mêrgê

Tu tenê neçe helala

Tu tenê nere helala

---

<sup>40</sup> Ji ber ku me xwe negihand qeyda dengê vê kilamê me ji pirtûka *Miryem Xan* ev kilam wergirt û latînîze kir.

Destê te vê ji gerdenê

Xêrên dikevê guhara

Min divê Sînem ramûsim

Pagûna li stuyê hevala

Reşrîhana li mêrgê

Tu yê nere gêniya

Dest ha vê ji gerdenê

Xêrên dikevê keziya

Min divê Sînem ramûsim

Pagûna stuyê gundiya<sup>41</sup>

### **13. Baran Barî**

Ha wer lê lê lê lê ha wer lê lê baranê

Ha wer lê lê lê lê ha wer lê lê baranê

Baran barî bi nimet e

Xunav barî bi nimet e

Rêkê erdê kir xete

Rêkê erdê kir xete

Ramûsanê keçkokê

Li mala bavê adet e

---

<sup>41</sup> Ev kilam ji vê çavkaniyê (<https://www.youtube.com/watch?v=62gdWaLWZbw>) hatiye guhdarîkirin û bo deşîfreyê vê kilamê ji pirtûka bi navê *Miryem Xan* sûd hatiye wergirtin.

Li mala mêrî qebhet e

De lê lê lê baranê

Baran barî bi zembîl e

Xunav barî bi zembîl e

Rêkê erdê girtîne

Rêkê erdê girtîne

Ramûsanê keçkokê

Li mala bavê adet e

Li mala mêrî qusûr e

De lê lê lê baranê

Hey borî borî borî

Hey borî borî borî

Hey borî borî borî

Hey borî karwan borî<sup>42</sup>

#### **14. Emînê**

Emînê way Emînê

Pirteqal û leymûnê

Deçim sûka Mêrdînê

Qeysa lingê xwe bigire lê

---

<sup>42</sup> Ev kilam ji vê çavkaniyê (<https://www.youtube.com/watch?v=WGA9PFzVTX4>) hatiye guhdarîkirin û deşîfreakirin.

Ji te ra bînim potînê

Emîn têtô serayê

Delal têtô serayê

Nanik bike erdayê

Pê ra ketim belayê

Emînê way Emînê

Pirteqal û leymûnê

Keçikê derî li min veke

Ez im gidiyê doxînê

Emîn çûye guliya

Delal çûye guliya

Maçek daye romiya

Têra bavê gundiya

Emîn çûye bala vê

Delal çûye bala vê

...?

Mi divê Emînê ramûsim<sup>43</sup>

...?

---

<sup>43</sup> Ev kilam ji vê çavkaniyê (<https://www.youtube.com/watch?v=Y2uDedSTwaI>) hatiye guhdarîkirin û deşîfrekirin.

## 15. Lê Pîrê

Ax lê pîrê lê pîrê

Wax lê pîrê lê pîrê

Zarşarê dor zincîrê

Çûm bajarê Cizîrê

Wez tenê hatim vîrê

Mam eşîrê biqulind e

Dê wêranê biqulind e

Bejna pîrê bilind e

Kêfa pîrê li zewacê

Diket maqûlê gund e

Mam eşîrê bihejîr e

Dê wêranê bihejîr e

...? pîrê bi zincîr e

Kêfa pîrê li zewacê

...?

Mam eşîrê bacana

Dê wêranê bacana

Va bacana pêv dane

Kêfa pîrê li zewacê

Diket cotek mêvana<sup>44</sup>

## 16. Xumxumê

Xumxumê xumxumanê

Çavreşê sing meydanê

Tu bimrî ez mêvanê

Ferşê keniyê mermer e

Ferşê keniyê mermer e

Xumxumê wez û tu ne

Sing û berda bîstan e

Sing û berda bîstan e

Çavreşê em herdu ne

...?

Xumxumê ez û tu ne

Xumxuma min her tûj î

Delala min her tûj î

Xumxumê wez û tu ne

Te li sêrê qereqoşê

Te li sêrê qereqoşê

Çavreşê em herdu ne

---

<sup>44</sup> Ev kilam ji vê çavkaniyê (<https://www.youtube.com/watch?v=KcsXoN90Nho>) hatiye guhdarîkirin û deşîfrekirin.

Tu zer memika nav rojê

Tu zer memika nav rojê

Xumxumê torîvanê

Xumxuma min Şikakî

Delala min Şikakî

Xumxumê wez û tu ne

...?

...?

Çavreşê em herdu ne

Her û xemlê lê avkê

Her û xemlê lê avkê

Çavreşê wez û tu ne

Xumxumê torîvanê

Çavreşê sing meydanê

Tu bimrî ez mêvanê<sup>45</sup>

### **17. Lorkê**

Lorkê lorkê lorkê lorkê Xatûnê lorkê

Lorkê lorkê lorkê lorkê Dîlberê lorkê

Çûme mala Mele Elî Xatûnê lorkê

---

<sup>45</sup> Ev kilam ji vê çavkaniyê (<https://www.youtube.com/watch?v=t0AOU2DKMc4>) hatiye guhdarîkirin û deşîfrekirin.

Hatim mala Mele Elî Dîlberê lorkê

Dayne li ber min dims û qelî Xatûnê lorkê

Dayne li ber min dims û qelî Dîlberê lorkê

Çûme mala Eliyê Zaza Xatûnê lorkê

Hatim mala Eliyê Zaza Dîlberê lorkê

Dayne li ber min nan û pîvazê Xatûnê lorkê

Dayne li ber min nan û pîvazê Dîlberê lorkê

Çûme mala Eliyê Metê Xatûnê lorkê

Hatim mala Eliyê Metê Dîlberê lorkê

Dayne li ber min goştê betê Xatûnê lorkê

Dayne li ber min goştê betê Dîlberê lorkê<sup>46</sup>

### **18. Qemerê Canê**

Ay lê Qemerê dînê kir efrî li ezmana

Ax delalê lê teq û req e belidyê lê da

Kir şefeqe sîng û berê keleş gewrê

Mîna du fîncanê ferfûrî ax delalê

Li dor bi deq e ax delal delal delal delal

Ay lê qemerê dînê dibi kêlha melez girî

Seranî sere sîng û berê keleş gewrê

---

<sup>46</sup> Ev kilam ji vê çavkaniyê (<https://www.youtube.com/watch?v=xCePCuZ8TPk>) hatiye guhdarîkirin û deşîfrekirin.

Mîna zozanê jorî berf e li ser herdu memikê

Keleş gewrê mîna du fîncanê fermûrî

Li axalere ax delal delal delal delal<sup>47</sup>

---

<sup>47</sup> Ev kilam ji pirtûka bi navê *Miryem Xan* hatiye wergirtin û latînîzekirin.



**T.C.**

**Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü**

**Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı**

**Yüksek Lisans Tezi**

**MERYEM XAN VE HÜZÜN TEMASI  
ÇERÇEVESİNDE ŞARKILARININ  
İNCELENMESİ**

**Melahat ULUÇ**

**17711013**

**Danışman**

**Doç. Dr. Mustafa Aslan**

**Mardin 2021**